

NÛDEM

No 38 2001

Kovara Hunerî, Edebî û Çandî

NÜDEM

Kovara hunerî, edebî û çandî

Xwedî û berpirsiyarê giştî
Chief Editor

Firat Cewerî

Hejmar: 38 sal 10
Havîn: 2001

Şerdên abonetiye (salek)
Swêd: 240 Sek
Skandinaviya: 280 Sek
Ewrûpa: 100 DM
Amerîka, Australîa,
Kanada: 50 \$
Institution: 290 Sek

Postgiro: 636 36 25-2
ISSN: 1103-1964

Wêneyê bergê:
Fewzî Bîlge

Çap:
Nina Tryckerî

Pergala bergê û rûpelan:
Nûdem

Adres:
NÜDEM, Box: 177
177 23 Järfälla-Sweden

E-mail: nudem@telia.com
firat.ceweri@chello.se

Tel û Fax: 8-580 131 62
8- 583 564 68

Malpera Nûdemê:
www.welcome.to/nudem

NAVEROK

- 4 Dîsa li ser zimên ♦ **FIRAT CEWERÎ**
6 Li pey Şiyar ♦ **ROJEN BARNAS**
7 Mèvanên Cafê Nûdemê ♦
ARJEN ARÎ, BERKEN BEREH,
REMEZAN ALAN, ROŞAN LEZGÎN
21 Omeriya ♦ **SERKAN BIRÛSK**
25 7,777,777 ♦ **RÊNAS JIYAN**
27 Garebête Bîde ♦ **SELAHATTÎN BÛLÛT**
32 Mirinn...! ♦ **SERKEFT BOTAN**
33 Edîb Karahan ♦ **ROJEN BARNAS**
39 Hêwirn ♦ **KAWA NEMIR**
40 Gazinda xencera min ♦ **CELADET ALÎ BEDIR-XAN**
44 Şiroveya dîwana Melayê Cizîrî ♦ **M. EHMEDE ZIVINGÎ**
Wergêr: **EMÎN NAROZÎ**
60 Çûka zer ♦ **EVÎN AYDAR**
61 Gundê Nûava ♦ **QEDRÎ CAN**
63 Cuhaba Dayikê ♦ **HAWAR**
64 Xewna hişyariyê ♦ **QEDRÎ CAN**
66 Şîna xalê min ♦ **QEDRÎ CAN**
68 Me bi şîya xwe germ bike ♦ **MERVANÊ KELEŞ**
71 Qeweta me di yekîtiya me de ye ♦ **ASLÛKA QADIR**
76 Derew ♦ **REŞXAN MAHMÛDÎ**
84 Efsûnbaz ♦ **FEWZÎ BÎLGE**
89 Pêşangeha Fewzî Bîlge ♦ **ÇIYA MAZÎ**
93 Pepûk ♦ **ENWER KARAHAAN**
98 Hevpeyvîn bi Zana Farqînî re ♦ **SALIHÊ KEVIRBIRÎ**
102 Dîyalektîka tenêtiyê ♦ **OCTAVIO PAZ**
Wergêr: **FIRAT CEWERÎ**
106 Wergêr hinerk e ♦ **MUSTAFA AYDOGAN**
123 Name ji yekî komînist re ♦ **HERMANN HESSE**
Wergêr: **HUSÊN DÛZEN**
139 Seydayê Mela Ebdulsemmed ♦ **BEDIRXAN EPÛZDEMÎR**
141 Di edebiyatê de bûyerên dîrokî ♦ **ŞEREFXAN CIZÎRÎ**
151 Li ser helbesteke Melayê Cizîrî ♦
153 Rewşenbîrê kurd Edîp Karahan ♦

DÎSA LI SER ZIMÊN



FIRAT CEWERÎ


*Tê gotin ku "her zimanek insanek e",
gelo kurdê bê ziman çi ye?*

Berî bi çend rojan min kovarên xwe yê kevin tev dan û ez di hejmareke *Berbangê* ya sala 1983an de li nivîseke xwe rast hatim. Min ew nivîs bi sernava "Çend gotin li ser bingeh û dîroka senet" nivîsandibû. Ez di pêşgotina nivîsa xwe de li ser girîngiya zimanê kurdî rawestiyabûm û min ji ber sersariya siyasetvan û rewşenbîrên kurdan ya li hemberî zimanê wan ew rexne kiribûn. Paşê, ez di gelek kovar û rojnameyên xwe yê kevin de pêrgî nivîs û hevpeyvînên xwe yê li ser girîngiya zimanê kurdî hatim. Mîna ku hûn xwendevanên sadiq û dilovan ji pê dizanin ku min gelek caran di Nûdemê

de de ji behsa wê mijarê kiriye û bi tundî li ser wê û girîngiya wê rawestiyame. Ji bilî min, gelek şair û nivîskarên din ji di nav rûpelên Nûdemê de ev mijar anîne zimên û rexne li karbidestên dewletê û birêvebîrên kurdan barandine. Ne hewce ye ku ez careke din nerînen Ehmedê Xanî û Celadet Alî Bedir-Xan yê li ser zimanê kurdî li vir dubare bikim, lê ez dikarim bi hêsanî bibêjim ku ev serê bîst salan e ez di nav keftelefta wî zimanî de me û ev deh sal in ji ez bi derxistina wê kovarê re mijûl im. Loma, ez dikarim bêî dudilî bibêjim ku ez ji nêzîk ve di nav proseza ziman û edebiyata kurdî (kurmançî) de me û carinan dikarim wê hêz û cesaretê di xwe de bibînim, rewş û pîvana edebiyata kurdî têxim mîzîne û beramberî hin dem û norman bikim. Digel ku ez di maleke kurdîxêf de hatime dinyayê û zarokî û naşîtiya min li welêt bihurîne ji, min cara pêşî kurmançiya nivîskî ya bi alfabe ya latîni di sala 1977an de dîtîye. Heger hingî hejmara nivîskarên kurd sê-çar kes bûn, gava ez di sala 1980ê de li Swêdê bi cih bûm ev hejmar bi ser heft-heşt kesan ket. Îro, hejmara kesên ku bi kurdî dinivîsinin gihîştîye bi sedan. Gava ez doh û îro didim ber hev,

ez di warê edebiyata kurdî û bikaranîna zimanê kurdî de guhertin û pêşketineke mezin dibînim. Zimanê kurdî yê nivîskî îro kemiliye, berberiyên zimên yên di navbera partî, rêkxistî û kesayetiyên kurd de hema bêje nemanê û çî bigire zimanekî standart ava bûye. Ev yek ha rastiyek e, divê bête dîtin û tê dîtin jî. Lê gava ez ji aliyê din ve li rewşê dinerim, ez dibînim ku talûkeya wendabûna zimanê kurdî îro ji doh bêtir e. Doh girseya xelkê an jî piraniya kurdan bi kurdî dipeyivîn, bi kurdî didan û distandin, herîştên wan bi kurdî bûn, lê kurdiya nivîskî kêm bû, tunebû. Îro girseya xelkê an jî piraniya kurdan dev ji zimanê kurdî berdane, bi kurdî napeyivîn, êdî kurdî ji bo wan ne hewcedariyek e; lê ji aliyê din ve bi sedan kesên ku bi kurdî dinivîsînin hene. Belê, hene, lê nikarin berhemên xwe biweşînin, heger imkanin dîtin û weşandin jî, kitêb nayên firotin, gava kitêb neyên firotin û reaksiyonekê ji xwendevanan nestînin aciz dibin, bêhêvî dibin û destên wan li nivîsandina kurdî an jî li berdewamiya mijûlahiya bi zimanê kurdî re sar dibin. Ev rewşa ha tabloyeke trajîk radixe ber çavan û pêvajoya asimilasyonê xurttir dike. Lê ev tablo fikrekê jî dide mirov, alternatîfên mayîn û nemanê pêşkêş dike û ji bo mayîne bi tenê riyekê dide ber me. Ew rê jî ew e ku kurd bi dema nû re siyaseteke nû bidin meşandin û bi siyaseteke nû re jî tavilê encameke erênî bi dest bixin. Em dibînin ku di dema nû de hejmara kovar û rojnameyên bi zimanê kurdî kêmtir bûne, gelek kovar û rojnameyan dawî li jiyana xwe ya weşanê anîne û êdî bi tenê li ser hêvî û daxwazan dijîn. Bêguman hêvî bingehekî qewîn yê mayîna li ser lingan e, lê ji bo ku em bikaribin encameke erênî bi dest bixin, divê em bi her awayî midaxeleyî rewşê bikin û tavilê wê di lehê xwe de bidin guhertin. Li vir em çiqasî jî siyasetê birevîn jî dîsa em tînin û li siyasetê asê dimînin. Ancax em bi wê bikaribin tesîrê li guhertîna rewşa îro bikin. Li Diyarbekirê hefteya kulturî û hunerî ya bêhî kurdî û Newroza wê ya ku bi pêncsed hezar mirovî hate pîrozkirin dike ku mirov kûr kûr bifikire. Mirov bi rabûna pêncsed hezar insan pir dilşa dibe, lê gava mirov li hefteya kulturî ya ne kurdî difikire, mirov xemgîn dibe. Li gora mêvanên Cafê Nûdem yên vê hejmarê di Newroza pêncsed hezar insan de bi tenê dozdeh libên kovara Jiyana Rewşenê hatine firotin. Ev jî trajediyek e. Heger kurd bi rastî zimanê xwe dixwazin û naxwazin bi nasnaveke ku wan înkâr dike bijîn, divê ew pêncsed hezarên ku li Newroza Diyarbekirê civiyabûn û ew bi sedhezarên ku li seranserî welêt li ser lingan bûn, bi çalakiyên cihê cihê vê tabloya reş biguherin. Yek ji van çalakiyên sereke dikare çalakîyeke Ghandîwarî be. Milyonek kurd dikarin digel zarkên xwe li ber dibistanan têkevin rûniştinên protestoyî û bi tenê daxwaza zimanê xwe bikin. Ne daxwaza mafê ferdî, lê daxwaza perwerdeya bi zimanê kurdî û daxwaza vekirina dibistanên bi zimanê kurdî bikin. Gava zimanê kurdî bibe zimanê perwerdeyê, gava kurd bi riya xwendina bi zimanê xwe bibin xwediyên kar û karyerê, wê hingê zimanê kurdî pere bibe, xwediyên zimên nema ji ber xwe fedî bikin, lê xwe pê serbilind û serfiraz hîs bikin.

Kî zane, dibe ku hingî tîraja Nûdemê jî bibe deh hezar.

De, heta wê tîrajê bimînin di xweşiyê de; na, na, heta hejmareke din... 

Li pey Şiyar

Tembûra Şiyar
Li pîncê dîwar stûxwar ma
Û sêwî
Ji tiliyên hunerbar.

Dengê wî
Mîna xewneke şîrîn
Li gergefa xeyala
Ji me ra
Yadîgar ma.

Me b' ecelê nekarî
Hew ji destê me qediya

ROJEN BARNAS

Hunermendê dengbêjî û sazbandiyê
Şiyar di 22.04.2001, saet 09.00 de
dinya xwe guhast.

CAFÉ NÛDEM

Ji destpêkê ve armanca me ew bû ku em li Diyarbekirê bi navê Cafê Nûdem cafêyeke kulturî û edebî vekin û bi sobbet û minageşeyên edebî rengêkî nû bidin civat û edebiyata kurdî. Lê mixabin, ev fikra me ji ber şertên welêt yê zehmet û sersariya kurdan ya li hemberî ziman û edebiyata wan neçû serî û xuyaye wê (ji aliyê me ve) neçe serî jî. Lê belê me di çend hejmarên buhurî de li Cafê Nûdema Stockholmê çend sobbet li dar xistin. Sobbeta vê hejmarê li Diyarbekirê, di navbera Roşan Lezgîn, Berken Bereh, Arjen Arî û Remezan Alan de bûye. Bi hêviya ku wê bi dilê we be...

Roşan Lezgîn: Niha rewşa zimanê kurdî ber bi pêşerojê nediya ve diherike; ber bi tunebûnekê ve..! Ya rastî, di heman demê de ev yek xetereke jiyânî ya hebûn û nebûna kurda ye jî. Niha, em jî di serî de mîna ferdên ji civakê û wisa jî di pencera edebiyatê de rewşa ziman û pê re jî ya edebiyatê, piçekî be jî, em raxin pêş çavan û her bala me li ser çirûskên çareseriyê be.

Belê, mamoste, li gorî we niha zimanê kurdî di çi halî de ye?

Berken Bereh: Her wekî tê zanîn, ziman sîmbola netewan e. Dema qala zimanekî tê kirin, pê re jî her navê netewekê tîne bîra mirov. Bê guman, zimanê kurdî jî zimanê netewekê ye ku îro roj di rewşeke nebaş û wisa jî bi xeterekî mezin re rû bi rû ye! Lê dîsa jî, mirov bala xwe dide ku niha gelek însanên me jî her bi vê pirsê re serê xwe diêşînin. Nemaze di van bîst salên dawîn de potansiyeleke baş heye ku bi zimanê kurdî dinivîsin û dixwînin. Ku ev jî bi giştî ehlên edebî ne.

A rastî, ev pirsê ziman ne bitenê ya nivîskar û edebiyatnasan e, lê ji wan bêhtir a hemû kategoriyên civakê û her wiha ya tevayî netewê ye. Lewre, mîna ku we jî gotî, ku ziman mesela hebûn û nebûna netewê ye. Niha ev mesele jî gelekî mezin e û ewçend jî, xetere mezin e. Lêbelê, digel qedexê, astengî û rewşa neasayî ya ku kurd her tim tê de ne û digel gelek sedemên din jî, lê mezintirîn sedem, sersarî û dilsariya me ya li hember zimanê me ye, ku ev yek wisa bû ye!

Di vî warî de ez komel, sazî û berpirsiyarên me jî sûcdar dibînim. Wisa kirin ku êdî zimanê me ji jiyana me ya rojane jî deranîn. Ew, êdî qe hewce nabînin ku ziman bikar bînin.

Arjen Arî: Dema em bala xwe didin vî zimanî, ji hezaran salan û bi vir de ye ku

xwe parastiye û hatiye ta roja me. Ew sedemên xweparastinî, êdî di roja îroyin de, rûmeteke qedandiyê! Zimanên cîranan xwe derbasî nivîsê kirin û bûn zimanê dewletan, lê zimanê kurdî jî vê yekê bêpahr ma, yan jî pirtir lawaz.

Li gor lêkolîneran niha li dinê her ji çend rojan zimanek dimire. Ez jî mîna helbestkarekî vî zimanî dema li vê rewşa ku ev ziman tê de ye dinêrim, mîna bombe-yekê ku li pêş mirov helbet wê biteqê, dibînim. Teqîna mirinê! Berpirsiyarên vê mirinê, ligel qedexekirin û êrîşên tund ên desthilatdaran û dagirkeran jî, gunehê hêz û bizavên siyasî yên kurdan jî dibînim.

Roşan Lezgîn: Mamosta, bi rastî jî ev karesateke nedîtî ye ku li nav me kurdan polîtîzebûn û asîmîlebûn pev re hev cot dimeşin. Ferdekî/ê ji civaka kurdan polîtîze dibe da ku gelê xwe rizgar bike; zimanê xwe jî bin bandora asîmilasyonê der bi-xîne, lê di nava demeke kurt de tiştên di xwe de heyî jî ji dest dide, ji orîjînalîta xwe bi dûr dikeve, ku divê hinek rabin hêzeke din damezirînin da ku karibin careka din wana vegeşîne ser eslê wan!

Arjen Arî: Belê, belê. Yanê bê henek, li cem min jî ev dîtî û tespît hene. Hema bibêj hemû bizavan ziman, çand û wêje di ser guhên xwe re avêtin. Diviyabû ji hêlekê ve ji bo ziman, çand û nasnava xwe têbikoşiyana, ji hêla din jî bangeşîya jiyandî bi kurdî bihata kirin. Ev ên ku kirin jî, edebiyat bi kurdî û siyaseta jî bi tirkî kirin û xwestin pev re bimeşînin, an jî edebiyatê mîna gopelekî ji siyaseta xwe re bikin sende.

Roşan Lezin: Ez dema bala xwe didim pirtûkxaneyan, pirtûkên ku bi zimanê kurdî dibînim, bitenê yên edebî ne; helbest, çîrok, roman. Ji mêj ve ye her tim hêzên me yên siyasî hebûne. Li gorî vê yekê diviyabû ku niha bi hezaran pirtûkên siyaseta, îdeolojî, dîroki û hwd. ên bi zimanê kurdî jî hebûna. Gelo ev pirtûk tune-ne, yan ez wana nabînim?

Arjen Arî: Mixabin! Min jî nedîne. Rastiyek heye. Çi ye ev? Îro ji qorziyekê be jî, piştî ewqas kul û êşan, hinek kes dixwazin dest biavêjin edebiyatê, lê edebiyat doh jî hebû îro jî heye. Doh jî di bin perr û baskên bizavên siyasî de bû, îro jî wer dixuye. Ji bilî çend kesên ku di qada edebiyata kurdî de navdar bûne, hê jî gelek kesên ku bi edebiyatê re mijûl in, dixwazin di tengî siyaseta de tevbigerin. Ev ne tiştê rast e. Ne ku ez dibêjim bila hunermend apolîtîk bin. Jixwe, her hunermend bi xwezayî xwedî sekneke polîtîk e. Kesayetiyeke azad jî tevgerêke bêşewr bi rûmetir e.

Ev 17-18 salên dawîn ku bi şer bihurîn, dikarîbûn çar-pênc azadî bi xwe re bianiya. Lêbelê, di pêvajoyên dema şer de bikaranîn û xwedîlêderketina ziman ma her

taloq kiriye. Me hiştiye piştî şoreşê. Û her taloqkirinek bûye destpêka têkçûnê, yan jî têkçûn bi xwe re aniye. Tu bala xwe bidiyê, ewqas bizavên kurdî hatine û çûne, yek jî nebûye xwedî weşaneke xwerû bi kurdî. Yên ku vir de wê de der diçin jî, nikarin jiyana xwe yekser bidomînin.

Roşan Lezgin: Mînak û mijareke balkêş e ku di Newroza zootê de li Amedê pêncsedhezlarînsan civiyan ser hev. Ne li vir, belkî di seranserê dinê de jî ev hejmareke gelekî bilind e. Lêbelê, kovara J. Rewşenê ku berhemeke N.Ç.M.ê ye, di meha Adarê de li Amedê bi tenê 12 heb firot. Ku ew jî neh heb jê ez bi xwe wana dinasim kê ew kirîne û ew kes jî yê derî politikayê ne. Ji alî din, ev çendê berê dewletê ji bo tevlibûna xwe ya Yekîtiya Ewropayê bernameyek çêkir ku tê de qet navê kurdan jî nebuhurî. Lêbelê, kurdan bi xwe ji bo rîya Ewropayê ji Tirkîyê re ve be, destekeke aktîv danê û li hember vê bernameyê jî qe dengê kurdan derneket, an jî gelekî lawaz man. Gelo kurd ji vê rewşê razî ne, yanê dev ji zimanê xwe berdan? Mîrov dikare ji vê dîmenê çî hilde?

Remezhan Alan: Kurd digel ewqas politikbûnê, dîsa jî Cihûyên zimanê xwe ne. Ji bo çalakiyeka politik dikarin kolan û meydanan tijî bikin, bo bûyereka rojane dikarin xwe helak bikin, lê ji xwendin û kirîna pirtûkan re, rabûn û rûniştina bi zimanê xwe re sersar in. Dev ji wê girseyê berde; îro li Zanîngeha Dîjleyê nêzikî deh hezar şagirt hene, em wisa bibêjin ku bila şeş hezarê wana kurd bin û dîsa em bibêjin bila hezarê wana li ser welat û zimanê xwe xwedî-êş bin. Herin ji pirtûkfiroşan bipirsîn, gelo ka çend pirtûkên bi kurdî têne firotan? Dê jimareka bêmefer bidine we... Ger rewşa xwendayan ev be, ku namzedên rewşenbîniya gelê xwe ne, dê ya ên din xerabtir be. Divê em qebûl bikin ku kurdên Bakur gorî perçeyên din ji zimanê xwe re sist in. Gelekî politik in, lê ne li ser bîngeha xwe! Helbet sedemên vê yekê pîrr in. Her du mamosteyan qala wê kirin. Ji perwerdebûnê re, heta wextekî ji axaftinê re, qedexekirina ziman, piçûkdîtina zimanê zikmakî, jar û qelsiya nasnava netewî, çanda enternasyonalîstî, politîka ji bo kurdan lê ne kurdewarî... Ev hemû jî sedem in û bêhtir jî eva dawî! Ku îro wekî te jî gotî li hember "Programa Netewî" yê ku îro îradeya kurdan di dest xwe de digirin kerr in. Yan jî, wekî ku di wê pirogramê de navê kurdî bibore, dê her tişt çareser bibe, tevdiagerin.

Rewş baş naxûye, rast e. Lêbelê, digel wê jî, cardin dînamîzmek jî heye. Çîrok, helbest, roman têne xwendin, weşanxane hene, rojname û kovar hene. Çiqas nexwînin jî, kurd bêhtir îro di vê baweriyê de ne ku bê ziman nabe. Ziman rih e, sedemê heyinê ye... Di vê kêliyê de ku mirov ev gotina T. S. Eliot bîne bîra xwe dê baş be, ku wisa dibêje: "Bi zimanekî biyanî ponijîn û fikirîn, ji hîskirinê hêsantir e. Mi-

rov dikare zimanê gelekî jê bistîne, zimanî wî qedexa bike, wî gelî mecbûrî zimane-kî din bike, lê ger mirov bi zimanê xwe hîskirin fêrî wî gelî nekiribe, zimanê wî gelî ji holê ranabe...”

Wisa dixuye ku ne serdestan me bi temamî hînê hîsên xwe kirine û ne jî me bi tevayî dev ji xwe berdaye.

Roşan Lezgîn: Baş e. Ma gelo ger ziman tune be, wê bi tenê hîs karibe netew an jî miletek li ser orîjinalîteya wî li piya bihêle? Yan jî em wisa hizir bikin ku êdî kurd bi zimanê tirkî, yan jî bi zimane-kî dîtir diaxifin, ma ev dibe çi?! Ger me dev ji tixûbên fîzîkî/cografîk berdabin, ne divê sînorên me yê derûnî hebin. Ger ev jî nebe, êdî cûdatiyêke çawa wê hebe? Emê nikaribin bibin mozaîk jî, belkî emê di nav mozaîkan de bibin şîrêz.

Berken Bereh: Yanê em dikarin wisa jî lê binêrin ku van salan bi tevgerên siyasetî re hîsên kurdewarî geştir bûne; ji aliyê ramyarî û hişmendiyê ve, lê mixabin, ji alî ziman û çanda xwe jî paşdetir. Kurdan siyaseteke tund meşandin, lê ew çox û heycan û pêşketina siyasetê û politîzebûnê ji bo ziman û çanda xwe, xwe neda der. Ev nayê wê wateyê ku kurd ji hest û ramanên xwe dûr ketine, daw û doza mafê xwe nakin, lê rastiyeke jî heye, ku em kes jî nikarin wê biparêzin, ew jî, xemsarî û dilsariyêke cidî ya li hember ziman e. Ev jî di serî de ji helwest an jî tevgera hêzên ku li ser navê wî gelî politîkayê dikin, ji ewka wana tê...

Hîn jî ev mantiq li ser me hakim e ku em her dixwazin xwe mîna kesên reben bidin nîşandan û rewşa xwe bi vê yekê şîrove bikin. Piçekî jî em kurd di serî de politîkayê ji çepê tirkî hîn bûn. Ev têkiliya hanê kir ku em politîkaya xwe bi zimanê wana bimeşînin û ev jî bû mîna aderekê! Adetan jî adet bi xwe re anîn û civakê jî da dû siyasetmedaran û zimane-kî xwe piştguh kirin! Ev tiştekî dualî ye. Kar û xisara xwe bi xwe re anî. Me çepên tirkî di warê politîkayê de derbas kir jî, lê ev nexweşî her bi me re ma. Halbikî, divê me politîkaya xwe demekê bi şûn de dageranda ser zimane-kî xwe. Jixwe, divê êdî ew werin li ber me bigerin ger ji bo wan pêwîst be- em wan fêrî politîkayê bikin. Lê bi zimane-kî xwe. Ger em hîn jî mîna berê bi zimane-kî serdestan biaxifin, ne bitenê dewlet, belkî emê nikaribin kurdîtiya xwe bi çepê wan jî bidin qebûl kirin. Û ne neheqin jî. Yanê dema tu bi her awayê xwe mîna wî bî, wê çawa rabe te mîna kurdekî bizane?!

Arjen Arî: Di vê serdema nû de, yan jî di vê îpêvajoya nû de kurd têkçûnên xwe mîna Aştiyekê! dibînin. Yan jî dixwazin rûyê xwe bi serkeftina çend kesên edebî, spî bikin û bi tenê edebiyatê ji birînên xwe re bikin melhem...

Remezan Alan: Lê ev jî ne melhemeke ku...

Arjen Arî: Yanê melhemek e. Melhemek e ku divê ji zû de di birînan de hatiba dayin. Ji siyasatmedaran bêhtir hunermend êşnasên vê nexweşiyê ne. Ne tenduristiya ku bi salane didome û ji bilî axa me, îro ziman, rih û kesayetiya kurd jî ketiye bin pêlavên dagirkeran. Hûn jî dizain ku ev serê deh-panzdeh salane ku deh-panzdeh hezar kadroyên siyasî yê kurdan di zindanan de ne, ka ji nava wana pênuşeke kurdî, di çi warî de dibe bila bibe, şanî min bidin!

Bi kurtî pêvajoya şer di zindanan de jî, di qadên siyasî yê kurdan de jî û li sîkake, tirkî-axêvî hat û xwe bera paxila jiyane da!

Roşan Lezgîn: Têspîteke min î wisa heye; ev tîkiliya di navbera zimanê kurdî û tirkî de, wisa ne tîkiliyeke normal e! Her çi hîkmet e nizamim, lê tîkiliyeke berevajî ye! Yanê ne wekî tîkiliya di navbera zimanê kurdî û erebî, farisî an jî zimanekî dî ye Ewropî ye. Dema kurdekî fêrî zimanê tirkî dibe, pê re jî ew şîfrasyona orjînal a zimanê dayikê ku di bin hişê mirovê/a kurd de difelişe û li şûna wî ya tirkî cihê xwe digire. Dawiya dawî, mîna ku zimanê tirkî zimanê dayikê be, derdikeve pêşberî me. Hinek kesên xwedî xîret ku piştî trkî hîn dibin, ku dixwazin dagerin ser zimanê xwe û bi kurdî biaxifin jî, tew zimanekî gelek ecêb û seyr diaxifin ku seranser pêjna tirkî jê difûre..

Arjen Arî: Yanê rast e. Ez naxwazim bi nav bikim, lê camêrekî ev yek destnîşan dikir û nasnava kurdên Bakur mîna Kurdo-Tirk! rave dikir. Ev nasnava hanê beriya her tiştî ew kesên ku li ser navê me tevdigerin, wan pejirandiye û jixwe, niha sîkak jî dagirkirîne. Ji bo kesên bi vê nasnameyê, em bi tenê li bajarê xwedêgiravî dîroki; li Amedê binêrin bes e. Ancex seferberiyeye ku ji karwanê hunermendan pêkhatî bi piştgirî û alîkariya bizavên desthilatdar bikaribe çareseriyekê bîne bi xwe re. Nivîskar westiyaye. Nivîskar hevîşikestî ye. Nivîskar nikare him biafirîne, him binivîse, ji bêrika xwe çap bike û mîna etarokan pirtûkên xwe li kolanên Amedê bigerîne û bibêje: Xalo, apo qurban ka yekê bikire! Ev kar ji bilî me karê herkesî ye; sazî û dezgehên te, di serî de jî pêşeng û pêşewayên ku li ser navê vî gelî tevdigerin, pirsgirêk jî çareserî jî li ba wan e.

Roşan Lezgîn: Mamosta Arjen qala etaran kir ku pê re jî tişteki hate bîra min. Dema ez zarok bûm, li gund, etar an jî çerçî dihatin gundan. Ji bo em qanikekê benîşt bikirin, me diçû hêk didizî ku ew jî bi piranî ji bin mirîşka gurd-keî bûn. Îcar ew hêkên ku me dest kiribin, jixwe êdî ew ne hêkên teze bûn ku bihatana xwarinê, lê êdî mirîşkê jî ew nedikirin çêlik..! Gelo, kurdên ku hînî tirkî dibin qey rewşeke wisa li wana çê dibe?

Remezhan Alan: Tam jî wisa çê dibe. Nasnav û şexsiyeta arabesk/tevlîhev! Ku

ne ji xwe ye û ne jî ji tiştêkî di ye. Rewşa hêkê ew e, ku ji herdu derfetan jî bûye!.. Yên ku ji vê yekê hayedar in gelekî pê diêşin, keserkur dibin. Heta zahfê caran nêzî şîzofreniyekê êşa ve pozberiyê dikşînin. Lê, yê ku ji vê yekê bê hay in, mîna pêvajoyeka xwezayî tê de dijîn. Wê hingê jî mîna ku mamosta jî gotî, nasaveka "Kurdo-Tirk", an "Kurdo- Ereb" û "Kurdo- Ecem" û heta "Kurdo-Emerîkî" derdikeve holê. Mirovekî/a ji dêvla pirrkesî!.. Helbet di vê pêvajoyê de divê bitenê ne çanda derdorê, ya emperyalîst jî em bigirin ber pirsan. Ji ber ku ew dinya, hemûyê çand dan di nava sîniya xwe de dihelîne, taybetmendiya her tiştî dide ber erozyona xwe! Hûnê bibêjin ku jixwe çand homojenî ye.! Ras te, homojenî ye. Ya netewî bi xwe jî wisa ye. Çanda netewî ya ku tê de hîn ewqas çîn û zimre û kes ji hev cihê nebûne. Çand, gava ber bi kesan ve diçe heterojen dibe, nasnav û kesayerên cihê derdikevin holê. Em îro di vê dinyaya ha de bivên jî nikarin mîna şexsekî û ne jî mîna gelekî saf bimînin. Lê, ev nayê wê wateyê ku emê dev ji xwe berdin û tirba xwe bikolin!

Rast e, wekî hevalan jî gotî, edresa çereseriyê siyaset e. Ji ber ku her kêşa netewî, siyasî ye. Lê dema em dibêjin siyaset, em çi fêhm dikin? Qest hin partî û sazî ne, an hemû meterîsên netewî ne? Bi gotî min em vê kêşeyê di çarçoveka pirr teng de kar tînin. Jiyan bi hemû dezgehên xwe ve siyasî ye. Dema kurd bivên bê kompleks tevî vê çareserkirinê bibin, dikarin rojname, kovar û çapemeniya xwe seferber bikin. Gregorî Jusdanis gava di pirtûka xwe ya bi navê Moderniya Derengmayîn de qala îcatkirina edebiyata Yewnaniyan dike, rola kovar, antolojî û pêşbaziyên derdixê pêş. Ger ziman rikneka neteweyîtiyê be û tu wî negihîni xelkê û mîna xwarineka xweş belav nekî, dê bêhemd ziman ji taqetê bikeve. Zimanê ku ji heytehola jiyandê û aktîvîteya rojê bi dûr e, wê demê ew nêzîkî gornê ye, helbet. Belkî îro çend kovar û rojnameyên me hene, lê ji bo nîşên nû bêne teşwîq kirin, salê çend antolojî têne amade kirin û çend pêşbaziyan xwedî prestîj hene?

Û li ser gotina mamosteyan ezê tiştêkî din bibêjim: Rast e, trajediya kurdan hinek jî di bajarvaniyê de ye. Bala xwe bidinê, kurdên bajaran li ber asîmilasyonê zêftir in; ji destdayina hêkê zû xera dibin! Û mixabin di van salên dawîn de ew warê ku çand û huner û zimanê netewî disitirand, yanê gundên me ji dest çûn. Em li bajaran bi sîstemê re zêdetir ketin nava dan û standinê. Te bivê nevé wisa ye. Dibistan, dezgehên fermî, çapemenî, sikak, bazar. Ev hemû te macbûrî zimanekî din, rihekî din dikin. Hela ku di vê jiyana bajarî de, dîroka te birjuvaziyeke netewî neafirandibe û ew zimanê ku tu caran ew rola dîrokî, -çî ye ew rol?- Bo menfaeta xwe be jî, xwedîlêderkerina ziman û huner û bazara xwe ye- nelîstibe, wey li te! Lewma,

carna ji min re wisa çêdibe ku resam û hêkeltiraşên me, xwe beredayî aciz dikin!

Lê, di vê destdayina hêkê de ger tu li sûc û şermezariyekê bigerî, helbet pahra mezin a dagirkeran e..

Roşan lezgîn: Mamostacan, ma tu şermezar bikî wê çi bibe? Ne xema wan e! Jixwe, ew bi kirinên xwe jî û bi devê xwe jî dibêjin ku emê koka we bînin!..

Remezhan Alan: Gerek hingê em jî gorî wê tevbigerin, qe nebe pozberî û kêmasiyên xwe çareser bikin!

Roşan Lezgîn: Dixwazim viya bibêjim ku em kesên li welat in jî, her di nava hucreya xwe de mane; em her yek di nava qalîkê xwe de. Erê, ma emê kengî derkevin pêşberî civakê? Ew kîjan civak an jî girse ye? Wê kî dil û hembêza xwe ji me re veke?

Berken Bereh: Niha berî her tiştî ez dikarim viya bibêjim ku rewşa me û zimanê me û civaka ku em tê de dijîn ne xwedî zagonên xwezayî ne. Jixwe, ger her tişt li gorî zagonên xwe yên xwezayî û normal bimeşiya wê her tiştê me jî xweberî di rîya xwe de biçûya. Em bi dehan sal in ku di nava rewşeke awarte de ne. Awartebûn bûye xwezayî!

Em û dagirkerên xwe di nava hev de li ser heman axê dijîn. Di nava me de tu derya û tixûb jî nîn e. Bivê nevé di dirêjahiya dîrokê de gelek têkiliyên me yên tevîhev çêbûne. Di vê rewşa me de pahra vê yekê jî heye. Ji bilî viya, parçebûna welat jî tesîreke xwe ya neyînî li ser me pêkaniye û em tenê mane. Dema em van gişan daynin ser hev, a va ye, em bi vê rewşa kambax re rû bi rû dimînin.

Ger em werin ser pîrsa te, weleh ez jî nizanîm ku çi bibêjim. Ji ber ku beriya salên heştêyî ez li nêzî tixûbê başur dimam, lewma jî, ew tevgera li başur bivê nevé em pêdihisiyan. Ew şer û berxwedan û heta bi şikestinan jî tesîreke mezin li me dikir. Min jî di despêkê de ew hestên xwe bi tenê bi helbestê der dikir. Lêbelê, tu car jî min pirtûkek an jî helbesteke bi kurdî nedîbû û nexwendibû. Bi tenê hay ji kurdîtiya xwe bûbûm, a ewqas. Wê demê hinek rêxistinên me yên siyasî jî li bakur dest bi hin xebatan kirin ku ji wana yek jî derxistina kovara *Tirêjê* bû. Jixwe, yeke-mîn helbesta min û ya mamosta Arjen pev re di heman kovarê de weşiyân. Lêbelê, va ye, hîn van deman min û mamosta Arjen me hev naskir. Ev serê bîst salan e, ku ev yek jî bi min re bûbû hesretek. Me tu car rehetiya xwe nedî ku em xwe derxin pêş an jî dengê me here xelkê. Mirov çiqas di nava hucretiyê de; xewletiyê de bipêş dikeve an jî xwe dibîne, ew jî nediyar e.

Rewşa me gelekî dijwar bû. Ma berê jî wisa bû? Va ye, niha piçekî be jî hîn îmkân hene; teknolojî bipêş ketiye. Lêbelê, evcar jî, ziman ji dest dihere.

Ta niha jî û herê jî tu xiyaleke min a ku ezê bibim xwedî pitûkeke an jî mîna helbestvanekî, nîn bû. Berî her tiştî min digot ku gelo ezê xwe bigihînim sibehê, an ne!

Arjen Arî: Ez benî, me beriya her kesî destpê kir, lê em li dû her kesî bûn nivîskar! Min li Swêdê jî got... (Hûn bikenin...!) Yanê bê henek ez dibêjim. Nîşana nivîskariyê çi ye? Ma ne pirtûk e? Pirtûk dîploma nivîskariyê ye! Çi qenc çi xerab. Lê em li welat man. Ev jî tişteki dî ye! Belkî hinek li derve, yan jî li Swêdê penaber in, lê em jî li welêt penaber û hêstîr man. Çîroka helbestkariya me li darê dinê kambaxiyê nedîtî û nebihîstiyê. Va ye, ez heta doh ji bo birayê Roşan mîna sîxûreke an jî mêrkujekî ji dewletê bûm! Ev serê şeş salane ku em hev dinasin, lê çawa? Niha ku ez rabim vê çîroka kambax vebêjim, ma karê aqilan e?! Ger me edebiyatek kiribe, ew, di ber jiyane re hatiye kirin! Min bixwe helbest nekir pêşiya jiyane. Çîroka min, pariyekî dişibe ya helbesta Necar!

Demekê siyaseta ne bitenê li pêşiya nivîskariya me de bû, jiyana bi xwe bû. Li gorî min siyaseta rîya bidestxistina tiştên pirr bû. Lêbelê, zû lewîti û ez jî jê kerixim. Min ew, wê jî ez terk kirim. Ka em bîn ser helbestkariyê. Ya rast min tu car ew keys nedî ku mîna helbestkarekî li xwe binêrim. Min di heyata xwe de xiyal nedikir ku ezê rojekê mîna helbestkarekî bême nasin.

Ez hevî dikim ku nîşên nuh, -ger ew jî hebin!- qe nebe bila aqûbeta me neyê serê wan. Ev serpêhatiya me ya ne xweş ji wana dûr be...

Roşan Lezgîn: Rast e. Mamostacan, ez bawer im xelk jî êdî ji guhdarîkirina serpêhatîyan bêhtir benda çirûskên çareserîyan e.

Arjen Arî: Belê, belê. Lê em her yek mîna teyrên ku ji refên xwe qetiyane di geliyê xwe de, di nav lehengîya xwe de man. Em di nav gerînek an jî geremolekê de man. Lê em li welatê xwe man! Yanê me mîna helbestkarekî nenivîsî, bêhtir me hestên xwe bi zimanê xwe der kirin. Belkî jî ji ber vê yekê ye em her di helbestê de man e. Yanê, me xwe di neynîkekê de jî nedît.

Remezhan Alan: Mamosta, hîn ji bo kurdan edebiyat nabûye meslegek. Ger wisa bûya, diviya debar pê bûya. Ne wisa? Ma îro mîstîriyê vê bazarê heye? Em bibêjin heye, lê tu kesê ku ji bo berhema te telîf bide heye? Kîjan weşanxaneya kurdê yekê ji xwe re kiriye edaq? Gelo hunermendê kurd, an jî ew kesê mîna me namzedê vî karî, dê çawa karibe heq-hişê vî karî bi dest bixe? Ez dibêjim ev mesele dîsa dikeve stûyê berpirsyarên vê civakê. Heta bazara vî zimanî çênebe û em jî heq-hişê keda hunerê nedin, mîna tîpekê nivîskarê kurd çênabe.

Divê em serguhên xwe re navêjin, ji nivîskariyê re wextekî serbest divê. Ji çalaki-

ya hişmendî û entelektuelî re ji bîlî wextê serbest, debar jî divê. Heta ev yek neyê dîtî û çareserkirin, dê destê me di nav karekî ku him bêhna me diçikîne û him jî wextê me hemû didize de be. Dê çî ji nivîskariya wextê bêhnvedan û razanê derkeve?!

Roşan Lezgîn: Nemaze ji bo hevalên ku li welat in ev pirsra çavkaniyan jî mişkulateke cidî ye. Digel ku gelek berhem hene jî yan me hay jê nîne, an jî em nikarin bidest xin. Wisa jî em li ser bêbingehiyekê aj didin, an jî, bêgav dimînin ku qûtê xwe ji edebiyata serdestan hildin..

Remezhan Alan: Na! Em nikarin bibêjin ku em li ser bêbingehînekî ne. Di serî de klasîkên me hene. Cardin zargotin heye. Jixwe hûn ji min bipirsîn, rîknê esasîn, zargotin e. Ji bo me, ji ber ku wekî te gotî, edebiyata nivîskî qels maye, kê mînak e. Lê qey tenê berhemên nivîskî mirov sewkê nivîsandinê, yan dîldayê edebiyatê dike? Zehfê caran çîrokek, metelokek, destanek jî dikare vê wezîfeyê pêk bîne. Ha, tu yê bibêjî edebiyata klasîk û ne helbest, gelemperî! Belê, wisa ye.

Bi rastî jî em di aliyê helbestê de xwedî bingehekî ne. (Ev adanî îro jî didome.) Lêbelê, ji bo tirkan "Edebiyata Dîwanê" çî îfade dike, ji bo me jî ya klasîk ew e! Çawa ku edebiyata dîwanê ji bo tirkekî "edebiyateka mirî" be, -ji ber zimanê wê-klasîkên me jî ji bo me wisa! Niha wisa bi rehetî bê ferheng û şerh, ji me kîjan dikare Xanî têbigihê? Her wisa Cizîrî û yê din? Edebiyata heyî jî, mixabin, ji bo me ne ewqas alîgir e. Ku kevneşop e, tradîsyon e, ji namzedekî re dibe mamoste û dibistan! Rast e, em ji vî mamoste û dibistanê kê mî tîşt hîn bûne, lê hebûna wan jî ji me re bûye taqet û moral.

Û her wisa ev jî heye. Kevneşop tenê ne netewî ye, navnetewî ye jî. Mirov ji edebiyata dinê jî dikare pir tiştan hîn bibe. Ew jî mamosteyekî hêja ye... Lê pirsgirêk pariyek jî ev e. Sifra kevneşopê, di wextê xwe de nayê ber me. Ereş Şemo di salên 1935-40î de romanên xwe nivîsandibû, Mehmed Uzun, ger ne şaş bim, romana Tu 1985an de û Mirina Kalekî Rind 1987an de nivîsandibû, lê nişên wekî min wana nuh dixwînin. Yeka dî jî, çî ji ber pirsgirêkên parçebûnê, çî jî ji ber yê elîf-bayê be, em îro ji metnên soranî, behdînî û yê qafqasî bêhay in. Yanê kevneşop heye, lê mixabin, bi awayekî senkronîk nagihê ber me ku em ji hemûyan hayedar bin.

Arjen Arî: Ya rastî, îro di nav edebiyata kurdan de ji bîlî yek du kesên ku karibin jiyana xwe bi nivîsînê temîn bikin, tunene û ew derfet jî nîn in. Wexta ez dibêjim min helbest nekir qetek ji jiyana xwe hinekî jî ev tişt e. Lê îro li Swêdê tradîsyonekê destpê kiriye; nivîskarên karker an jî karkerên nivîskar. Him karê xwe dikin

û him jî di ber re dinivîsin.

Îro di edebiyata kurdan de çi helbest û çi şaxên din, erdên beyar in ku amedeyî çandîniyê ne. Lê tişteke heye, di dirêjahiya demê de navbirrên kûr ketine nava edebiyatê. Di navbera me û Cegerxwîn de xelek ji hev qetiyane. Di navbera Hawarê û kovarên îroyîn de 50 sal buhuriye. Me bi siyaseta xwe jî, bi edebiyata xwe jî, nivîskariya xwe jî, pirsgirêkên heyî her bi şûn de hiştine û me gotiye sibehê! tiştên ku di vê navberê de di qada edebiyatê de qewimîn jî, vegotina siyaseta hîlbijartin! Vê vegotinê berhemên qenc û xerab, baş û nebaş, hêja û nehêja kirin kodekê! Pîrrê caran dubarekirina rastiya jiyane, pesindayin û her wisa li ser navê edebiyatê riya herî hêsan hate hîlbijartin.

Remezhan Alan: An jî kûr nebû. Kevneşopa herî kevin, yanê helbest roleka tenê dîdaktîk lîst, ji ber ku... Helbestkarên me xwestin pê fikrên xwe bibêjin. Belkî jî ji wî tenê ne aliyê ziman de di yê naverokê de jî, ji me dûr e.

Arjen Arî: Yanê ger Cegerxwîn jî dîdaktîzm bikar anibe, çi heye wî rola xwe lîst. Tiştên piştî Cegerxwîn çêbûne jî, ez naxwazim wan zêde lawaz bikim, lê belê rast-rast mîna qûzikeke koçer ku rabe ji xwe re dilînen xwe yê keçane bibilîne ne. Ev yek radeya helbestê di çavên kurdan de nizimtir dike. Ji alî din, ew helbesta ku îro li ber xwe dide jî di nava geremolekê de dike ku bifetise: Rojava, Rojhilat! Di nava şaxên edebî de şaxê herî netewî ku helbest be wê demê ne hêsan e.

Berken Bereh: Ger îro kurd hatibin ketibin bajar, divê îro edebiyateke bajarvanî derkeve holê, her wiha helbest jî divê bibe bajarvanî. Niha êdî em li bajarvanî dijîn û jiyana me jî pê re bûye bajarî, lêbelê peyvê û mijara helbestê hîn jî gundî ne. Bi hevokên dewra feodalî helbest tê saz kirin. Peyvên bajarî nakevin nav edebiyatê an jî helbestê. Em hîn jî newêrin li ser evîneke şexsî binivîsin. Ku yek rabe binivîse jî, emê bi hêsanî karibin wî kesî şermezar bikin û bibêjin ku ma tu êdî ketî pey keçikan?! Naxwe, ma ev problem jî ji bêîmkaniyê dernayên? Yanê ger sikak û sazî û jiyana li ser esaseke kurdewarî xwe saz bike, ma gelo çima helbest jî li ser hemû aliyên jiyane xwe nehone? Bi giştî û di serî de jî siyaseta me hîn jî ne ewçend xwedî tolerans e ku ferdekî bi aliyên xwe yê qenc û xerab, bi zaef û qelsiyên xwe re mîna însanekî bê dîtin. Gelek aliyên jiyana hene ku tepeser dibin; em hestên xwe ditengijînin û rê nadin ku der bibin. Divê êdî em jî rehet li tiştan binêrin û her bi jargonên siyasî li edebiyatê nenêrin.

Ji alî din tu devê kê vedikî her dibêje hêma. Erê, hêma hêma, lê dema mirov helbestê dixwîne, tew tişteki ecêb e..

Remezhan Alan: Bi rastî jî ji bo helbesta îro divê bersiva vê pirsê bê dayin: Gelo

ji bo helbestê kirde (subje), yan ziman û hêma girîng e? Yanê rewşa kesê ku helbestê vedibêje girîng e, yan bi serê xwe karanîna ziman? Yanê êşa însanî gere sereke be, yan mîna ku tu rabî li ser ziman weke mihendisêkî bixebitî, jê mînak û ezmûnan biwelidînî?

Ez jî mîna mamoste çavdêr dikim ku helbesta îro ber bi hêmaperestiyekê ve diçe. Di vê yekê de tesîra edebiyata derdorê û dinê jî heye. Temam, divê mirov qebûl bike ku helbest zimanekî hêmayî ye, lê ger tê de însan û pirsgirêkên wî yên ontolojîk hebe! Yeka dî, divê neyê ji bîr ve kirin di vê gotina seranser hêmayî de manîplasyok heye. Wate, mahne ji dest diçe. Dema wate ji dest çû, hingê bi zorakî tu dikarî her tiştî têkiyê. Halbikî, tiştê bêwate, bêqîmet e jî!

Berken Bereh: Niha em ji bo pirsgirêkên xwe çareser bikin, em edebiyatê bikar tînin. Ev yek her li pêş e. Erê, divê em li gorî qaîdeyên edebî edebiyatê bikin. Lê her tişt jî ne hêma ye..

Roşan Lezgîn: Niha, ev pirsra hêmayê jî divê em paşê bi dorfirehî li ser bisekinin. Lê aniha ez dikarim viya bibêjim ku ger hêma karibe ava şetê me bike şerbet û bi me bide vexwarin, helbet divê. Lê, ku hêmayeke biyanî; hêmayeke teqlîdî ya ku ji helbesteke biyanî ye, rabe di nav helbesta kurdî de cih bide xwe, helbet wê wate û naverokê birûxîne. Wê lingên wê hêmayê ne li ser axa xwe be. Halbikî, hêma divê ji nava çavkaniyên jiyaneke kurdewarî bête hêçandin ku ji bo li cihê xwe rûne û bi xwe re wate xurt bike, ne ku xerabî û miamabûnê bi xwe re bîne. Divê hêma û helbest û bi giştî jî edeba kurdî li rihê xwe î orjînal bigere. Lê, mirov dikare heq bide hêmaperestan jî, çimkî ew jî xwe di nava jiyaneke kurdewarî de nabînin. Rih di civakê de nema be, manewiyat qels bûbe û jiyana lewitî be, wê bi xwe re jana helbestvan jî bilewitîne û berê wî/ê bide derên din!

Niha em bibêjin ku edebiyat di nava baxçeyekî de gul e, yan jî kulîlk e. Naxwe, jê re baxçevan divê. Da ku pejkên wê çê bike, av bidiyê, axa dora wê bikoilê. Baxçevan nikare reng û bêhn û dirûv bide gulê, lê qe nebe, divê hin wezîfeyên xwe bi cih bîne da ku gul jî karibe aj bide, geş bibe.

Ji alî din, niha me dev ji sînoren fîzîkî berda! Lê, ji me re sînoren derûnî divên, da ku çand û ziman û pê re jî edebiyateke hêja karibe di nav de aj bide, li nav sêncên derûniya civakî de bi ewlehî bijî..

Remezhan Alan: jixwe edebiyat jî pariyek nelihevkirine! Lewma rengên wê, klîkên wê cihê cihê ne, lewma baxçe û baxçevanên wê pirr in... Em werin ser "derûniyeka ku huner bikaribe di nav de bi ewlehî bijî" Gelo ev yek ji ber sedemên dîrokî mimkune bibe? Ne bawer im. Ji ber ku hebûna her roman, çîrok, şano, ceri-

bandin û rexneyî, -helbest ne tê de- li ber yê Roavayê teqlîd in. Çi ye, cara yeke-
mîn pirototîpa wan roavayîyan afirandiyê! Wan mohra xwe lê daye û bê hed û he-
sab mînak afirandine û bi vê jî qîma xwe neanîne, van cûreyan pêşkêş kirine, bi
dildayî çav girtine da ku gelên din wan transferê çanda xwe bikin. Ev e, ev siya dî-
rokî li ser her Rohilatî dîlneretî û bêhizûriyeka ontolojîk e. Ji ber ku Rohilatî di-
zane qedera edebiyata derengmayî teqlîd e. Ji wî, çi binivîse di aliyê orjînalîteyê de
guman lê tîn kirin. Bi gorî min ev kêşa dîrokî, nivîskarên gelên din wisa mecbûrî
wî dikin. Yanê ew, mecbûrî aliyên wî yê eslî, herêmtî dikin. Dibêjinê, heya tu bi
têra xwe netewî nebî, gerdûnî jî nabî! Dibêjinê, kî bêtî nasnava xwe, ya gerdûnî bi-
dest xistiye! Ev rastî di xelata Nobelê de xwe diyar dike. Lê binêrin, tê de pîr pê-
nûsên neteweyên ku dû re bilindî asta netewî bûne, hûn ê bibînin.

Û ku em vegezin ser pîrsa ka baxçevan? em ê vana bibêjin: Baxçevanê edebiyatê
rexnegir e. Belkî ne tovreşên e, lê kêra kesaxê di destê wî de ye. Mixabin rexnegir
dema vê yekê dike ne bi devîlkenî dike, bimirûztahlî dike. Di nav qaîde û zagonan
de dike! Belê hebûna wî bi baxçe ve girêdayî ye. Lê baxçe jî bê wî xwedî diryanên
dirr e, xwedî şaxên bêkêr û xeter e... Ger rexneyeka me ya hoste-baxçevan, xwedî-
ehl çêbû û nivîskaran jî tehemilê mirûztahlîya wî kirin, dibe ku tiştên baş, digel de-
rengmayî, biafirin.

Arjen Arî: Li bakurê welêt hîn jî helbest bi miradê xwe şa nebûye. Niha kîjan
xort helbestekî te diyariyê yara xwe dike? Di van 15-16 salên dawîn de, ku mohra si-
yasetê û şer li jiyana kurdan ket, qet bi qet jiyana ji dest çû û helbestê jî xwe re riyek
nedît ku xwe bigihîne gel û heçandina xelkê jî bi xwe re estetîze bike. Her tişt bi
tirkî meşîya û vê yekê rê jî edebiyata kurdî re girt.

Lêbelê, di dema helbesta klasîk de çi li qesr û serayan û çi li dîwanxaneyên mîr û
began de, -yanê, ew jî desthilatdarên dema xwe bûn, çi biserketî çi tiştêkî din-
wê demê helbest û edeb di kemla xwe de bû. Helbestvan; dewrêş û feqî û dengbêj û
çîrokbêj hebûn û xwedî xwe û rûmetekê bûn. Wan jî jiyana sipehîr û bi çêjtir diki-
rin.

Berken Bereh: Me hîn jî netewebûna xwe temam nekiriye. Em hîn jî di pêva-
joya xwe temamkirinê de ne. Me pîrsgirêkên xwe her aloz hiştin. Lewma jî rojeya
edebiyata kurdî her evîna welat bûye. Lêbelê, siyaset jî evîndarê welat bû, ji bo we-
lat şer kir, gelek nîrxên hejrayî jî me bi dest xist. Lê di nava şerê xwe de wêjeya kurd
ne gihîşt asteke bilind. Bi gorî şer lawaz ma. Bê gûman, sedemên vê yekê gelek in.
Lê divê tu tiştêk nebe mazeret, bi şerkirina xwe re, ne ku ji xwe dîrketin (li baja-
ran), berevajî wê, diviyabû ku bi şerê xwe re jiyanêke kurdewarî saz bibûya; xwe li

ziman û çanda xwe bipêçana.

Niha gund vala bûn û pê re jî bajar mezin bûn. Yanê hindiktir ew kesên ku heta doh di nava rez û zeviyên xwe de dixebitîn, îro, di nav zeviyên pembû û findiqan de rêncberî û cenaniyê dikin. Hinekên din li hin deran rojane dixebitin. Îcar me hîn berê xwe nedaye wana. Ew edebiyata ku ev girse karibe xwe tê de bibîne nehatiye afirandin. Yanê edebiyata me mijara xwe berfireh nekiriye.

Arjen Arî: Ez benî, hunermend bi xwe jî berhemeke derdora xwe ye. Ew jî tîpêkî civakî ye. Yanê hunera ku diafire jî xwedî xwe û pirsgirêkên xwe ye.

Roşan Lezgîn: Li gorî min xelk her dem xwedî xwestin û talebeke hunerî ye. Ji par de heta niha ev dibe çendik û çend kes jî edebiyata bi tirkî, yan jî raste rast nivîskarên tirk têne û li Diyarbekir hunera xwe pêşkêş dikin. Vê zemînê jî xwe re dibînin. Ma ev yek ne ew tişt e ku êdî kurd bi xwe jî ji edebiyata tirkî xwe têr dikin? Gelo ma edebiyat an jî helbesta bi tirkî bê qisûr û kêmasî ye, lewma? Ger tu bixwazî edebiyata bi kurdî pêşkêşî wî bikî jî, lê naxwe, va ye, êdî ew bi tirkî diaxife û dixwaze bi tirkî xwe têr bike! A nakokiya ku ez dixwazim berî her tiştî çareser bibe, ev e.

Berken Bereh: Erê, rast e. Divê civaka ku hunemend xîtabî wî dike, diyar be û dildayê hunera wî be. Ku hunermend ji alî girseya xwe ve neyê himbêz kirin, jixwe, ev pirsgirêk wê wisa qanserojîk be..

Lê ji alî din, ta niha me pisîkolojiya ferdekî/a kurd bi giştî fam nekiriye. Yan jî me ew mîna însan hilnedaye dest. Li gor min, di edebiyata ku ta niha hatiye kirin de ferd ya bi giştî qehreman e, yan jî xayin. Halbikî ew jî însan e. Çi xisletên însanî hebin, di qehremanan de jî û di xayinan de jî hene.

Ev yek jî hinekî ji ber tirsê pêk hatiye! Lê, divê îro ew tirs bikeve aliyekê. Mirov çî difikire divê karibe bê dudilî vebêje. Divê êdî kes li gorî şablonan an jî daxwaza hîn derdoran vî karî neke. Divê azadiya şexs û ramanê li nava kurdan jî li cihê xwe rûne. Divê em karibin ji raman û cudatîyên xwe re jî rêz û hurmetê bigirin da ku demokrasiyeke rastîn li nava me kurdan jî pêk were...

Remezan Alan: Rast e, rast e. Edebiyat serguzešta şexs bi xwe ye. Divê em li hundirê şexs binêrin û biafirînin. Belkî hingê edebiyateka cihêreng jî derkeve holê. Em mecbûr in pêşî xwe û dû re jî derdora xwe keşf bikin. Heya îro me şexs keşf nekiribû? Rast e. Lê ji ber çî? Mixabin ji ber doktrînan, îdeolojiyan!.. Ew di jiyana me de navendî bûn. Me li gorî wan li derdorê dinihêrî û em bi kodên wan diramiyan. Çawa ku li dû têkçûna Dîwarê Berlînê çavên hin însanan vebû û edebiyata ku bûbû şablon cardin xwe dawêşand, dê tecribeyên me yên van salan jî kêrî me bèn.

Gava nivîskar ji tirsê, ji referansa jiyekê dûr dibe, serbest dibe.

Arjen Ari: Gelo mirovê bindestê xwe, heta ku xwe ji xwe azad neke, di meşa ber bi çiyayên weşeyê de dikare çiqasî rê bigire?

21. 04. 2001 - Diyarbekir

Arjen Ari di sala 1956an de ji dayik bûye. Ji herêma Omerya ye û ev serê 9 salan e li Amedê dijî. Ta niha helbestên wî di kovara Tîrêj, Berbang, Nûdem, J. Rewşen Çira, Pelîn, K. Pen û di Warê de weşiyane. Pirtûka wî ya helbestan a bi navê *Ramûsan min veşartin li geliyekî* ji weşanên Avestayê der çûye û pirtûka wî ya duyemîn a helbestan jî li heman weşanxaneyê li ber çapê ye.

Berken Bereh di sala 1954 de li bajarê Şîrnex ji dayik bûye. Helbesta wî cara yekemîn di sala 1980yan de di kovara TÎRÊJê de weşiya. Bi helbestên xwe di sala 1998an de di pêşbirka helbestan ya ji alî TUHAY-DERÊ ve hate dayîn xelata yekemîn û di sala 1999an de jî xelata dîyemîn ya ji alî Navenda Çanda Mezopotamya yê ve hate dayîn, girt. Heta niha helbestên wî di kovara Tîrêj, J. Rewşen, Nûdem, Avesta, A. Welat, Hiwa, Mehname de weşiyane.

Remezan Alan di sala 1968an de li navçeya Kufra hatiye dinê. Zaroktiya wî û salên dibistanê li heman navçeyê derbas bûne. Di sala 1987an de li Zanîngeha Dijleyê dest bi xwendina beşa Edebiyat û Zimanê tirkî kiriye. Ji sala 1992yan û vir ve di kovarên tirkî û kurdî de helbest, rexne, ceribandîn û berhevokên wî weşiyane. Lê va ye, ev serê sê salan e ku bal û pêntûsa wî bi temamî ketiye ser edebiyata kurdî.

Roşan Lezgin di sala 1964an de li navçeya Licê hatiye dinê. Li Amedê dijî. Kurmançî, kirmanckî, farisî û bi tirkî dizane. Ji sala 1996an û bi vir de ye bi nivîsînê dadikeve. Ta niha helbest, çîrok, berhevok, makale, wergerên wî (Bi kurmançî, kirmanckî û tirkî) di kovar û rojnameyan de weşiyane.

Omeriya



SERKAN BIRÛSK

Hestetovên sertebeqekirî
ên di kêrahiya giyanan de aj dayî.
Omerîya
Tu di darbesta xwe de digel tenêtiya nasnameyî direqisî,
û li dengê nalîna bilbilên xwe dihishişt.
Mizgînavanên mirina bi navê çêbûnê
helbestvanên hestqirikî
rûreşên roniyê
di dijiwariya rastiya darerejiyê de
te bi xewnên berfînan dimihînin.
Hey şîngirê şînkatî û şênîyên xwe
ne ew şîngirên pêşerojê ne,
ku dixwazin te li şîna te biftirînin.

Ew şîna reş ku di çavên te de dem girtiye,
ku ne ji kilê siphani ye.

Hey gidî şanogera geregupê,
riyên derdan li dilê te siwar in
avzêmkên hêviyê jê derin.

Çiyayên te bi qelêra talanê tert girtine.
Sabûna ji şînokên te kef nade li evora te.
Guhîj û xişxişok û dirîreşkên te
reh berdane odeyên şevbuhêrkan
û tu soravî dişirîkî kokê.

Tahtikên te ên ku tîrêjên pêşî ji xwe teyisandin
û ji Xwedayên gevergij re bûn mirêk,
îro li ber hilma birîndarên te hûr hûr dipûrizin,
û bi wexma birînên gundên te dikelin.

Û eşetîra te diniqute ser lêvên Nisêbînê.
Nisêbîn: Bîr û ol û dîrok

Şer û leheng û pîroz û serkeftinên kêlikî
û talan û koç û girî û kînen bi dirêjahiya hesar salan.
Bi çavên mîxkîrî digirî çilhezar asaqlêkirîyên pêşî
û dîrok serê afrênerê xwe dixwe.

Û hebra pirtûkên Meryaqûbê
ji kortikên çavên Mezopotamya şîn diherikî Çexçexê
û darbestên helbestên Mor Afrem

ber bi rojava ve ji axê dihatin qetandin û heliqandin.

Û tovên te bi ser rojava ve pûç hatin dêran.

Rijîyan yek bi yek li riyên xerîbiyê, çavên te
û tu di zîndana xewletiyê de bi gîsnê mirinê hatî şov kirin.

Tu hêviya pûk di çavê bûka pêlîskî de mezin dikî...

Ma ne ew ji sînga te firîyan, li ezmanên heftan gerîyan, digel kundên nûjen
vegerîyan

û ketin ser dilê te ê mîna pincarê peritiye

û xewnên te bi mêwên te re yeko yeko hil kirin

û tu mîna dilekî dil sipartin mirinê.

Tenêtiya te di qêrîna çavsoyîyê de mezin bû û hey bû.

Û tevî ku kesayetiya te di valahiya bēnasnavî de kok berdaye xwîne jî,

tu diçilmisî.

Di bêevîniya sariya dûrahiyan de pêşeroj fireh nabe.

Omeriya;

tu ji çavên xwe

hestên bi zilaliya hêsirên kewan diherikand

kortikên hinarkên xwe

ku evîndar di berbangên revandinê de

bi xwunavên kulîlkên te pîroz dibûn...

Lê tu bi diranê kîjan nijadxwarî ji qurmê dîroka xwe ve hatî kevaştin,

bi agirê kîjan zihayî ji çandê hatî şewitandin,

û bi virûsê kîjan îdeolojiyan ji nasnameyê hatî rizandin.

Di guhên zarokên te de şîrqêşîrqa zincîrên dîroka talanê,

ew ji bilindahiya pêşîra te bi darê çavsoriyê hatin avêtin.

Ew li toz û tirabêlka beriyê bi gir şîr hatin.

Wan mîna gulên berbero

li raserî çiyayên te

xwe bi serhişkiya nasnameyê liba kirin.

Ew gulên tozê ku di nejbîrkirina rehê de ter in

Car hat bi striyên hesînî ve çûn.

Car hat ji ber pêşa te hatin qirkuçandin.

Lê wan her bêhna xwe furandin ber bi himbêza te ve.

Tu şevê di firehiya çavên xwe de biçûk bike

û bi perên xwe ên baskokirî

xwe serserkî bi ser textê eniya Heranê de berde

û li eniya wê şîr were

Bila bayê kur destmalka berstuka te mîna pelên payizê li ber xwe bibe

û bigihîjîne hinarkên Îstarê.

- Îstarê ez dimirim. Ka xweşiya pîroz û yariya ji dil, a li perestgeha evîna helal.

Ruhê min di kolanên cemekanî de zembeliq digire.

Û kaxizên koşehjmarmezî

yekser dilewitîne

mey û evîna li ser lêvên ferîştayên te.

Reşbarana ji çavên te

zimanê te di ufbûna tenêtiyê de

mîna tayikekî sermibirî ji qam de
gerî ser kortika rûyê niştimanê dike.
Di hişê te de dihejîjê dara mişmişê.
Kevokê hêlînşewitî bi ser bîranînên nijadî de zelq dike.
Qaqexoya kewê ribad e di berbanga xelaya serê çê de
ji te re dixwîne.
Li asoya çavên te sûskek bêserî difire.
Ji lêvên te derdibin çemgezoyên qeşagirtî.
Tu bi demûşa şîrêza giyana xwe dixerixî
û xwe li binya mêwekê vedizilîntî
û ji guhanên baranê jehr dimijî.
Qêrînek reş ji mextela Zerdeşt bilind dibe
û berzûriyên te di berbanga duayên rojê de heremolî dibin
û tu bi rîşa şara xwe li sêdara olan li ba dibî.
Mizgeft û dêr û sînogokên te
agir dibarînin li pîrozeteyrê Şingalî.

Omeriyan:

Ew boşêşa,


ku di sînga te de mîna lehiyegiriyê bûkeke bédil bend kirî maye

dê ji bedena te bête derkirin

û tu ê nava stranên hilîntî.

Mor Afremê Nisêbîni yek ji damezrênerê muzika dinî ya suryaniyan e, herwiha wî gelek helbest jî nivîsandine.

7,777,777



RÊNAS JÎYAN

Reng:

li xirbeyekî xewle,
di nerînên çahşikeke cindî de min velîstiyê
ma kî zane
çavên xwe û çermê xwe min ji qefesa te
ya bûkaniyê re hiştîyê, ji dêvla morfk û hirbiyên te
dixurînim birînên xwe bi bîranînên xwe

noteyên muzîkê:

hişê min pelîse
devê min avist gotinên beravêtî
erê; tu erbaneyêke bicizbêketî yî
erê; tu ribabeke ji êgir î,
lê tu nikarî ewqas stranên ji dil hilgirî
tu nikarî

kişwer:

temberiya min talankirî
li hêviya hêviyên kurmancî me
ka dirêjî min bike wan gulikên xwe,
di xêzikeke filehan de asê mame
ma kî zane
ji te pê ve

roj:

ecacokeke emeliyatkirî rabûye
li kulîna kevaniya gulî-ba
dixwaze li hilobiyên bitr guhdarî bike delala dobelana

huner:

û ferşikê berxikê xewsivik meyand mexzena xeyala
here ji wan re bêje

pramature:

zikê ewran li berdevê wan
bayekî beradayî xwe li newqa te badaye
di baranê de bêhna pezê şil tê ji himêza te
li ser kulavê biharê
dixurînim birînên xwe bi bîranînên xwe
û her ku diçe barê min girantir dibe

qatên ezmên:

dendika demê derizî
şevbihêrkên cewrik direyin li dû salnameyên seridî
tu katjimêr ne ewqas mêr e ku emrê wî bihejmêre
here ji wan re bêje bila herin ji wê re bêjin
emrê!...
tariksela ye

Garebêtê Bidê:

”Dayika hemû tiştên nebaş nezanî ye”

SELAHATTÎN BÛLÛT

Garebêtê Bidê di sala 1928an de li Dêrika Çiyayê Mazî hatiye dinyayê.

Navê bavê wî Bêdrûs e. Kurmancan bi kurtî jê re gotine Garebêtê Bidê.

Di nasnameya wî de, heta ku dozgerê navçeyê neşandibû pê, navê wî Garebêt Orûz bû. ”Orûz” di zimanê rûmî de tê wateya ”birincê”.

Paşnavê Garebêt ji ber ku ne bi tirkî bû; li qereqolê, li dadgehê û li sehkirinên ser riyan; leşker, polîs û karmendên dewletê jê re astengiyan derdixin û bela xwe jê venakin. Nasnameya wî bûbû wek bizotek agir û ketibû pêxîlê. Di sala 1958an de rojekê dozgerê dadgeha Dêrikê dişîne pê, xwe qup dike û jê re dibêje:

”Garebêt! Ez paşnavê te naecibînim, ger tu biguherîne wê ji te re bi xêrtir be...”

Garebêt naqedîne û paşnavê ku ji bav û kalan jê re mabû diguherîne. Ji ber ku bavê wî libûdî bû paşnavê xwe yê nû bi tirkî dike ”Keçeciöğlü.”

Di sala 1915an de, gava Dewleta Osmanî fermana filehan radike, Bidê zarok e. Leşker, li ber çavên wî, ji malbata wî kê digirin, dikujin. Kurmanc Bidê direvînin, vedişêrin û ji destên leşkeran xelas dikin. Bidê ji ber tiştên ku dîtiye şephe pêdikeve. Wextek dirêj bi ser xwe ve nayê. Gava heşê wî tê serî, dinêre ku bi tenê û bêkes maye. Tiştê ew êşandibû, jê re bûbû kul û tim digot ne tenê tevkuştina dewletê bû, gava dihat bîrê ku hinek kesên kurmanc, bi leşkerên dewletê re êrîş dikirin ser filehan, wê wextê weke xencerek li nav piştê bikeve dilê wî diêşiya û xwîna canê wî sar dibû. Li digel vê bîranîna bêyom, dema dihat ber çavan ku kurmancan ew û gelek zarokên mîna wî ji destên leşkeran direvandin û vedişartin, wê çaxê birînen canê wî

dikewidîn û kulên dilê wî puxte dibûn.

Kurdan bi piranî li hemberî zilma dewletê ermenî parastine, di malên xwe de ve-
şartine û sitirandine. Lê hinan jî bi dewletê re hevalbendî kirine, xwe neqenc û rû-
reş kirine.

Xerabî zayiya nezaniyê ye. Nezanî dijminê herî zor e. Kesê nezan hem dijminê
xwe ye, hem dijminê dostê xwe ye.

Bidê pir dixwaze bixwîne, lê ne mamoste û ne jî dibistan heye. Di wê tunebûna
perwerî û hînkarî de, pirtûkan pêde dike, dixebite û hînî xwendin û nivîsandinê
dibe. Lê digel zimanê ermenî û kurmancî, hînî zimanê tirkî û erebî jî dibe.

Xwendin serê mirov têr dike lê zik têr nake. Bidê, birçî û perîşan e. Divê karekî
bike. Li cem libûdiyekî dest bi karê çêkirina kulavan dike.

Bidê diçe leşkeriyê, dizewice, zarokên wî çê dibin; dixwîne, diaxive, dixebite, ku-
lavên pir baş çêdike û rojekê ji vê dinya gewrik bar dike û diçe. Diçe nav mezelên
filehan, mezelên kuştîyan...

Şevêkê, li Stenbolê, li mala kurê Bidê Libûdî, li mala Garebê, bûm mêvan. Pirs ji
pirsê şeqitî û em li bersîvan gerîyan. Kela me rabû, hêsirên çavên me bûn lehiyek
êgir û herikîn. Em di nav pêlan werbûn, dahatin û hilatin. Em kil bûn, di ser hev
re qulipîn û ricifîn. Em çûn cîh û warên tevkuştina filehan; em rapelikîn serê Pozê
Mancêlê, gindirîn ser Govê, ji Govê hatin xwarê; em bûn xwîn, herikîn, li nav Xer-
zikên Korra der bûn û li nav mezelên filehan em gewimîn...

Garebê Bidê di sala 1951ê de li Dêrikê pirtûkxaneyekê vedike. Panzdeh salan vî
karî dike. Wê şeva ku li mala wî bûm mêvan, hîn zêde li ser karê wî yê pirtûkxane-
yê em axivîn. Bi qewlê ku rojêke din li ser kuştina filehan bipeyivin û bi hev re wê-
neyekî bikuştin, min destûra xwe jê xwest û rabûm. Lê êdî min Garebê qet nedît.
Sibakê min bihîst ku wefat kiriye. Me bi hev re wêneyek ne kişand û hevpeyvîna
me jî mîna gelek tiştên me nîvçe ma.

* * *

Selahattin Bûlût: *Li Dêrikê dibistan kîjan salê vebû? Li hemberî vekirina dibistanê
helwesta xelkê çawa bû?*



"Zimanê dew-
letê, tirkî bû û
kurmançî qe-
dexê bû. Bawe-
riya kurman-
can bi dewletê
nedihat, zanî-
bûn di vekiri-
nên mekteban
de fenek heyê.
Lê nikaîbûn
mektebên xwe
ava bikirana û
bêçare zarokên
xwe dişandin
mektebên
Cûmhûriyetê."

Garebêtê Bidê: Di sala 1932an de dibistan vebû. Qederê heftê sal berê li Dêrikê Protestan hebûn. Di sala 1925an de barkirin çûn Stenbolê. Xaniyên wan du tebeq û baş bûn. Dewletê ji wan xaniyan yek, kir dibistan. Bi fermî navê wê dibistana ewil "Ataturk İlkokûlû" bû, lê kurmancan, di nava xwe de digotin: "Mekteba Mala Protî."

Zimanê dewletê, tirkî bû û kurmancî qedexê bû. Baweriya kurmancan bi dewletê nedihat, zanîbûn di vekirinên mekteban de fenek heyê. Lê nikarîbûn mektebên xwe ava bikirana û bêçare zarokên xwe dişandin mektebên Cûmhûriyetê. Kurmanc feqîr û di binê darê zilmê de bûn, ji ber ku bi tirkî nizanîbûn gelekî kişandîbûn, pirên wan digotin bila zarokên me hînî tirkî bibin û vî agirê em têde ne ew nebînin. Ez bi xwe jî, ji bo xelk zarokên xwe bişînin mektebê gelekî xebitîm. Min digot her çiqasî mekteb di destên nebaşan de bin jî, zarokên me di serî de belkî nebînin, lê dû re wê rastiye bibînin û bikemîlin.

– *Li Dêrikê dikanekê te ya pirtûkan hebû. Pirtûkên dibistanê, defter, pêñûs, pirtûkên çirokên zarokan, yê bi wêne û te rojname difirotin. Karekî wilo ji ku hate heşê te? Armanca te çi bû?*

– Di sala 1935an de ez çûm dibistana pêşîn. Min pênc salan xwend. Min gelekî dixwest biçûma dibistaneke bilind, lê dibistanên bilind li bajarên mezin bûn û çûyina bajarekî mezin jî, bi qandî çûyina asîmana zor û dûr bû. Hisreta xwendinê bi min re mabû. Ji ber vê yekê min pir dixwest zarok bixwînin û bigihêjin derên ku ez negîhabûmê. Dayika hemû tiştên nebaş nezanî ye. Tu welatekî bispêre mirovên nezan wê di çar rojan de xera bikin. Sebebên hevkuştina xwe bi xwe yî, bê tifaqî û neyekbûna me giş ji nezaniyê ye. Armanca min î vekirina pirtûkxaneyê ev bû.

– *Pirtûk, defter, pêñûs, rojname û hwd, ji ku derê, te çawa dianîn?*

– Ji rojnameyên wê çaxê Yenî Sabah, Ulus, Akşam, Dünya û Milliyet ji min re dihat. Min, karwanvanên ku diçûn Amedê temî dikirin, di vegeerê de dianîn. Karwanvan di du sê rojan de digîhan Amedê. Ewqas jî vegeer, dibû şeş heft roj. Du sê rojan jî li Amedê vardiqlîn, dibû neh deh roj. Mehê sê caran me rojname dixwend. Bihayê rojnameyekê 22 quruş bû. Serê rojnameyekê 3 quruş min dida karwanvan dibû 25 quruş. Min jî bi 25 quruşan difiro. Gava rojname dihatin, li ber dikanê te digot qey govend geryaye. Ji xwe jî firotina rojnameyan ji min re tu kar nedima. Lê belê wextê ku min ew şayî li ber deriyê xwe didît, malê dinyayê tev dibû ê min.

Tiştên din, wek pêñûs, defter û pirtûk ji Mêrdîn û ji Amedê min bi keran dianî. Lê bi çi halî! Wextê çemê Xarok radibû em, du sê rojan li çolê diman. Ji Dêrikê du rê diçûn Mêrdîn: Riya çiyê û riya beriyê. Riya çiyê; ji Xabê dest pê dikir, di Firêşî, Xarok û Qesrîk re derbas dibû. Riya beriyê; ji Tilbisim dest pê dikir, di Germîk,



"Kurmancan bavê min xelas nekiribana ezê aniha tunebûma, ez tunebûma Dêra filehan wê niha tewleya hespên leşkerên tirkan bûya"

Remok, Xanîka, Keleka Şêbê, Tilqer, Zorava, Qiziltepe û di Buhêrkê re derbas dibû. Herdu riyan jî bi çûyin û hatinê, ger tu astengî derneketa çar pênc roj dikişand. Riya ku diçû Amedê pênc şeş roj dikişand. Di ser Taşît, Şewlê Qêdî, Girê Sor, Giwîs, Sipyag û Sêpirikan re derbas dibû. Ez û kerê xwe, ji du sê mehan carekê, di van riyan de em diçûn û dihatin.

– *Ji bo ku Dêra filehan ji nû ve ji îbadetê re vebe tu gelekê xebitî û tu bi ser ket. Dêr; kê, ji bo çi girtibûn û te çawa vekir?*

– Dêr ne girtî bû, vekirî bû, lê xwezî girtibûya!... Dewletê kiribû axurê hespên leşkeran. Ewîlî, di sala 1957an de bi navê "Surp Kevork Ermeni Kilisesi Onarma Derneği" me komeleyek damezirand. Dû re, ji waliyê Mêrdîn bi perê wê çaxê, bi pênc hezar û dused û pêncî banqnotî min dêr kirî, tapûya wê anî ser navê xwe û ji îbadetê re vekir. Di sala 1966an de min mala xwe barkir Stenbolê. Lê min têkiliyên xwe ji Dêrikê nebiri. Ez tim diçim û tîm. Niha jî, di hewşa Dêrê de ji bo mêvanan ciyekî biçêkirin didim. Kurmancan bavê min xelas nekiribana ezê aniha tunebûma, ez tunebûma Dêra filehan wê niha tewleya hespên leşkerên tirkan bûya. Xwedê ji kurmancan razî be. □

mirinnn...!

hey:

dayikên aşîxwaz
mirin pengizî ji gora
werin secde bibin ji ehîfmana re
û xwe tewambar kin
li zincîra xin malzarokên xwe
bihonin jana ji porên termê demê
girîyên xwe biçênin li reşikên çavê rojê
nava tilikên xwe de bişkinin tembelya terlana
û vedin goristanê dilê xwe
gulyên xwe biqusênin bi ser kezeba xwe de ...

hey:

dayikên amed û silêmanî
bila saxbin pozkulingê sermiyana!
bikolin bi xîreta pozê wan
goristanan ji amed hatanî silêmanî
bila mezintir mezinbin ligor erxa devê nokeran
bi qasî temenê rojê dûdirêj
welatekî bêsermiyan diricifim ji têhna bê
med-girî dayka dîrokê
ji hêstirên çavê te stêrk fedî dikin...

SERKEFT BOTAN

EDİB KARAHAN

"AX! GUL IM, GUL IM..."



ROJEN BARNAS

EDİP KARAHAN

"Allu turnam bizim ele varırsan /Şeker söyle, kaymak söyle, bal söyle / Eğer bizi sual eden olursa /Boynu büküük, kolu kırık, yar söyle /Ah! gülüm, gülüm.../ Büküldü belim / Kırıldı kolum /Turnalar hey!"

Gava ev strana tirkî ya gelêrî ya kevin, ya ji hesreta li xurbetê dagirtî tê stran brûskek ji kûrahiya bîra min li ser canê min bi şîrqînî pejilên xwe vedijene: Pêlên elektromanyetîka wê brûskê ez hiltînim dibim nav "qawîşa" girtîgeha leşkerî ya Seyrantepeyê ya ser pozê hafa Dicleyê, ya bîst û pênc sal berê.

Lê gujîn û gurrahiya keserê ya di nakarata wê ya "Ah! gülüm, gülüm... kız gülüm, gülüm! yar gülüm, gülüm!" de min noqî binê bîra bîranînan dike ku li wê derê rû bi rû rastî rehmetyê "Edip Karahan" û dengê wî yê dawidî, gurr û xemjen dibim.

Bê guman "ah! gülüm, gülüm..." a tirkî bi bilêvkirina Edîb abê dibû "ax! gul im, gul im..." eke wisa ku ji binê nixafa cegera wî ya gamêşî dihat û di xençerê ya gewriyê de wek babelîska kovanê li hev digeriya û bi awayekî hinavsofî derdiket.

Me hevdû cara pêşî ku ez ne şaş bim di bihara 1970 yî de li Diyarbekirê li qehwexana "Çamlica" yê dît. Bawer dikim di pey avêtina ser gund û bajarên navçê a ji aliye qomandoyên cendirmeyan bû. Ji Anqerê, Îstembolê çend xwendekar hatibûn. Ji

bajarên hawîr pêşkêşên komên welatparêz ji bona civîné hatibûn. Hevalekî, ez û Edîb abê bi hevûdu da nasîn. Min ew xiyabî ji rojnameya "Dicle-Fîrat" û ji doza 23 yan dinasî. Piştî çend gotinên destpêkî wî li bajarê min û di pey de jî li eşîra min pirsî, min navê eşîra xwe jê re got. Bi awayê xwe yê taybetî got: "Hela! hela! em pismamê hevdû ne. Pêşiyên min jî pismamên Silêman axa ne, lê di wextê de rabûne hatine hêla Dêrikê." Silêman axa hevsalê bavê kalê (yaxud kalê bavê) min bû, ew herdû di çend bavan de digihîjin hevdû bêguman ez pê nizamim. Ji ber ku di pey vê carê de me tucar behsa eşîr û eşîrtiyê ji hev re nekiriye, nizamim ka bera çendî rast an çendî dilxweşkirin bû ku em herdû ji eşîrekê bûn. Wek gelek kesan, ji xwe ji bona me herduyan jî Kurdistanparêzî û kurdperwerî, ya herî girîng bû. Ji "Çamlica"yê em rabûn çûn aşxana Asim ku hingê li hala sebze ya li Deriyê Ûrfayê bû, civîn li wê derê çêbû û heta derengê şevê ajot.

Di pey de jî carekê em rastî hev hatibûn: Ew û Doğan Kılıç bi hev re bûn û diçûn Barmanê: Li ser Mele Mustefa Barzanî û rewşa şerê wî mîna meqale belavokek nivisandibû, bi daktiloyê ji hev zêdekiribû û li welatparêzên kurd di bin dest de belav dikir. Ji ber ku hingê rojname an kovarek ku biwêre nivîsarên wî -bê destlêdan- çap bike peyda nedibû, wî jî bi vî awayî dîtînen xwe radigihand xelkê. Ev car, li girtîgehê êdî dibû cara sisyan, lê ya herî dirêj.

Dotira rojê ya revandina konsolosê Îsraîlî Efraîm Elrom bû: Serê sibê giregirên TÎP û DDKO'ya Diyarbekirê anîn girtîgeha leşkerî ya "sıkıyönetim"ê. Edîb abê jî di nav wan de bû û tevî çentê xwe yanî bi hazirî hatibû. Anqere - Îstembol li ku, Elrom û Diyarbekir li ku? "Hukmê qereqûşî" ya zihniyeta dewleta Alî Osman bû. Ez jî 5. Gulanê vê de li wê bûm. Niyazî osta û grûbên ji DDKOyên Silîva û Erxeniyê û grûba xwendekarên tibê heftekî berî min hatibûn girtin.

Serê pêşiyê girtîgeha me li wargeha "Topçu taburu" bû. Gava meriv ji Deriyê Çiyê diçû ber bi Seyrantepê ve, li milê çepê piştî mizgefta leşkerî birceke nizm a embara avê û aşpêjîxana leşkeriyê hebû; hema li seriya wê girtîgeha me bû. Cîhekî fereh û çaralî vekirî bû. Li rast û çep du avahiyên dirêj ên ber bi bakur-başûr ve dirêj û yek qatî hebûn. Di navhera herdû avahiyan de meydanake fereh çî bigre bi qasî meydana fûtbolê ya nîzamî fereh hebû ku di bihnvedanan de ew ciyê piyasê, voleybolê û tevgerên h.w.d bû. Serê pêşiyê yê di pey revandina Elrom; ji Qers, Erzerom, Ezirgan, El'ezîz, Meletî û Mereşê otobus bi otobus meriv tanîn. Lê piştî heftekê du

hefteyan hêdî hêdî sivikahî çêbû, bi tenê rêkildarên DDKO û kurdparêziyê dan hiştin. Piştî wê sivikahiyê, li aliyekî wê meydana ciyê voleybolê hate saz kirin; heroj piştî nîvro kom bi kom li wê derê bi voleybolê dileyistin ku ji wan leyistikvanekî dayîmî Edîb abê bû. Şortekî sorê gevez li xwe dikir, tevî wî gewdê xwe yê gir ê qirase bi enerjîyê gurr û bi cansivikî dileyist. Bi gewde û drûvpêxistinî, ji xwe drûvê wan palewanên "Kırkpınar"ê pê diket.

Di serê pêşiyê de li Diyarbekirê çî bigire îşkenceya fîzîkî ya wekî lêdanê filan tunebû. Lê ji Xelef pêve: Xelef an jî Xelefê berber ji hêla Mêrdînê an jî Dêrik an jî Qiziltepe ji wan deveran ji derekê bû. Bi lêdana di feleqeyê Xelef osta bêlezet kiribûn, ew çend ku nikaribû rabe li ser lingê xwe raweste. Heroj carek du car "ta'dad"(hejmartin) hebû ku derketina me ya hejmartinê mecbûrî bû. Wêca diva ku Xelef jî bihara "ta'dad"ê. Emir emir e, Xelef jî anîn, lê Xelef di palasekê de anîn: Çend hevalên zexim ew danîn ser palasekê, bi koşe û keviyên wê girtin, bi wî awayî Xelef anîn, di dawîya qorê de li ser palasê ew jî tevî merasima hejmartinê bû. Lê mudirê me "komutan" bi vî awayî ne razî bû, jê xwest ku Xelef rabe piya, bikeve qorê û "esas dîrûş"ê. Hevalên li nêzikê Xelef xwestin bi mudir bidin fehmkirin ku Xelef ji ber binlingên xwe yê teqandî û parsiyên xwe yê şikandî nikare rabe ser xwe. Mudir nexwest ji kirta xwe dakeve, got "na! emir dikim ewê rabe!" Edîb abê hêrs bû û ji nişka ve bi dengêkî bilind qîriya, got: "Ûç Xelef! Ûç! Qumandan beg emrediyor!" Pişkî bi me giştan ket, em gişt kenîn, cidîyet û resmîyeta merasimê nema, "Komutan"ê hêsr em hêlan û çû. Lêbelê "Ûç! Xelef üç" a Edîb abê hê jî di guhê me de olan dide.

Payizê cihê me hat guhaztin, em ji wargeha tabûra topçiyar birin aliyê hafa Dicleyê. Wek bergeh ew der piçûktir bû, ji bajêr averê bû, ji aliyê ewlehiyê ve jî ji bona îdara girtîgehê bi ewletir bû. Li wê derê sazmana xwe-hêvoştinî jî hate saz kirin: Çawa li girtîgehên din "koğuş kidemlisi" hene, li wê derê jî îdareya girtîgehê ya leşkerî ji me xwest ku em di nava xwe de berpirsiyarekî hilbijêrin, da ew danûstana navbera me û îdarê bi rê ve bibe. Ji aliyê me ve Edîb abê hate pêşniyarkirin û peji-randin. Wî jî Mustafa Düşünekli kir cîgir û Akîf jî kir berdestekê xwe û ji wê re jî got "başkanlık divanı". Gotina wî ya "başkanlık divanı" di serê serî de tiştêkî mina henek, mîna tinazpêkirin bû, lê ev tabîr ji aliyê îdara girtîgehê ya leşkerî ve hat qebûl kirin, wekî ku termeke huqûqî ya ji "iç hizmetler kanunu" be.

Wisa ku rojekê ji rojên seredanê, -wekî hemî girtiyên dinê ku hê seredanên wan nehatibûn an hatibûn û çûbûn- ez û yek-du heval bi hev re me li baxçe piyase dikir, em li nêzikî koşeyê hêla nîzamiyê bûn ku ha me dît borînek bi ser Edîb abê ket û dibêje: "Hela hela yahu! Şuna bak hele! Burası Kürdistan dir ve burada elbette Kürtçe konuşulacaktır. Kürtçe konuşmayacaksak burada işimiz ne peki?" Mudirê girtîgehê yarbay gotê: "Edip bey! Edip bey! kendinize gelin rica ederim. Karşınızdaki sayın kurmay başkanıım." Edîb abê çengê xwe yê dirêj î çepê bi ser mudir ve vewêşand û gotê: "O kurmay başkanı ise burada da koskoca başkanlık divanı var, be!"

Çi bûbû?

Pêşiya girtîgehê, li qiblê dinihêrî û meydana ke çargoşe ya dirêjîk bû. Sê aliyê vê meydan an hewşê bi têldiriyên têlkiyî bû. Gava seredanên me dihatin ew li wî aliyê têlan û em li vî alî, me hevûdu didîtin. Carina neferekî, onbaşî an çawîşkî li hêla wan radiwestî ku hay lê be em tişt bê kontrola wan ne din hevûdu. Vê carê jî hevalêkî me û seredanên xwe, bi hev re wek timî bi kurmancî dipeyivin. Serekê serkanê "kolordu"yê, dizê tenekekî qeliya Elî Beyköylü "Kavurmacı Süleyman paşa" jî tevî mudirê girtîgeha me "yarbay" ve bi cilên sivîl li pişt seredanên vî hevalê me rawestayê û dibihîze va ev bi kurmancî dipeyivin. Bi wan re pev diçe û hêrs dibe, diqîre, dibêje: "kesin ulan! Türkçe konuşun!" Ev guh nadinê, dibêjin em bi tirkî nizanin. Paşa bêtir tê hêrsê û dibêje: "Burası Türk vatanı Türkiyedir, burada Türkçe konuşulur." Bêlome û bêkubarî be, ev gotina wî tê guhê Edîb abê. Edîb abê yê ku li esmana li bahaneke pûç digere ku kela xwe di serî de hêdî bike û li erdê rasî yeka bi vê sosretê tê. Kela xwe di serê paşê de wisa hêdî kir ku "Kavurmacı Süleyman paşa" revî revî ji ber "başkanlık divanı" reviya û çû.

Em yê li girtîgeha Diyarbekirê ku ji "DDKO, kurdayetî û welat parçekirin (bölücülük)" ê dihatin mehkeme kirin; li gora daxuyana mafên mirovî ya navneteweyî, peymanê mafên mirovan a Ewropayê, qanûnên cezayî yê welatên medenî diva yek ji me jî hingê ne di hundir de bûna û nehatina girtin jî. Di mala yekî ji me de jî çekê agirber li wê derê bihêle kêrikek ko jî nehatibû girtin. Îsnad û îddiyên dozger (savcı) yê derheqê me dibûn mijarên çîrokên pêkenînê: Feqî Ebdulêtîf tevî radyoyeke qirase ya teribandî ji modela 1955 an bi îthama ji sîxuriya (casûsî) Barzanî li qezake Mêrdînê girtibûn, ji wê şandibûn Mêrdînê, ji wê derê jî anî-

bûn ba me. Rehmetiyê Rizqo suryanî bû, lê bi şerfeterestiyê îslamî dihat sûcdar kirin. Behrî Evliyaoğlu nexwenda bû, lê bi heyranî li afîşeke ku propaganda kurdayetiyê dikir nihêribû. Yek pêlaveke lastîk, yekî dî du kîlo şekirê çayê ji Barzanî re şandibû û pê "bölücülük" kiribûn. Sûcê Nazim jî ne sivik bû: Şeva ku li ser rê û kolanên Diyarbekirê bi boyaxa spî li dijî emperyalîzma Amerîkayê slogan hatibûn nivîsîn; ku yek ji vana jî li ber îstasyonê hatibû nivisandin û digot "Türkiye Amerikanın genelevi değildir", Nazim jî wê şevê li wê hêlê hatibû dîtin û ev jî aşkera dikir ku tékiliya wî pê hebû. Ev îddîayên dozger (savcı) bûn. Di mehkemê de gava dozgerê me vê benda iddîanama xwe xwend Edîb abê ji nişka ve rabû piya, -li rêza pêşî an li ya dudiyar rûdinişt niha baş nayê bîra min; lê li aliyê çepê û nêzikî dozger bû- çengê xwe yê çepê bi ser dozger de veweşand, reben veciniqî xwe paş ve da, Edîb abê gote heyeta mehkemê: "Yani bu herif (savcı) Türkiye Amerikanın genelevidir mi demek istiyor? Bunun aksi yazıldığı ve tesadüfen oralarda görüldüğü için mi Nazım ve dolayısıyla biz suçlanıyoruz?" Dozger û heyeta mehkemê li hevûdu şaş bûn, qurf (panîk) bi wan ket nizanibûn ka ku çi bêjin. Di gelek cihên bi vî rengî sûcdarkirinên dozger ên tewşo-mewşoyî de Edîb abê ji cihê xwe bêdestûr radibû, êrîşî dozger û îddîaya wî dikir û yê itihamkirî ango hevalê xwe yî dozê bi awakî li gora xwe diparast.

Edîb abê merivekî bi xîret bû. Zordestiyê, çavsoriyê qebûl nedikir. Nizanim jê re çi gotibûn an jê çi xwestibûn? Rojekê di navdera herdû nivistgehan (yatakhane) de borîn pê ket û ji nav serê xwe kir qîrîn, got: "Hela! hela! bu ne iş yahû!?" Dışarıda karakol komiserlerinin elinden çektiğimiz yetmiyormuş gibi bir de içerde sosyalizm komiserlerinin elinden çekeceğimiz varmış."

Girtîgeha me bi nisbet girtîgehên din bi rastî ne girtîgeh bû: Erê bi heqî biya, li gora erf û adetê hiqûqa mirovan biya diva ku em ne li wê derê bûna, lê ew der jî cihekî mîna kamp bû. Pirtûkên li derva qedexekirî li hundir hebûn. Bi bîdonan vodka diket hundir. Pîrzola û kebab hebû. Lê helbet ev ji bona xwedîpereyan bûn. Ji heftê an ji panzdehê carek jî sînema dihat. Ji bona guhertinê baş bû, lê çend car li ser hev filmên beredayî yên mîna Battal Gazi, Tarkan, Malkoçoğlu filan bûn. Edîb abê aciz bû û bi makînîst re xeyîdî, gotê: "Bu ne biçim kendin gibi saçma sapan filimler getiriyorsun. Bilimsel film istiyoruz onbaşı! bilimsel film!" Di pey de dîsa sînema hat, lê vê carê filmeke niv-doxînsistî ya melodram bû. Film qediya, onbaşı

di heyecanê de ye ka ewê Edîb abê yanî "başkanlık divanı" çî bêje. Lê ji tîrsa jî dil-
kutka wî lêdixe. Edîb abê gotê: "Aferin onbaşı! Bak işte böyle bilimsel filim getir."
Ev nukteya "bilimsel filim" îcada wî ye. Lê "yetişin bitti, kalmadı"?

Min berê jî got ku ew der çî bigire ji alîkî ve kamp bû: Hin ji me hetanî saet 10,
11 an hetanî qerewana fravînê radizan. Qerewana taştê dihat, saetekî dima. Xwarina
dihat xwarin dihate xwarin, ya nedihate xwarin paşve diçû. Vêca carina ji bona taştê
tê hêkên kelandî derdiketin ku serê merivê yek diket. Bi qasî bîst-sih kes ji koma
xewxweşan bûn ku xewa xwe nedidan bi taştê. Hingê Edîb abê ewê rakira hêkên ji-
bermayî bikira feraqekê û bida berdilê xwe, ji xwaringehê dest pê bikira û heta ber
ranza xwe bi dengê bilind gazî bikira: "Yetişemedik yahu, kalmadı!" Te dît ewê
yek bipirsiya: "Hayrola Edîb abi (yaxud "başkan" weya "Edîb beg") o kalmayan
ne?" Ewê Edîb abê bigota û hembêza xwe nîşan bida: "Yumurta kalmadı, yumur-
ta!" Carina ev ne hêk bûn, lê zeytûn an leymûn bûn. Lê ew her vê gotina xwe ya
"yetişemedik yahu! kalmadı" bi dengê bilind diqîrî, herkes bi xwe dihisand.

Kengê bû, bi çî munasebetê bû baş nayê bîra min, lê şeveke şahiyê bû: Bi go-
vend, stran, nukte û metelokan geş bû. Dor hat ser Edîb abê jî. Edîb abê bê nazî û
xwe-giran-kirin wê strana "allı turnam" stra ku xemgîniya taybetî ya bi dengê wî
mîna mijê keserê bilind bû, li tevahiya qawîşê belav bû û hêdî hêdî li ser pejnên
herkesî giraniya xwe danî.

Tevî wê gewda xwe ya giran merivekî safî bi enerjî bû. Ha we dît li Deriyê Çiyê
destekî li girmilka we ket û pê re merheba da we û li ser duçerxeya (bisiklet) xwe di
we de bihurî û çû. Ha we dît di saha voleybolê de bi saetan bêwestiyên bi xortên ji
xwe panzdeh-bîst sal piçûktir re dileyize, nabetile lê dibetilîne.

Bi jiyê xwe navsere, lê di têkoşînê de xort, di baweriya xwe de li hember dijmin
bêta'wîz lê bi hevalan re nerm Edîp Karahan, "başkanlık divanı" Edîb abêkî me he-
bû ku felekê nehişt ew hevraza navseretiyê tamam bike. Ecel di çil û şeş saliyê de lê
xayîn geriya, ji heval û hogiran veqetand. Lê dengê wî hê jî di kerrika guhê min de
ye:

"Ax! gul im, gul im!...yar gul im... gul im! qiz gul im... gul im! tûrnalar hêy!"

Tebax, 1997

Ev nivîsa ha ji bo kitêbekê haribû amadekirin, lê heta niha kitêb derneketiye. Em bi destûra Rojen Barnas wê ji bo
bîranîna bîstûpêncsalîya wefata Edîp Karahan diwestnîn.

Hêwirîn



KAWA NEMIR

va ye em hatin dûrî bajêr hêwirîn,
em ê çend salekan li vir bimînin bi qewlê kevîrên reş,
li biniya pozê gêlî û çiyê, di nava mêş û mozên dirinde de,
em ê nebînin hingura ku pênc hezar sal e sîqal dike
birc û bedenan, wextekê em ê nebînin ziman çawa zingezinga
xwe di nava kolan û alûleyan de vedişêre.

li wir, di nava avzêma keser û kovana Rohilat de,
serêşiya me ya nezaniya navên kulîlk û gîhayan
dena xwe da zimanê ku li ber neonan dîn dibe.
va ye lewma em hatin dûrî bajêr hêwirîn,
em ê çend salekan, li ber siya daregûzekê, bimînin.

17 nîsan 2001

Gazinda xencera min

CELADET ALÍ BEDIR-XAN


Ji Ustadê min ê xweşewîst û hêja Tewfîq Webbî beg re

Ji zû ve ye min lê nenihêrtibû. Di ser banê kitêbxana min re; di quncikeke tarî û bi toz, tenîşkî û xwêl hilavistî bû. Kî zane ji kengê ve min ew nekiriye destê xwe. Pîrhevokên mezela min di ser wê re tevnên xwe ristine. Ji jor ve lê fedikrin, carinan datînin, di ser qevda wê re diçin, şopên xwe dihêlin û hildikişin hêlînên [konikên] xwe. Berî çend rojan qelema min keh [ko] bûbû. Min ê ew tûj bikira. Li kêrika xwe geriyam, neket destê min. Min çavê xwe li dora xwe gerand û li tiştekî digeriyam ku bikare qelema min tûj bike. Çavê min bi xencerê ket. Rabûm ber wê ve çûm. Wekî min destê xwe lê dirêj kir, pîrhevokên dorê bi min, bi biyaniyekî hisiyam, lingên xwe ên kevcalîn, di ber serên xwe re borandin û heryekê bi alîkî ve bazda.

Xencera min a jengîn ji kalanê xwe bi zorê, wek dengêkî nexweş derdiket; dixurî û dikehî. Ew çend jeng girtibû ku min ew kir nav kaxizekî û firikand, jê tozeke zê-rekevn difûrî û difirî.

Min qelema xwe da devê wê. Nedigest ne jî jê dikir. Di nav destê min de asê bûbû. Dil nedikir ku bi vî rengî xizmeta min bikir. Min xencera xwe kir pêşiya xwe û lê nihêrt.

Jenga wê bi nivî bûbû. Bi rengêkî nîvsor dest bi çirîstîne kir, hin bi hin rengê xwe guhart û yekcar sor bû, sorekî xwînsor. Hingê min zanibû ku xencera min ji min



xeyidiye. Dixwaze gazindan li min bike. Min ew dîsan bir destê xwe û jê re got:

– Xencera delal, te xêr e, mebit ku tu ji min xeyidî bî, ma min çî bi te kir ku tu ji min bixeyidî?

Zimanê xencera min geriya, li min vegerand û bi dengê xwe ê foladîn lê sitemkar û zîz got:

– Ma lê, ji te xeyidîme, ma çawan ji te naxeyidim. Te ez avêtim nav kitêb û kaxizan, te ez kirim hogir û hevala bermayên qaşûlên dar û qirş û hevsera caw û potikên zibilgehê. Ne li min dipirsî, ne jî li min dinihêrî. Heta niho min deng nedikir, min xwe di dinyayê de tayhebûyî dihesiband.

Lê êdî min nikaribû ez xwe ragirim. Belê nema dikarim, ji ber ku tu dixwazî min bêxt şûna hesinê solingen û bi min qelema xwe tûj bikî, pelên kitêbên xwe vekî. Tu dixwazî barê keran bikî pişta şêran.

Ez ku Folayê esîl, hesinî dibanim, pêşiyên te ez dikirim perasuyên mêt û mêrxas û gernasan û ez bi goşt û dil û cergî bi xwedî dikirim, tu dixwazî min bi dar û qaşulan bi xwedî bikî û şiv taşriya min wek kerekî ji zil û ka bî. Nene min birçî bihêle û wan qirş û pelên hişk meke devê min. Ez ne çarlingê giyaxwur lê şêrê goştxwur im.

Belê ez xencera duban, folayê nêrz, tu min davêjî nav kaxizên reş û belek ku ne ew bi min ne ez bi wan dizanim.

Belê dizanim îro ketî pê nivîsandinê, pê sehîtiya kurdmanciyê. Ji sibê heta êvarê carinan hera nîvê şevê û yek carinan heta qere bernangê bi pirsekê, nivpirsekê mijûl dibî. Heke mê ye heke nêr e, heke nav e, heke pironav e, an veqetandek û hevghiha-nek e. An ne di eslê xwe de kurdî ye yan ne ji zimanekî din hatiye girtin û pêşdetir hatiye kurdandin û welê por û pirç û simbêlê xwe sidpî [spî] dikî. Di salekê de deh salan diji û li raserî emrê xwe di biharê de berfa zivistanê didî barandin. Lê belê kêfxweş î û di dilê xwe de dibêjî ez ê milletê xwe bi xwendin û nivîsandinê, bi vê kurdmanciyê vejînim. Milletê min dê bibit xwedan kitêb û xwedan zanîn û welê bigihêt miraza xwe, dê bibit serxwe û kama xwe bizanît, bibit kamiran. Xelk nema dê bikarin bêjin ku zimanê kurdan nîne. Zimanê wan tenê zimanê axaftin û dan û sitandinê ye. Lê dê bibêjin kurd jî wek xelkê xwedan ziman û xwedan kitêb in û zimanê kurdî zimanekî hêja, dewlemend û tekûz e, kurd milletekî kevn in û dahatiyên Medan in.

Herê te daye pê Ehmedê Xanî, tu dixwazî ku wî karê ku Xanî nebiribû serî tu bi-
bî serî. Ewî gotibû:

Da xelk nebêjtin ku ekrad
Bê me'rifet in bê esl û binyad

Tu dixwazî ku bête gotin:

Xelk tev dibêjtin ku ekrad
Bi me'rifet in bi esl û binyad

Ji lewra ji bona vê yekê te ez avêtim pişt guhê xwe, te ez ji çav û dil dûr xistim, te ez kirim zirtexana pîrhevokan, ew kêzikên bê çerm û goşt ku heroj di ser min re baz didin, çivan didin xwe û dikin min di bin tevn û şopên xwe de binixumînin û qeşêrin.

Lê nabit, tu tişt, ne ziman, ne xwendin ne nivîsandina te bêyî min naçe serî. Bidî eqle xwe her a niho tu û milletê xwe hûn çawan mane, çawan we zimanê xwe winda nekiriye û îro dizanin pê biştexilin. Heke ez nebiwama ji zû ve te û milletê te we zimanê xwe winda bikirana.

Ji xwe çend caran, ma dil nekirine zimanê we jêkin. Zimanê we berî hezar salan zimanê dirê [dêrê?], zimanê hukûmetê bû. Ji hingê ve pê diberizin, hezar carî pê ketin. Hecar ez li ber we sekinîm û min zimanê te parast, lê ne qelesa te.

Heke ji min ne bawer î li dora xwe fedikire, tu wê bibînî ku herçî ji min dûr mane, hatine ketine bajarên zimanê xwe winda kirine û îro nedizanin bêjin "lo!" ne jî "lê!". Ji ber ku peyayên bêçek wek mirovên bê neynok in, kêç jî bi wan dikarin. Ji lewra ez benî qedrê min bizane, ji min dûr mekeve, min ji xwe dûr meçe û bi min ne qelesa xwe lê parsuwên dijminên xwe jêke!

Xencera min li hire gotina xwe qedand. Min dil kir ez lê vegefnim. Lê nedixwest ji min bibihîze, rabû ket kalanê xwe, xwe kerr kir û guh neda min. □

HAWAR, hejmar 12, 1932

Dîsa jê (ji Melayê Cizîrî)re şanê wî pîroz be!¹

M. EHMEDÊ ZIVINGÎ

*Bi narê firqetê sohtim ji ferqî ser heta pê da
Xedenga xefletê nuhtim ji berqa lami'a tê da*

xedenga xefletê nuhtim: Tîrê lêhaybûnê/xafilbûnê ez hingaftim û di laşê min de derbas bû çû, xedeng navê darekê ye ku di navsera çiyar de şin dibe û tîr jê tene çêkirin, lê pirê caran ev gotin ji bo tîran bi xwe tê bikaranîn. Mebest ji tîrê lêhaynebûnê yan ew tîr e ku ji nişka ve li yekî dikeve, yan jî ew xafilîya ji Xwedê te'ala ye ku weke tîr li dil dikeve.

ji berqa lami'a tê da: Ji ber biruska tîrêjavêj ya di tîr de ku bi lez û bi şid hat min hingavt, li min ket û bedena min qul kir. Ew birûska ku ji ewran tê û li ku derê dikeve wê derê dişewitîne.

Encama maneyê: Ez ji şilfika serê xwe heyant binê lingê xwe bi agirê cudahi-yê şewitîm; tîrêjên wî tîrê nagihanî ez hingavtim û biruska wî li laşê min ket û qul kir. Yan jî tîrê xafilîya ji Xwedê li dil min ket ew qul kir û kuşt.

*Xedenga firqetê re'd e, dilê ew xefletê lê dit
Dibêjim wer cebel bit ew bikerbit wê di gavê da*

Encama maneyê: Ew tîrê ku ji ber cudahiya ji dildarî peyda bibe mîna ye wî ewrê ku bi şid şîrqeşîrq dike û gurmîn jê tê. Vêca ew dilê ku ew tîr ji nedî ve lê keve, ez dibêjim ger ew mîna çiyayekî tahtok î hişk be ku bivirê pola jî tê de neçe dîsa dê ew di cih de şeq bibe û bibe parî parî.

*Heçî firqet nedî hîcran nebê min dax û key lê ne
Ji bil derbê di hîcranê fîraqa rûh û can kê da*

Encama maneyê: Çi kesê ku cudahiya ji dildarê û dûrbûna jê nedîtibe bira nebêje ku; birîn û şewatên bi êş û jan li laşê min hene û li ser jiyana min hukum dikin. Çiku ger ne ji derbên dûriya ji yarê be canê tu kesî ji bedena wî der-nakeve. Ji xwe sedemê rastî yê mirin û helandinê jî her ew derb in.

Dibe ku maneya wê kêm zêde weha be jî: Kesê ku derdê cihêti û dûriyê nedîtibe jê re mebeje: "Ez birîndar û laşşewitî me", çimkî kesê ku ew tam nedîtibe pê nizane.

*Ji her bêdax û bêderdî mepirsin mi'hmeta îşqê
Çi zanin bêxeber, jana dilê dax û keser tê da*

Encama maneyê: Gelî birayan ji kesên ku bi agirê evînê birîndar nebûne, pê neşewitîne û jana wê ya giran nedîtibe pîrsa rewşa evînê, êş û belayên wê ji wan meke! Lewra kesên ku ji êşa evîndarê bêhêvî, bêagah bin û haya wan jê tinebe, tiştêk ji kul û keserên dilê birîndar û şewitîyê bi agirê evînê nizanin û hay û gu-mana wan ji hesret, ax û oxên ku ji ber tê kişandin nîne.

*Kesê mi'hnet dî yû firqet, vexwarî cer'eya hîcrê
Girî wan tê bi halê min di vê hîcran û zecrê da*

di vê hîcran û zecrê da: di vê dûrî, keder û xemgîniyê de, "zehr" di kurdî de ji bo kul, tadeyî, keder, xem û tiştên ku ji wan çêdibe, tê bikaranîn.

Encama maneyê: Bêguman ew kesên ku zoriya evînê dîtine, ketine belaya

cudabûna ji dildarî û ji ava dûriyê qurtek vexwarine giriyên wan bi vê rewşa min ya perîşan î şerpeze û xemnak tê û ew ji van kul û keserên dilê min yên bê-rawestan re digirîn. Ji ber ku wan ev derd kişandiye loma ew ji yên din çêtir dizanin

*Bi dama muhbetê bend im, xedenga firqetê dil nuht
Bi şubhê murxê nîm besmel, di hev wertêm di xwûnê da*

dam: bi farisî ye û ji bo daf/dafikê tê gotin, bi kurdî jê re "dab" dibêjin

besmel: navê kin ye "Bismillahi 'R-e'hmanî 'R-e'hîmî" ye ku dema serjêkirinê tê gotin; li vir mebest jê ew teyrê nîvserjêkirî ye ku bêhtir diêşe û di nav xwîna xwe de diperpîte.

Encama Maneyê: Ez di daf û daba evînê de girêdayî û dil im; tîrê cudayiyê jî li dilê min ketiye û ew qul kiriye, ez jî mîna wî balindeyê nîvserjêkirî di nav xwîna xwe de di hev wertêm û diperpitim.

*Birûska Batînê da dil, di pêtî sine wê wer bû
Ku dê bêtin tebîta dil di nav wê nar û pêtê da*

Encama Maneyê: Birûska nihênî yanî ya manewî ku agirê evînê ye li dil da û ew şewitand; di nav wê pêtiya alava agir de dil kete lertz û cersekê. Vêca di nav wê agir û pêtiyî de wê li ku û çawa hedana dilê reben bê û bitebite.

*Ji ulfê şebhetê zulfê medam lew bêqerar im ez
Ku canê min 'ezîz tro çû yû dil wê di ulfê da*

û dil wê di ulfê da: û dil jî wa ye bi wê evînê ve girêdayî maye, mebest bi gotina "can" ku bêjeyeke kurdî ye, li vê derê beden e neku rûh e, hinek çapên ku ev nîvmalik di wan de "û dil ma di ulfê da" ye - yanî dil di evînê de ma - vê gotina min qewî dikin.²

Encama Maneyê: Ji ber evîne ez jî mîna wê ricf û lerza guliyên dildarê ya ji ber bayê, hertim dilerizim û di cihê xwe de naseqirim (natebitim). Lewra can yanî bedena min ya hêja ji lewazî tine bû û çû, lê dilê min jî hê bi wê evîne ve girêdayî ye û tê de niqo bûye.

*Ji me'hbûb dîr kirim çerxê, felek wê pur hilavêtim
Nizanim dê li ku dît min di vê dewran û çerxê da*

Encama Maneyê: Ger û fetlanên çerxa felekê ez heliqandim hewa, avêtim cihekî pîr bilind û min ji dildara min dîr kir; vêca ez nizanim ew dê di vê dewrana hawîrgêr de min bihelêqê kîja cihê dîr. Yanî dem û dewranê belayên xwe li ser min wisa pîr kiriye ku min ji dildarî dîr xistiye. Încar ez nema dizanim bê di vê gerîneka deryaya pêlên î belakir û bi tifaq de dê çî biqewime û çî bi serê min ve were.

*'Hebîbî bê xeta kuştim bi derba firqetê axir
Ji wê rojê dizanî min ku yar ew tîr li cergê da*

Encama maneyê: Dildarê di dawiyê de ez bêsûc û bêguneh bi derba cihêbûnê kuştim; ji xwe ji wê roja ku wê tîr avêtin cergê min û li kezeba min dan min zaniya ku dê ew min bikuje. Dawiyê wê jî ev yek kir û gihîşte armanca xwe.

Dibe ku mane weha be jî: Ji wê roja ku ew tîrên kujdar li cergê min ketin min fam kir ku tîravêjê me yê nîşangir ku li kezebê dixê, her dildar e. Nexwe kesî din nikare weha baş nîşan bigire û li amanca xwe bixe.

*Gelo dîsa bibînim ez çirayê wesletê hilbit
Bisojim şubhê perwanê di ber wê nûr û şewqê da*

gelo: Ji bo banga giştî ye weke ku mirov bibêje "Ey heval" herweha tê de pîrs û daxwazî jî heye û maneya hêvî û tikayê jî dide.

Encama Maneyê: Ey heval hêviya min ew e ku ez careke din jî bibînim ku

çiraya hevghîştinê raserî min vêketibe û rohnî dabe û ez jî mîna xexxecokê li pêşberî wê rohniya spehî dişewitim; da weku qet nebe hima di halê şewatê de be jî ez bigihîjim diyarî dîtina dildarê.

*Bi der bê kewkeba sub'hê li meşriq zuhre tali' bit
Zu'hel dûr bit bi şeş burcan û wunda bit di xerbê da*

û wunda bit di xerbê da: û piştê jî di hêla rojava de wenda bibe. Ji xwe diyar e ku rêz û tertîba stêran ya bi vî awayî şevê qenc rohnî dike. Ev riste risteya hêvîkariyê ya berî xwe temam dike û maneya wê di xwe de digre, yanî "Ez hêvî dikim ku stêra sibê bibînimt.d"

Encama Maneyê: Ey heval bêguman ez dîsa dixwazim û hêvî dikim ku derketina Stêra Sibê bibînim û herweha ez bibînim ku stêra Gelavêj jî ji rojava ve were der û ya Kîwan jî bi şeş burcan jê dûr bibe û here ber ava û wenda bibe da ku hingê şeva me qenc rohnî bibe.

Mebest jê ew e ku ew dixwaze tarîtiya şevê ku nîşana nexweşiyê ye ji evîndariyê re, rabe û ji dêl ve rohniya ku nîşana xweşiyê û rakirina zehmetiyê ye, dakeve erdê.

*Ji qundus Zuhre peyda bit, ji hindis muşterî bêt der
Spîdî dit Sureyyayê, şefeq dit qametê pê da*

ji qundus Zuhre peyda bit: Qundus jî weke qunduzê tarîtiyeke reş û şeverêş e, yanî ez dixwazim ku Gelavêj jî ji şevtariyê were der

ji hindis muşterî bêt der: Hindis ji 'hindisê hatiye xerab kirin ku ji bo şeva pir tarî tê gotin, yanî ez dixwazim ku stêra Bercîs jî biavêje û tarîtiya şevê rohnî bike.

spîdî dit Sureyyayê: Spîdî ji bo spîtê tê gotin û bi taybetî jî ji bo spîtiya serê sibê tê bikaranîn ku li vê derê jî mebest jê ew e, yanî stêra Perwîn (Pêrw) jî bi-

avêje û rohnîya berê sibê jî bide serê.

şefeq dit qametê: Rohnîya xwe bide ser bejnê yanî Mêzîne ku ew stêrên li pey hev rêzkirî ne, piştî Perwîne (Pêrwê) diavêjin û gelek caran bejna dildarê bi wan tê şibandin

Encama Maneyê: Ez dixwazim bibînim ku stêra Gelavêj di wê tarîtiyê de hilbê û ya Bercîs jî biavêje, herweha spîtiya sibê jî bide ser Perwîne û li pey hilavêtina Pêrwê jî bejn yanî Mêzîn rohnî bibe. Ev jî dîsa hêviya xweşiya rewşê ye piştî belavbûna wê.

*Ji şewqê ebrûwan binmêt hîlal dîsa di qewseyan
Ji xawer bête xurşîdê zelam werbit di nûrê da*

Encama Maneyê: Ez hêvîdar im ku ez careke din bibînim hîv ji teyîsîna rohnîya birûyan di burca kevanî de diyar bibe, qursa rojê ji aliyê rojhilat ve derkeve û tarîti di ronahiyê de wenda bibe. Mebest jê xweşbûna rewşê ye.

*Bî werdan zeyînîn gulşen, çîmen da lale bişkiftin
Binefş û çiçekan vêk ra şefeq da yek di rewde da*

Encama Maneyê: Min di risteyên pêşt de hêvî kiribû ku gulzar bi gulan xemilîne, kulîlkên lale di mêrg û çîmenan de vebûne, herweha binefş, kulîlk û çiçekên din jî di baxçeyan de bijkoj dane û tîrêj avêtine ser hev û din; ji ber vê yekê jî ez hêviya hevghîştîne dikim ku lewra dem jî lê tîne, bihar e, baxçe giş xemilîne û bayê xweşî û şadiyê hûrik hûrik dilive.

*Sehergeh endelîb mest in ji bihna werd û bişkojan
Şubih tûtak û goyînan³ dinalin em di firqê da*

Encama maneyê: Bulbul di berbangê de ji ber bihna gulên bişkojdayî û yê nebişkuvî serxweş û mest in; em jî mîna tûtî û goyîne ji ber derdê cudabûnê her

dinalin û dikin zarezar.

*Li kelbê asîtanê xwo nepirsî qet hebîb carek
Gelo naêne bîrê em di vê nêçîr û ravê da*

Encama Maneyê: Ecêb e ku gelo çima dildar yek carekê jî li wî seyê ber derîzana xwe ku hercar tê re diçe nêçîrê û tê yanî xulamê ber devê deriyê xwe napirse? Xwezî min zanibûna bê çima em jî di dema vê ref û nêçîrê de qet carekê nakevin bîra wî ku hima derbekê jî bi xwe re bibe û bike hevalê xwe, da em bi hevaltiya wî dilşad û bi hevrêyiya wî jî birûmet bibin. Diyar e ku gotinên nêçîr û se pêkve di hevokî de rewani û xweşt didinê.

*Dizanim şehsuwarê min xezalek wê di fitrakê
Bi cayê seyde ez bûma di wê fitrak û bendê da*

fitrak: ben yan jî qayîşa bi avzûm e ku ji bo pêvedanîna tiştên siwar û bi taybetî jî nêçîra ku digre, bi paşiya zîn ve tê girêdan

Encama Maneyê: Ez dizanim ew dildarê min ku di xêşma xwe de mîna ye şahê mêrxasan xezalekê girtiye û avêtiye benê pişt zînê xwe, xwezî di cihê wê nêçîrê de ez bi wê qeyd û bendê ve girêdayî bûma.

*Çi heddê sed hezar can bin di fitraka hebîbê min
Ku sed Cemşîd û Keyxusro xulam in ser devê rê da*

Encama Maneyê: Ka dilêrî û hêza sed hezar kesî jî têr dike ku bibin nêçîra dildarê min û têkevin bendê paş zînê wî? Na xêr ev yek ji hiş dûr e û çênabe jî çiku sed şahên mîna Cemşîd û Keyxusro kole û xizmetkarê ser riya evîndarê min in lê ew qet guh nade wan û li wan jî nafitile, vêca wê çawa berê xwe bide xelkê amî û tamî yên mîna min.

*Di deh salan mulazim mam we yarê rû neda carek
We ger ne, yar eger rû dît heye carek di salê da*

Encama Maneyê: Ez deh salan bendewarî xizmeta dildarê mam lê wê yek carekê jî ruyê xwe nîşanî min neda û guh neda min. Bes ger ew dev ji nefsmeziniya xwe berde û ji dilhişkiya xwe vegere dibe ku salê carekê dîtina xwe ji min re bibexşîne. Di hinek çapan de ji dêlva "heye" "bes e" ye, yanî salê carekê jî dîtina xwe ji min re bexş bike bes e.

*Dilo mizgîn e min şa be ku sultanê me dê bêtin
Ji min bawer ke peyxamê seher mizgîn bi min pê da*

Encama Maneyê: Ey dil mizgîniya xêrê ji te re şad bibe ku dê dildara me ya xwendkarane dê were civatê û me bi dîtina xwe dilxweş bike. Tu ji min bawer be ku ev mizgînî rast e bêguman e, çiku berbangê bi xwe ev nûçe da min. Mebest bi "seher"ê dema xewlenişîniyê ye ku ew hersibe tê de dikeve hizûra Xwedê û difikire. Yanî ey dil ez di dema xewlenişîniyê de ku lêyanbûn û diyarbûna bûyerên xwedahî tê de çêdibin de bi vê yekê hisiyam û mizgînî ji min re hat ku tu şik û guman tê de nîne.

Ev li ser maneya ku gorin "pê da" be, lê ku "peyda" be hingê yanî ev mizgînî rast e çiku di dema seherê de di wextê xewlenişîniyê û ponijandinê de ev ji min re diyar û rohnî bû.

*Şukur bînahiya min hat û Yaqûb dîde rewşen bû
Bi boya Yûsufê Misrî Li Ken'anê beser peyda*

û Yaqûb dîde rewşen bû: Û ronahî hate çavên Yaqûb pêxemberê ku ji kerba kurê wî Yûsuf ava reş pê ve hatibû. Mebest ji Yaqûb li vê derê şair - şanê wî pîroz be - bi xwe ye lê wî rewşa xwe - çawa ku bûyer jî tê zanîn- bi ya Yaqûbê ku kurê wî Yûsuf - aştî li ser be - ji ber wenda bûbû, şibhandiye.

Li ken'anê: yan bi maneya "ew Yaqûbê - aştî li ser - ku ji Welatê Ken'anê

ye" yanî Filistîna niha yan jî bi maneya "li welatê Ken'anê" ye.

li Ken'anê beser peyda: bi bihna Yûsufê Misrî ronahiya çavên Yaqûbê Ken'anî ji nû ve peyda bû û bi paş ve hat, yanî gotina "bi boya" bi ya "peyda"yê ve girêdayî ye. Yan jî bi bihna Yûsufê Misrî li erdê Ken'anê çav bû, yanî digel dûriya wê ji Misrê jî dîsa ew kesê ku li ser axa Ken'anê bû ronahî hate çavên wî.

Encama Maneyê: Spas ji Xwedê re ku ew dildara weke rohnîya çavan hate cem min û pê re bînahiyên min jî lê zivirîn, çawa ku Yaqûbê Ken'anî jî bi hati-na bihna îşilkê Yûsufê Misrî rohnîya çavên wî lê vegeriya. Yan jî bi bihna wî Yûsufê ku li Misrê dima çavên Yaqûbê ku li ser erdê Ken'anê bû, - digel dûriyê jî - bi rohnî bûn.

*Nestîmê sunbul û sêvan seher da hebs û zinadê
Vebû qufla me bê mifte, zirigîntî ji quflê da*

Encama maneyê: Bayê nesîm yê ku ji ber gulang û dêman tê, di berbangê de bihna xwe bi ser girtîyan ve berda û ji ber vê yekê jî qefla deriyê zindana me bê mifte vebû û çingîniyeke bilind jê hat. Yanî dema bayê qencî û dilovaniyê ji ali-yê dildarê rastî ve gihîşte evîndarên dîlgirtî yên zindana evînê, hişkegirêka me bê cewer (wasîte) û bê xebat vebû, dengê wê li her deverî belav bû û herkes pê hisiya.

*Fîraqê, şev bi axir çû, spêde kifşî bû dîsa
Merîxa nehsî ava bû xuya bû roj di şerqê da*

Encama Maneyê: Ey cudahî vêca ji min dût bikeve, çiku şeva cihêbûna ji dil-darfî ber bi dawî ve hat û rohnîya şeveqa rastî careke din derket û wextê hev-gihîştinê nêzik bû. Stêra Behram ya nehs çû ava çawa ku dema tede û xemgîniyê li paş ma û qursa rojê bi rohnîya xwe ve ji hêla rojhîlar ve derket û hilkişiya. Ya-nî rewşa me ya zor ku di tarîtiya cudahî û dûriyê de bû, bi rewşeke xweş î spehî û bi rohnîya hev-gihîştin û hizkirinê hate guhertin. Vêca ey cihêtî tu ji min dût

bikeve, êdî dema te çû, rojên te qedîyan, êş û elem rabûn û hêsayîbûn û dilpa-kiyê cihên wan girtin.

*Di çerxê wek nicûm dêmdur, sema hatin qîranayek
Heyîva bedrê bû ew surperî min dî di reqsê da*

Encama Maneyê: Ew periyên dêmdurr yanî ku ruyên wan weke durran paqij û spî ne, mîna stêrên geş bi govendgêrî pêkve ketin himber hev û hatin rêz û gera dîlanê. Min ew dildara ku delalî û dilrubayîya wê weke ya periyên bû, di govendê de mîna hîva çardeşevî di nav stêran de dît.

*Ji wadyê Eymenê dilber, nizam engûstek îzhar kir
Ku xweş enwar û berq in ew tecella bûn di Tûrê da*

Encama Maneyê: Ez qenc nizanim bê gelo ne ku dildarê tiliyek ji yên xwe ji aliyê wê navçeya pîroz newala Eymenê ve derxistiye yan jî sedemekî din e ku gelek tîrêj û birûskên pir spehî di çiyayê Tûr û Sînayê yê hizkiri de avêtine û gerdûnê hemî rohnî kirine. Ji xwe ev yek jî diyar dike ku evîndarê tiliyeke xwe ji hêla newala Eymenê ve derxistiye. Di vê malikê de serpêhatiya Mûsa - aşîfî lê be - [ku li çiyayê Tûr û Sînayê bi nûra Xwedê re peyivîye] tê diyar kirin.

*Qîrana Zuhreyê min dî di ber 'iqda Sureyyayê
Ji Perwînan dibêjim eks e hêj keftî di camê da*

Encama Maneyê: Min dît ku stêra Gelavêj li pêşberî stêra Perwînê ya weke gerdeniyekê hate himber stêreke din û ez hizir dikim ku teyisîna tîrêja di nav wê piyaleya şerabê de jî ku niha wê rohnî dike tîrêja wê Perwîna li hemberî wê bi xwe ye.

*Hebîbî 'ezmî subbet kir di caman lew şerab anî
Dilê min dî du seyyadan ji buryan ra berî wê da*

Hebîbî ezmî suhbet kir: Dildarî qesta civat û suhbeta muzîkê ya xas kir, di Kurdî de ev bêjeya "suhbet" ji bo wê civat û demsaziya taybetî tê gotin.

Encama Maneyê: Evîndarî xwest ku civateke demsazî ya mûzîkê saz bike û ji vê bonê jî peyaleyan ji cureyên şerabê yên zîndewer tije kir û kişand li ser sifreyê rêzkir. Hingê du nêçîrvanan ku çavên dildarê ne dilê min dîtî û ew pê hisandî da weku wî bigire, bibirijîne bike parêv û deyne ser sifreya şerabê. Ji xwe adetê wan yê hercar e ku ji bo madê wan hê bêhtir li vexwarinê vebe û bi dilxweşî lê bidomînin, hertim goştê biraştî datînin ber şeraba xwe.

*Bi tûlên asîtanî ra vexwendim mîr bi dergahî
Bi vê çavî hebîb dîtîm, şukur ev şefqe Mewlê da*

Encama Maneyê: Dildarê ku di femandariyê de weke Mîran e, careke din ez vexwendim dergahê xwe yê mezin; yanî qencî bi min re kir û bi tûleyê ber derîzana xwe re destûra hizûra cem xwe da min û min bi wî çavê xwe ew dildar dît û ez bi hizûra wî payedar bûm. Minêkarî û spasî her ji wî Xwedayê pak re be ku bes wî û ne kesî din ev dilovanî û ev qencî bi min re kir. Nexwe ev qencî û camêrî her ya wî ye û ne ya kesî din.

*Ji şeklê ebruyên saqî hilatin sed hîlal îro
Weh bedrek min muqabil dî, îşaret min ji 'eksê da*

Encama Maneyê: Ji ber awa û wêneyên birûyên badegêr ku weke kevanekê hîva nûavêtî ne, îro sed heb hîvên dasûkî hilkişîyan. Herweha min li hember wan hîvikan hîveke çardeşevî ku mebest jê rûyê dildarî ye, dît û ji ber teyisandîna ji wêneyên wan birûyan li ser hîva çardeşevî ya zelal î rohnî nîşane bo min hatin dayin.

*Bi zehrê xwoy şerîf xwendim ku xidmetkarê dêrîn î
Te purr cewr û cefa dîne di sulûk û se'y û cehdê da*

Bi zehrê xwoy şerîf xwendim: Di hinek çapan de weha ye: "Bi zarê xwey şêrîn xwendim" yanî wî bi dev û zimanê xwe yê şêrîn û pîroz ez gazî kirim.

Encama Maneyê: Dildarî bi zarê xwe yê şêrîn gazî min kir û got tu xizmetkarê me yê kevn î, te di dema xewleneşîniyê û di cehd û xebata xwe ya di riya evdîtî û evînê de gelek zorî û tade dîtiye ta ku dilovanî û mihrîvaniyê heq kiriye û ji ber vê jî em baştirîn qencyê bi te dikin û te dibin hizûra xwe cihê bilind.

*Biçîn werdan ji gulzarên ku exyaran bi dest xar in
Ji mexsûsanê dergahî du 'am in ew di hecrê da*

Encama Maneyê: Ey Mela fermo ji baxçeyên gulên wan biçîne û bide hev; were bi qencyên dildarî şa bibe, ji xwe bi evîndarên din re ji wî baxçeyî ji dirîkên gulên pêve tişteki din tine û bi tenê tade û dilêş gihîştîye wan. Herweha gelek ji kesên tayberî yên ku li ber dergahê me demeke derêj bi qasî du salan rawestiyane û xizmet kirine jî dîsa ew di nav tade û zehmetiya cudahî û dûrbûna ji me de mane û me bi qasî nêrîneke baş jî li wan fenekiriye. Ji xwe me wî rûyê xêrdîna ji qencyên qet nedaye wan û ew nebûne payedarê gihîştina cem me.

*Bi Teşrîfa xwe ez xwendim, ji lutfê bende nîşan kir
Xelat û şefqe û dildan şukurxwaz in ku ba Xwedê da*

ku ba Xwedê da: Xwê ji "Xwedê" hatiye kinkirin, yanî em minêkar in ji ber ku ew xelat, dilovanî û dilşadî ji ba Xwedê ve ne, ne ji cem kesî din.

Encama Mneyê: Dildarî bi rêzdarî û qencîkariya xwe gazî min kir, ez birim hizûra xwe û ev beniyê xwe bi nîşanên giranbiha payedar kir. Ev xelat û dilovanî û dilxweşiya han ne ku ji ber kar û xizmeta ku kiribû lê qencyeke ji cem ji Xwedê ve bû. Em ji Xwedê re şêkir dikin û daxwaziya zêdekirina şukrê jê dikin çiku yê ku dide yekî û yê qencyê pê dike her Xwedê ye ne kesî din.

*Mi hadir secdeya şukrê li wî erdê muqeddes bir
Bi mujganên xwe durr sufi in, enî malî li erdê da³*

Encama Maneyê: Piştî ku dildrî ez vexwendim cem xwe - çawa min di malîkên pêşî de jî got - min hima li wê derê di hizûra wê de li ber derçika devê deriyê wê li ser wî erdê pîroz hahakê bi lez secdeya şukrê bir û min bi bijangên xwe mirarî (durr) û sedef (lu'lu') qul kirin. Yanî ez wisa giriyam ta ku stêrên çavên min pîrr herikîn û bijangên min bûn weke benê ristekirina mirarî (durr) û sedefan. Min ew erd û ew derîzan bi eniya xwe sivnik kir û hem ji bo nefspiçûkî û hem jî ji ber kêf û şadiyê û minêkariya ji bo wê qenciya hêja min eniya xwe di axa wê derîzanê de hesikand.

*Heya bînahiya çavan, but û 'Uzza yû Latê min
Tu yê pêşber sucûda min sehergahan di xelwê da*

Encama Maneyê: Ey dildarê ku tu weke rohiya çavên min î û weke sene-man perestiyê min î. Yê ku ji seneman re îbadetê dike çawa xwe jê re ditewîne ez jî ji mezinatiya te re wisa xwe ditewînim. Yê ku ez di serê sibehan de jê re diçim sucdeyê her tu yî û qîble û berîgeha min di perestînê de, di xelwetnişînê de her tu yî ne kesî din.

*Li bal 'ilmê te me'lûm e, ji jînê min tu meqsûd î
Fîdayê can me dê can bit, di qesta wesl û dînê da*

Encama Maneyê: Ji xwe li cem zanîna te ya herheyî diyar e ku mebesta rastî ji jiyana me ya li vê cîhanê her tu yî û şabûna bi dîtina te ye; di dema daxwaziya dîtîna û gihîştîna de jî dê bes canê me bibe goriyê canê dildarî. Yan jî: ji xwe li nik zanîna te diyar e ku mebesta me bi domandina jiyânê û parastina wê ew e ku em canê xwe bikin goriyê canê te, çiku can bes ji can re dibe qurban.

*Bi husna xwo Îlahî kî, bi sehm û heybetê dînê
Nîcîm û kewkebê lami' ji bala tîn bi bejnê da*

Encama Maneyê: Ey Xwedayê min tu bi xatirê rindî û spehîtiya xwe kî, bi xatirê tirs û saw û heybeta dema dîtina dildarî kî, yanî bi wê bizd û bihta ku li nik dîtina dildarî ya ji nedî ve çêdibe, kî. Herweha dîsa tu bi xatirê wan xişrên ku weke stêrên tîrêjdayî û çirîsî ji jor heya jêr bejna evîndarî dixemilînin, kî. Çawa ku me got, bersîva van hêviyan piştre tê.

*Bi xalên werd û nesrînan ji qudret xet kişandî lê
Bi terha nêrgîza êlî sehergahan nesîm lê da*

Encama Maneyê: Tu bi xatirê wan xalên ser gurçikên rûyê yarê yên ku weke gula sor in û yên ser dêmên yarê ku weke nesrîna spî ne bikî; ewên ku ji karîn û şiyana Xwedê xet û xalên curbicur lê hatine kişandin, yan jî gulangên şînbûyî lê hatine rêzkirin. Dîsa tu bi xatirê wê bejna ku weke şaxê nêrgîza çikbilind e û bayê nesîm yê hênîk serê sibeyan hurik hûrik ji nerm ve lê dixe û rast û çep hêdî hadî wê dibe û tîne, kî.

*Ku tûlê asîtanî dûr nekî êdî ji dergahî
Ji ba Xwoy vê ricû nakin, di babê lutf û rehme da*

Kurtetemane: Em hêvî dikin ku tu tûleyê ber derîzana xwe ji dergahê xwe yê mezin bi dûr nexî. Em vê ne ku ji Xwedê dixwazin, lê belkî ew ji xwe dikeve ber beşa qencî û mihrîvaniya wî.

Encama Maneyê: Em bi zatê Te ji Te hêvî û tewqê dikin ku ji niha û pê de tu tûleyê ber derîzana xwe ji dergahê xwe yanî ji ber xizmeta xwe dûr nekî. Ev hêvî û tewqeya me ne ku haşa bi armanca ferman û daxwaza ji zatê wî ye, lê belkî bi mebesta hêviyê ji qenciya wî ya zahf û mihrîvaniya wî ya berfireh e.

*Tu narê firqetê zanî dikarim ez tehemmul kim?
Diyarê kohê Qendîlê im, meger fil im di 'îşqê da'*

kohê Qendîl: çiyayê Qendîl, çiyeykî welatê kurdan e ku li ser serê wî alava

agir heyê.

Kurtemane: Ma qê tu dizanî ku ez dikarim agirê cudamayîné ragirim? Ma gelo ez serkuma çiyayê Qendîl im yan jî ez filê evînê me? Ev maneya han li gor çapa "dikarim be, lê ku "nikarim" be hingê weha ye: Tu dizanî ku ez nikarim xwe li ber van ragirim.

Encama Maneyê: Ey dildarê min ma qê tu dizanî ku ez dikarim bi agirê cudahiyê bişewitim û xwe li ber ragirim jî? Na, bêguman tu dizanî ku ez nikarim. Ma qê ez bûme serkuma çiyayê Qendîlê ku timî agir li ser min bişixule û ez karibim wî ragirim; yan jî qê ez weke wî heywanê mezin fil bi qewet im ku karibim tade û zehmetiya evîn û dildariyê ragirim?

Min vê risteyê bi vî awayê ku me nivîsiye ji hinek çapên şaş î nelihvhatî û ne rast ku bêje û maneyên wan hev nedigirtin da hev li hev rast kir û bi vî teherî nivîstî û li hev anî, lê Xwedê çêtir dizane.

*Zehî Derdê mezin firqet, ceger sot ateşî da dil
Cihê sebrê nema çendan ferec min dî di sebrê da*

Kurtemane: Çi ecêb derdê mezin cudahî ye ku cergê me şewitandiyê û agirê wê avêtiye dil; çendî ez dizanim ku sebir fereca xêrê ye jî lê ti çare û cihê aramiyê nemaye.

Encama Maneyê: Ez pir ecêbmayî dimînim li wê êşa giran ku cudahî ye, bê çawa bi agirê xwe kezêbê şewitandiyê û keleşewata xwe gihîstandiyê heyânî dil. Çendî ku ez ji ber tecrûbe û serpêhatiyên xwe dizanim ku sebir fereca xêrê ye û piştî her tengasiyekê firehiyek tê jî, lê dîsa ti çare û mukûna sebr û aramiyê jî li cem min nemaye.

*Mela bêqameta yekta qiyamet min bi çehvan dî
Fîraqê rûsiya bin, te ji min canê şêrîn çê da*

Kurtemane: Ey Mela dema ku ez ji bejna rast î çikbilind dûr mabûm, min bi çavê serê xwe rabûna qiyametê dît; wey cudahî Xwedê rûyê te reş ke ku te ez ji canê şêrîn veqerandim.

Encama Maneyê: Ew bi lomedarî ji xwe re dibêje: "Ey Mela ji ber dûrî û ci-hêmayîna ji wî dildarê ku bejna wî weke şiveke yekta çik rast û narîn e, min rabûna qiyametê bi çavê serê xwe dît; yanî tade û ezyetê ku min ji ber vê dûrma-yînê dît weke yên roja qiyametê bûn. Wey cihêtî rûyê te li hember mirovan reş be ku te ez ji canê min yê şêrîn yanî wî dildrê ku fena rihê min şêrîn e, veqetan-dim û te ew ji min dûr kir ta ku ev êş û tadeyî hate serê min. Yan jî te rihê min yê şêrîn ji min dûr kir, bê weku te ji ber dûrîya ji dildarî ez kuştim û rihê min derxist.

Wergera ji erebî: **EMÎN NAROZÎ**

1. Ev berdewama şiroveya Mele Ehmedê Zivingî ya li ser Dîwana Melayê Cizîrî ye ku berê hinek beşên wê di kovara Nûdemê de hatibûn weşandin.
2. Ya rastî ez bi xwe tê negihîştim bê ka çawa gotina wî bi vê nêrvisteyê tê xurt kirin.
3. Tûtak û goyîn du teyr in ku di çîyan de bi şev heya sibê dinalin û yê pêşî dibêje "tû tû tû", û yê din jî dibêje: "hum, hum, hum"
4. Mela li vê derê bi bal vê ayeta Quranê ve îşaret dîke: "Ger min evê Quran şandibûya ser çîya-yekî jî te dê bidîta ku ew ji tîrsa Xwedê xwe nizim dîke û serê xwe ditewîne" - E. N.]
5. Di çapa Seydayê Hejar de ev rêz weha ye: "Dibarî kohê Qendîl im bîla qîl im di 'îşqê da". Bi-nêre Hejar, Şerha Dîwana Melayê Cizîrî, Sirtûş, Tehran, 1361, çap 1, 1.

Çûka zer



EVÎN AYDAR

Çûka zer
Tu dixwînê û dixwînê
Qey cî tunebû?
Hatî ser rayê ser serê min disekinê
Ez dibêjim te jî fehm kir
Tu xerîbê û bêkesiya min dibînê
Hêlîna te
Bêmalîya min
Azadiya te
Girtîbûna min
Şahiya te
Xemgîniya min
Dortîjbûna te
Tenêbûna min
Bêmineriya te
Alîkarî hêvîkirina min
Xwedîbûna çêlikên te yên azad
Bê xwarinmana berxên min
Çûka zer tu çiqas dixwazî bifirî û bixwînê
Bila li dinê koçberî nemîne
Bê malî bê wariya min dilê min dêşîne
Bexê ber dilê min dengê te bihîst
Hêlekê ve serê xwe hêdî hêdî ezman re zîvirand
Hêla din ve paçikên xwe yên şilbûyî bi herdu destên xwe digire
Here here kêfxweşiya te bala wî jî dikişîne
Dibêje
"Dayê, xwezî ez jî wek wan çûkan azad bûma
Min ê welat gund bi gund tev bida"

Gundê Nûava

QEDRÎ CAN

A vên herikî, bax û baxç... di nav van baxçeyan de hertexlît darên bi ber, li ser van daran ji hercinsî çivîk pevdîçin û bi herzimanî dixwînin! Ji van çivîkan a ku kezeba min dişewitîne û hundir li min dipericîne; şalûl e. Bejin û xwendina wê ruhniya çavê min û qînata dilê min e.

Gundê me di nav van rezan ji panzdeh malan hevdudanî ye; wargeê [wergêhê] me, mezela civata gundê me ye. Paşivan li ser wergêh, naveraojan di nav mêrga rezê me de em, dicivin. Pirs û galgalên me teva pev xweş in...

Kula welat çima holê giran û ji bîr nabe? Heta niho me digot: Em bê der û poxan in, ji lewra hergav birînên me diaxivin û ji hesreta erdê bav û kalan em dîn dibin vêca me çi divê? Gund gundê me, bexçe û baxên me. Tekûz e; hertişt, hertiştê me!

Ma qê wusan e? Carekê werin, hundurê min verojin dilê min jê derînin û bi kêreke tûj çînî çînî bikin, wê gavê ev çîniyên dilê min ewê bêne peyivîn û pê ra bêne girîn. Lê dizanim hûn xwe nagirin hêstirê çavên we, ewê çemê Amediyê derbas bike. Şûnda hûnê bizanin ku ez, ne tenê dilketiyê xweşikiya şalûlî me. Ez dilketiyê dengê wê me jî ku jîyina me ya der li der di nav nikilên xwe da tewtew dike û bi vê dawî kilamê dawî tîne.

– Xweyî bin li Gundê Nûava! Gundê we; mizgîn û hawara bajarê we!!

HAWAR, hejmar 2, 1932



QEDRİ CAN

CUHABA DAYIKÊ

Ji nûxuriyê xwe Qedrî Can re

Qedrî Qedrî canê min
Kurikê min çavê min
Nivîsara te giha
Xweşmeqam û pîrr biha
Herê zîz e bi kul e
Xweş bihn e ew sorgul e
Hem deng e hem laje ye
Xweşkelam e bêje ye
Silav e hem pergî ye
Peyamek ji rêwî ye
Bexikê min dikalî
Li maka xwe dinalî
Ji dayikê dûr ketî
Nalîna te kûr ketî
Belê nûza newzar î
Lê dikevî terad î
Şehlewend î siwar î
Xortê min î li kar î
Herçend dûr î û çûyî
Nûxuriyê min lê tu yî
Naçit ji bîr nûxurî
Bi kurên din û neví.
Dilê xwe her xweş bike
Bihnúna xwe geş bike
Ji paşîla dê derketî
Nav birakên xwe tu ketî
Tu ketî nav birazan
Eşîreke pozberan

Êlek e ev gelek kevn
Xudan rêzik xudan tevn
Li Sirûcê serhedan
Peyda dibin li Îran
Xweş civat in di mekş in
Di şerî de şûrkeş in
Birazî ne biraz in
Wek xezalan dibezin
Eşîreke sîng bi pîrç
ku mezin bûn dibin "hirç"
Spehî, çeleng û boz in
Henîbilind bi poz in
Hin pîrsên wan bibehîn
Xweş meqam e Mem û Zîn
Ferhenga xwe bike pîrr
Lê mebêje "Yazmîş kir"
"Gorûşmîş bûn" ji hebe
Tu eva ha çet mebe
Hêştir dibên deve here
Ev pîrseke kevnar e
Kurdmanciyeke xwerû ye
Şukrê meke gezo ye
Bi xatrê te kurê min
Bi te ve ye dilê min

HAWAR, hejmar 18, 1933

HAWAR

Xewna hişyariyê

QEDRÎ CAN

Ax welato ax welato
Roja me zû lê hileto
Bav û birên me çawan in
Çima xeber jê nehato

Îşev min dît xewnek bi tirs
Tu keremke ji min bipirs
Ez carekê dest pê bikim
Da tu bibîn çiqas bi hirs

Bayekî reş hate ji jor
Li ser min kire borebor
Bi girîn da kaxizek sor
Di nav hebûn du tayên por

Ez çûme cem pîrek zeman
Min got: Falekê vekî eman
Min daye der tev ruh û can
Derdê min re bibê derman

Pîrê bo min rabû ser xwe
Piyana avê da ber xwe
Li avê xwend li min nêrî
Dîsa serê xwe da ber xwe

Kaxiz bi xwîna beran bû
Herdu ta porên xwehan bû
Mana wan kûr û giran bû
Ji fala pîrê nihan bû

Birayên me têne kuştin
Bi xwînên xwe têne şuştin
Xwehan porê xwe şandine
Yanî "çima hûn rûniştine"

Îro laşê pir diêşe
Qenc dizanim ji çi dêşe
Lê çi bikim derman nîne
Tali' tune bextê reş e

Dermanê ku ez keşf dikim
Bi heyvîna xwe geş dikim
Ji dilbirînên wek xwe re
Pelên Hawarê reş dikim

Qedrî bibêje û binale
Şinê girêde bikale
Namûs nema, rûmet nema
Ev çi derd û ev çi hal e



QEDRI CAN

Şîna xalê min

QEDRÎ CAN

Kurê Hecî Osman Axayê Reşoyê Dêrikî Îlyas Efendî di hezîrana 1933an de li Amûda Binxetê wefat kiribû û hingê bi hinceta wefata wî di hejmarên Hawarê yên 21 û 22an de bi îmzeyên kovara Hawarê, xwediyê wê Celadet Alî Bedîr-Xan, Cegerxwîn û Qedrî Can rehmêtî hatibû bibîranîn û gelek gotinên bi pesin ji bo wî hatibûn gotin. Ji ber girîngiya şexsiyeta Îlyas Efendî ya dîrokî em vê nivîsa Qedrî Can careke din diweşînin.

NÛDEM

Di sisiyê hezîranê de, li ezmanê kurdan, tofanek ecêb qewimî; histêrkek pir bi şewq û pir bi nûr ji nişka ve rijiya, xeyidî, xwe da riya dinyake din û nehat!

Ji ber vî halî ye ku îro li dinya me ronahî kêr, hizn û melal zêdetir bûye; ehlê dinya kurdan – nemaze rewşendarê ji rewşa wê hêstêrikê – kezebbîrîn û dilbixwîn mane. Yek jê ez im; baxê giyanê min mij û xumama şînê giritye; hundurê min ji xem û xeyalan can bi can zebûn û birîndar e. Gelo çi bû? Ma hîn dê çi bibê! Xalê min, welatiyê min, mamosta û rêberê min destê xwe ji me qetand û ket bin axa reş û sar. Hey wax! Hey wax!

Xalê min ji bavan de xismê min bû; lê roja ku ez agahê çêyî û xirabiyê bûm ew bû dostê min. Ji lewra ku mîletperwerekî hêja bû. Tirsna bav û birê min, riya min li ser mala wî nebiri, Tehdîdê mirovê min stewart man, min bi rûhê xwe ve ew diparast. Wî jî bi dilê xwe ve ji min hizdikir.

Gelo ji bo çi welatê xwe yê bihuştîn terk kir, dest ji xanûman û şaneşînê xwe kir û hat li van çol û çepelan derbider geriya? Wî bi xwe ev pirs ji xwe nekiribû. 'Işqa mîletî hertişt li ber wî bêqîmet kiribû. Hatibû xebata welatê xwe tola kuştîyê mîletê xwe. Heyhat! Xwedê pê re ne bir serî, pêta agirê hundurê wî ew kuşt, mirazê wî bi

wî re çû gornê. No! No! ne mirazê wî ne ew bi xwe jî neçûne gornê. Mirazê wî mirazê me, mirazê gişkan bû. Ji lewra bi me re di me de dijî û heta roja paşîn jî dê bi-jî. Bi xwe jî neçûye gornê. Ji ber ku herçî di rêya miletê xwe de dimirin laşê wan bi-keve erdê jî giyanê wan ber bi ezmanan ve bilind dibin û ew bi xwe di dilên welati-yên xwe de dijîn.

Efendî di lawaniya xwe de kurdperwer bû. Di mutarekê de civata kurdî li Dêrikê eşkere vekiribû, ew bi xwe serwerê civatê, ji heralî libat (e'za) civandin. Pîrî jêhatî bû, hêj bîst û çar pênc salî bû, bû serekê du sê eşîran. Memûrê tirkî di destê xwe da dida lîstin. Di şerê Şêx Seîdê rehmetî de çiqas beg û axayên welatê me û nêzingê me hene bi peyaên xwe ve çûne himberî Şêx. Lê Efendî ne çû. Bi ser da bi çend pe-yaê xwe ve derket çiyayê mazî. Ajot ser qereqola gundê Şewasê. Esker û cebxana wan dîl girt. Gava şehîdê şêrîn Kemal Fewzî Beg hate girtin Efendî bihîst ku ew ê Kemal Fewzî Beg di riya Sêwregê de bibin Anadolê. Ji ber bihîstina vê xeberê bira-yê xwe Salih Beg (ew jî bû şehîdê miletê xwe) bi çend peyan ve şande ser riya Sêw-regê ku Kemal Fewzî Beg ji destê neyaran bi derxîne. Lê sed heyf di riya Xarpêtê şandibûn.

Di pey şikestina Şêx de serwerê delal jî birin berpirsiyariya Îstîqlalê. Lê Xwedê ji wê afatê xelas kir. Şûn da sorgonê Anadolê kirin. Li wê jî rahet nedisekinî; hevalê xwe yê nezan îqaz û îrşad dîkir, bi hevalên zana re civat çêdikir. Ji lewra li ciyekî sekna wî tine bû, du rojan li ciyekî nedima. Bi dereke din ve dişandin.

Piştî efwê dîsa hat welatê xwe, xort li dora xwe civandin. Bi civata mezin re mu-xabere kir, ji xortên dora wî yek jê ez bûm. Tiştêkî ji me veşartî tunebû. Gava ku hate Sûriyê xeber da min û çend hevalan. Lê herwekî Hawarê nivîsandiye Xwedê ji tu wan re li hev du neanî.


Berê wî bi jêr ve rast kirin, piştî hatina wî zarokê wî jî canê xwe xelas kirin. Lê di feqîrî û zelûliyê de.

Salek neçû min jî da dû; me li Hisîçê hev du dît ji ber ku biraziyekî wî mamekî me kuştibû, navbera me piçekî sar bû. Lê dihat ser kurdîtiyê ji berê germtir bû.

Efendî bêguman hêja bû. Hevalê wî kêm têne dîtin. Ji bo vê wefata hezîn şîn û girî, reşgirêdan li her kurdê xwedan rûmet dikeve. Xwedê rehma xwe lê bike me jî bi rehma wî şabike. □

HAWAR, hejmar 22, 1933

Me bi siya xwe germ bike!...



MERVANÊ KELEŞ

Dîrokê:- ez hê gedayê çavgirtîka te me
mîkur were li min - min neparêze-
ne nuxumîne

firo

û

şîrê diya min

Dîrokê:

-goştê nerîna me ter û taze bû dema te
lapoşkên xwe lê rapêçan-
mîkur were

li kunciyên bejî

ku me li ser piyên xwe

kedî kirin

li bermayên nîvemirî

li şûrê li ser gerdana min

paldayî

li rima di mertalê kezeba
min de
rûniştî
dîrokê!

Bi "islem teslem" re
Bi Silcoq û Osman re
pêkerên xwînê li derdora te danişandin
bi zimanê xwe pênişên te livandin
pirtûkên te bi lehiya reşnivîsên xwe
kesidandin
devê te bi gotinên xwe peyivandin!

ME bide nasîn bi xwe -bi te -
dîrokê

nede alî çavên xwey kor
ji kevneşopên werzên me
ji bronzê hewara me
deriyên xwe yên hilhilî
li ber
şabaşên
me
negre!

TE em bi sindikê aramê
xwedî kirin
te em li nav destarên cengan
bi firê xistin
te em li ber sînga siwaran
mezin kirin
ma te ji bîr kir
tofana hovîtiya
ku li ser genimê
hişê
me
mexel bûye
dîrokê!

DÎROKÊ...

pistepista wan ji çîroka me bikşîn
çavsoniya wan ji bêgunehiya me bikşîn
zikreşiya wan ji pakvaniya me bikşîn
bikşîn!

EM: "ne zarokên vê axê ne"
em: "sêwlekên bê bav û nenas in"
Heyranê dayê...

navên xwe li me dikin
rengên me ji me dikin
giya û kulîlkên çiyayên me
li xwe dikin!

MIKUR be
bêbextê
dîrokê

Em ne ew in
em ne ew in
em ûcaxên vê ziyaretê ne
em keda vê av û xakê ne
em bêhnvedana vî bayî ne
mikur be
dîrokê

mikur be
li wan
mikur be
li reşreşkên
bê dîrok
dîrokê!!!

Uppsala, 2000-01-10

Qeweta me di yekîtiya mîlet de ye



ASLİKA QADIR

Roj baş redaksiyona Nûdemê,

Di hejmara we ya 31ê de hevpeyvîna min tev birêz Medenî Ferho ronahî dîtibû. Vê carê ez bi xwe dixwazim bi kovara we re hinekî xeber bi-

dim, fikir û ramanên xwe li ser çend tiştan bibêjim.

Ez jineke hunermend im, lê belê tecrubeya min ya siyasî jî ne hindik e. Gava ez bibêjim ku ez di Kongreya Partiya Komunîst ya Ermenîstanê ya 29an de wek delegat hatim hîlbijartin û bûm endamê parlamentoya Ermenîstanê, ji nişkê ve nefikirin ku ez dixwazim xwe bi paye bikim û pesnê xwe bidim. Na, ez vî tiştî dibêjim, ji ber ku gava peyv ji siyasîyê vedibe, gelek kes dibêjin "hûn hunermend in, xwe nekin nava vî karî".

Helbet, ji bo ku mirov siyaseta li hemberî kurdan û siyaseta partiyên kurdan nas bike, hewce nake ku mirov pir zane be. Her kes jî dizane ku şerê birakujîyê sûcek e û kes nikare wî şerî durust û biheq derxe. Kî zane, ku polîtîka dewletên "mezî" di derheqa Kurdistanê de tim tade, şêlandin û qirkirin bûye. Dijmin ji her alî ve kaniyên maldariya gelê kurd talan kirine û welat seranser wêran kiriye. Ev jî bûye sebebeke şûndemayînî ya aborî, civakî, polîtîkî û çanda Kurdistanê.

Gelo çima miletê kurd nikare bi ser bikeve? Mirov mecbûr dimîne ku li ser vê yekê bifikire.

Em dibêjin dijmin biazil û bi qewet e, loma. Em dibêjin, na, em negihîştine û sist in. Heta niha yekîtiya me tune ye û heta yekîti çênebe em ê di nav dest û lingên dijminan de winda bibin. Rastî ev e, tu bixwazî nexwazî tu mecbûr î qebûl bikî.

Qeweta me di yekîtiya millet de ye

Di cihê xwe de ku bibêjim ku dema serihildanên Şêx Seîd, Şêx Mehmûd, Mustefa Barzanî, Qazî Mehemed, tu partî tunebûn, kurd yekdest bûn, şoreş bi navê hemû kurdan dikirin û millet jî bê cudatî li dû wan diçûn. Lê gava partî çêbûn, dijminan listikên qirêj li ser kurdan çêkirin ew jî hev cuda kirin û kirin dijminên hev. Kurd miletekî qehreman e, dilsoz û xweşbawer e, lê van partiyên siyasî û serokên wan serê millet tevlihev kirine û bi rastî gelê bextreş nizane xwe bi kîjanî bigire, bi dû kîjanî de here, kîjan rast e, kîjan neheq e.

Ez dibêjim gumana niha başurê Kurdistanê ye, lê telebextan re, tu garantî tune ye ku sibehê ji bo elokekê ranebin hev (tecrube heye). Niha jî, her partiyek eskerê xwe heye û eger qewetên wan jî têrê nakin, ne problem e, yan Sedamê bê alîkariyê, yan Îran, yan jî Turkiye. Çawa mezinê ermeniyên gotiye: "De were û dîn nebe".

Partiyên siyasî ne bes xwe xerab kirine, bi ser de hunermend jî xerab kirine. Me-sele kî di Medya-TV de derkeve, nikare di Kurdistan-TV de derkeve, kî di Kurd-SATê de beşdar bibe, nikare di yên mayîn de beşdar bibe. Eh, wê hunermend serê xwe li kîjan dîwarî bixîne?

Hunermend malê gel e, ne malê partiyên e. Hunermend qehremanên miletan in, hebûna miletan in. Ji bîr nekin, ku stranên me em gihandine van rojan. Miletê kurd jiyana xwe kiriye huner û hunermendên mezin wek M. Arîfê Cizrawî, Hesenê Cizrawî, Meyrem Xan, Nesrîn Şîrwan, Şeroyê Biro, Mehemed Şêxo, Karapêtê Xaço, Memoyê Silo, Eyşe Şan, Zadîna Şekir û gelekên mayîn bi dengên xwe yên bi hêz û dilovaniyê jiyên dane millet, derdê millet sivik kirine û bûne dermanê berxwedanê.

Ev hunermendên layiq, bi taybetî yên jin, gelek ezmonên tel û teng derbas kirine. Ewana şexs in ku qanûnên kevneperestî û paştmayînê bînpê kirine û bi karên xwe jî civaka zemanê xwe bilindtir sekinîne. Loma jî civakê di wexê xwe de qîmet nedaye wan, ew xerîb û ecêb dîtine. Ez dibêjim ew şoreşger û qehremanên zemanê xwe ne. Şoreşger in, ji ber ku ji milyonan yek in, lê bi milyonan millet li dû xwe di-

bin. Ez dibêjim divê navên wan bi tîpên zêrîn werin nivîsandin û hêkelên wan werin danîn.

Gelo kîjan platforma kurdî, yan jî komeleya kurd dikare fêdeya hunermendekî, ku min navên wan li jor dan, bide? Hunermend li ser navê millet ticaretê nakin, wan xwe ji dil dane hunera xwe û milletê xwe û li benda tiştêkî ne. Van gişan jiyana xwe di tehlî û zehmetiyê de derbas kirine. Dengê radyoya Bexdayê digihîşt Yêrêvanê jî. Kurdên Ermenîstanê bi dengê hunermendên mezin kubar dibûn, lê di stranên wan de zulm û sitem, çewisandin û bextreşiya gelê kurd û herweha gunehê ku di dîrokê de di derheqa netewa kurd de hatiye kirin, didîtin û pê diêşyan.

Gelo ji bo xebarkarên radyoyay Yêrêvanê, yên para kurdî, di salên 1962-63an de çêkirina strana "Welatê me Kurdistan e" tiştêkî hêsa bû? Ez dibêjim ne tenê ne hêsa bû, belkî xeter bû jî, çimkî xebera "Kurdistan" wek bombeyekê bû, heta ji bo ermenan jî. Lê şoreşa başurê Kurdistanê bi serokatiya Mustefa Berzanî hewqas ew dilxweş û hûr kiribûn, ku her xeter û nexweşî dane ber çavan û kilama "Welatê me Kurdistan e" bi dizî kirin nav 18 stranên folklorî û bi komekê ve, ku ji Moskovayê hatibûn stranên kurdî bisecilînin, ew jî secilandin. En 19 stran çûn Moskovayê û piştî du mehan para veşeriyar û mekanîkî ketine nav fonda stran û miqamên para kurdî.

"Welatê me Kurdistana e" bû sirûda neteweya kurd ya zemanê xwe. Bû dengê yekîtiya kurdan û li herçar aliyên Kurdistanê belav bû, ket guhê her kurdî; kurmanc, soran, zaza; kurdên misilman, êzîdî û elewî.

Gelek caran ji min dipirsin - Kê gotinên ve stranê nivîsîne, yan jî gelo berî Aslıka Qadir kesî straye an na?

Min nebihîstiyê ku kesî strabe û heger wisa be jî, ji bo min ne muhîm e, ji ber ku heqîqet ew e, ku "Welatê me Kurdistan e" bi dengê min ketiye nav millet û bi wî dengî hatiye qebûl kirin. Ez gelekî şa me ku ve stranê rola xwe ya sereke lîstiyê û ci-hê xwe di dilê gelê kurd de çêkiriye.

Muzîka kurdî behra bêbinî ye û gelek muzîsyenên dinyayê yên mezin ketine bin tesîra muzîka me û tiştine wisa çêkirine, ku di cîhanê de hatine qebûl kirin. Mesele, berî sed salî kompozîtorê ermenî yê nemir Komitas li ser awaz û melodiya muzîka kurdî dîploma xwe nivîstî û qezenc kir. Dû re, dîsa bi muzîka kurdî ve, di festîvala Berlînê de xelata yekem wergirt.

Dîsa kompozîtorê ermenî, yê gelek mezin Aram Xaçaturyan muzîka di balêta "Gayanê" de bi navê "Reqasa bi sur" (di destpêkê de navê wê "reqasa şivanê kurd" bûye) wî li bin tesîra "Cîrîda" kurdan de nivîsandiye (wextê bûkê ji mala bavê der-



Dengxweşa kurd Aslika Qadir bi strana Welatê me Kurdistan e navdar e

Ez dipirsim: "Em çi tiştêkî baş dikarin ji tirk û ereban hîn bibin? Ha bila tirk bi-bêjin ku ew ewrûpî ne, ez dibêjim ku tirk ne layiqê Afrîkayê jî ne. Gotineke kurdan heye, dibêje "Eger me hev nas nekira me ê bi serê bavê hev sond bixwara".

Her miletek bi weklên xwe yên mezin ve tîn naskirin. Pêwîst e ku gelê kurd şexsên cihanî çêbibe. Loma jî divê dê û bav bi awayekî sistematîk li ser xwendina zarokên xwe rawestin, ji ber ku ew di pêşerojê de her tiştên welatê me ne.

Di dawiyê de, ez dixwazim bi riya NÛDEMê gotin û şîretên dayika kurd Mîna Qazî bigihînim gelê kurd û rêberên kurdan: "Yekbûn û hevgerîna hêzên siyasî, yên Kurdistanê dermanê hemû derdan e. Eger gelê kurd di navbera xwe de yekîtiyê pêk bîne, çêbûna Kurdistanê serbixwe, karekî hêsan e. Ez bawer im pir nakiştne ku gelê kurd jî di cihanê de bibe xwedî pênasêke netewî.

Hereta serokkomarê Kurdistanê pêşew Qazî Mihemmed jî ev daxwaza dîroki bû..." □

dixin, kurdên Ermenistanê meqamê "Cîrîdê" bi def û zîrnê lédixin). Niha, ev muzîka Aram Xaçaturyan, ku li ser hîmê meqamê kurdî çêbûye, nasbûna cihanê stendiye û bûye malê her miletî.

Li vir mirov dikare bipirse, gelo çima weklên miletên din bi muzîka kurdî xwe li cihanê didin naskirin, lê çira kurd bi xwe nikarin? Çira di nav kurdan de şexsên wek Xaçaturyan peyda nabin? Aya, kurd nezan in yan çî?

Ez dibêjim di nav kurdan de kesên jîr û jêhatî gelek in, lê bedbextiya miletê me ew e, ku ketiye bin destên dewletên paşverû, agresîv û xêrnexwaz.

Welatê me Kurdistan e

Welatê me Kurdistan e,
Cî, meskenê me kurdan e
Welat me ra ruh û can e
Milet hemû bira ne.

Cî, meskenê me kurdan e,
Temam bax e û bostan e,
Welat gul e, gulistan e
Milet hemû bira ne.

Welatê me pir şêrîn e,
Mêrg û çîmen û zevî ne.
Qîz, xortê wê tev cindî ne
Eslê xwe da arî ne.

Kurdistana me zeynet e
Cimeta wê pir hurmet e.
Temam qedir û qîmet e
Welatê me cinet e.

Welatê me Kurdistan e,
Cî meskenê me kurdan e.
Welat me ra ruh û can e
Milet hemû bira ne.

Derew

REŞXAN MAHMÛDÎ

Sê kes di hucreya sisiyan de bûn. Li vê rêzê du hucreyên din jî hebûn. Ev hucrena, her yek ji wan du metre kare bû. Yek caran hejmara girtiyên van hucreyan digîhaşt heta bi heft-heyst kesan. Li hemberî van hucreyan jî pênc hucreyên din hebûn. Ew hucrena jî her yek ji wan metre qareyek bû û ew jî bo şexsekî bitenê bûn. Ez jî, piştî hefteyekê çûm wê hucreya ku Karmendê belediyê tê de bû. Ji xêndî wî du kesên din jî di vê hucreyê de bûn. Piştî çend rojan, ez bi wî û wan camêrên din re bûm destbirak. Her cara ku Karmend ji îsintaqê vediqetiya, min ew difrkan û ez li ber dilê wî diçû û dihatim. Li nêzîkî roja mahkemeya Karmend, xortekî din jî hat vê hucreyê. Bi hêviya ku Karmendê bê berdand, me qewlê xwe li wî dikirin. Min ji Karmend re got:

– Ev çend rojin ku ew te dibin û tî-

nin, em dizanin ku te tiştek bi destên wan bernedaye. Lê bi rastî, em jî mesela te bi esehî nizanin.

Wî destê xwe avêt riya xwe, destê xwe jî jor de heta bi serê çenga xwe herikand. Li me nêrî. Min jî bi simbelên xwe dilîst. Ew herdu yên din jî piştî xwe sipatibûn dîwêr. Wî hêdîka dest pêkir:

– Hufdeh rojên min çêbûbû ku ez ji emeliyatê hatibûm. Ez hêdî hêdî li ser xwe digeriyam. Dixtor hinek hereket dabûn min ku ez li malê bikim. Min rojê sê caran ew şîretên ku dixtor li min kiribûn, wek şagirtên li ber destê meleyên donzdeh ilim mezin bûbin, min bi cîh tianîn. Ez wê rojê jî cara pêşî derketibûm sûkê û kurê meta min li ber dikana xwe a cil û cawan, ez li ser kursiyeke mezin bihnekê dabûm rûniştandin. Êvarê, ji çend qolan mêvanên me hati-

bûn û nêzikî seet yanzde-donzdehê ş evê, hemû mêvan belav bûn.

Zarokan cîhê min li ser textekî çêkiri- bû. Diviyabû ez li cîhê hişk raketima. Seet li dor sisê û nivê şevê, bû teqîna deriyê me yê jêr. Nezo berî min bi xwe hisiyabû. Wê ez kil kirim û bi kilkirina wê re ez çengbûm ser xwe. Li teşiya xewê, min fahm kir ku ew polîs in. Ez pengiz bûm û ez li kincên xwe peydar bûm. Hîn min kincên xwe nedîtibûn ew bi deriyê hêwana jorîn ve zeliqîn. Xaniyê me du qat bû û du deriyên wî hebûn. Di orta deriyê jorîn û yê jêrîn de jî nabireke ku du malên me ji hev vediqetandin hebû. Di wê nabirê de jî derîkekî piçûk hebû. Deriyekî darînî bû û gava ku ew dihate girtin, dengê wî di feleken de derdiket. Ji ber ku kirêdêr di xaniyê hêla paşiyê de bûn, me ew derî zêde venedikir.

Ez teva pîjema di wî derîkî re derketim. Negîhaşt ku ez wî li dû xwe bigrim, esas ne ku negîhaşt ez bigrim, min ji tîrsa ku ew ê deng jê derkeve, negirt. Bû zinge zinga deriyê hêwanê yê hesinî. Dêya min jî ji odeya hemberî odeya me rabûbû û li ber derî sekinîbû. Ew li bende min bû ku ez xwe xelas bikim, ew paşê derî veke. Piştî ku ez di derî re derketim, wê jî ji kelecane, xwe ji bîr kir ku derî li pê min bigire. Wê çawa

derî vekir, sê-çar polîsan bihev re kirin himînî û li min pirsîn. Dêya min herfek jî bi tirkî nizanîbû. Wê jî eyn bi teş bîtên wan û bi kurmancî bi ser wan de kir cinge cing:

– We xir e? Hûn dawa çî li me dikin? Ma wî nîhaye jina kê? Û vedigeriya ser Elo yê beqçî û digor:– Ma te xêr e ku tu rojê carekê van bêbavan tîne ser serê me? Wextî zarok marokên me bibizdin! Qomsêr pê re xeyidî, got ,” Huşş” û vegeriya ser Elo.

– Ma çî ye, ev mirîşka rewîst dîke cinge cing? Elo gotinên wê bi rastî wernegerand, got:

– Ew dibêje ku lawê min ne li mal e, ev îro du ro ye, çûye kontîrolê... Polîs teva potînan ketine hundirê malê û li malê geriyane. Ew polîsê ku di beşa îstiqbaratê de dixebitî û bi kincên siwîl bû, xwe nêzikî qomsêr kiriye û bala wî kişandiye ser deriyê ku ez tê de reviyabûm. Wan mala me dêrdixanî kiribûn. Her ku ew ber bi kulînekê çûnin, dêya min nehiştiye ku ew nivînan ji hev de bixe û dêya min bi xwe ji wan re ew nivîn û sindoq ji hev de xistin. Wan di esnaya ligerandinê de du kovarên bi tirkî li malê dîtin û ew wek tiştên qedexeyê bin, teva xwe birinin. Li ser çûyinê, qomsêr berê xwe daye dêya min û jê re gotiye:

– Keçê, hey nizamim, çî! Tu dibêjî ku "lawê min, ev îro du ro ye ne li mal e", lê biner, va ye hîn derî vekiriyê! Ew terorîstê lawê te di vir re reviya ye! Dêya min, ji xêndî gotina "terorîst" yê tiştekan jê fahm nekiriyê û gotiyê:

– Terorîst hûn in! Kûçîk lawê sed kûçîkî! Hey min di devê bavê te de rîtiyo! Ma hûn dawa çî li me dikin? Di hudirê vî pênc mehî de, ev cara çenda ye ku hun wî digirin? Ji xwe we ew kiriyê nîv însan! Hema ji xwe re bikujin û xwe jê xelas bikin, ha! Kuro, Eloyê bênamûs! De bibêjî, ha! Bibêjî, meta Xanê wentî dibêje, ha!

Qomsêr delkekê dide dêya min û wê li ser piştê li erdê dixîne.

Wexta ku polîsan xwe gihandibûn hêwana ku dêya min bi wan re mînaqasê dikir, ez li ber deriyê paşiyê bûm. Min hêdîka derî vekir... Min li cem xwe digot, heger polîs li ber vî deriyê jî hebin, ez ê bibêjim ku 'ez hatibûm derî li we vekim'. Piştî ku min derî vekir, ew derûdor ji ronahiya lampeya kuçê, wek ronahiya rojê xuya dikir. Kes tune bûn... Lê dengê qere pera wan ji hêla deriyê jêrîn û ji hêwana me dihat. Baran ji êvar de bariyabû û erd hilpişirîbû. Li ezmên, ewrekî reş hebû. Her gav di karîbû baran bibariya. Ez pêxas û teva pişjema reviyam. Rev jî çî revî! Ji xwe ez

bi zorê li ser xwe diedilîm. Lê ji tirsê ruh, min di wê bîstîkê de êşa xwe ji bîr kiribû. Ez li piştê xêndî zivirîm û min xwe bera ser xaniyê cîranê me da. Xaniyên mehelê hemû li piştê hevdu bûn. Xaniyê cîranê me jî ji texma kuçeya jorîn nizimtir bû. Xaniyên mehela me, wek piştekan rezan hatibûn ava kirin.

Min xwe di ser wî xaniyê re bera ser himamoka mala meta xwe da û ji wir jî min xwe bera xîrbekê ku sed gavekî ji mala me wê de bû, da. Min di wê gavê de nizanîbû bê ez ê bi ku de herim. Ez êdî bûbûm wek malê qaçaxê. Min li cem xwe digot, hat û ez li deriyê hinekan bixim û ew nexwazin min vehewînin. Wê gavê min nikarîbû careke din li rûyê wan cîranan binêriya. Ji ber ku cara berî vî carê ku li min dihatê gerandin, ez roja pêşî çûbûm mala pismamekî xwe, tu nema bû ku wî di bin xwe de berda. Ew di hundirê seetekê de çend caran derketîbû destava piçûk. Piştî ku min ew rewşa wî ferq kir û tarî ketê erdê, ez ji wir çûbûm mala bixaltiyê xwe û wê şevê bi otomobîla wî em çûbûn bajarêkî din. Û anuha jî ez çûbûm ber deriyê xweha wî bixaltiyê xwe. Ez teva pişjema û xwas li ber pencereya wan sekinîm. Min destên xwe avêt derabeyên pencereyê. Ew wek qeşayê bûn... Bi cemidîbûna wan re min ferq kir ku lin-

gên min jî cemidî nin. Ez bi derabeyan ve rapelikîm û min li hundir nêrî. Cam ji derabeyan gelekî dûr bûn. Min destên xwe di derabeyan re derbas kir û hêdîka li şibakê xist. Paşê min guhdarî kir. Deng nehat... Min piçekî din jî him li dengê ku dê ji hundir were û him jî li derve li dengê polîsan guhdarî kir. Deng ji tu kesî û ji tu hêlê nedihat. Te digot qey di vî bajarî de zindî tune nin. Ji ser qumaxaê xênî dengê "miyaw" bûna pisîkekê hat. Min careke din jî li pencereyê xist. Dengê livandinekê ji hundir hat. Bi dengê ziqata derî re, dengê "Ma tu heta vê seetê li kîjan kuçena yî?" hat.

Wesîlayê derî vekir û bi vekirina derî re destê xwe avît bişkoka lampeya ber derî. Min got:

– Wê ya vênexê! Wesîlayê teva kirasê binî û serserqot bû. Bala xwe da min û bi awayekî şaş mayî, got:

– Weh, te xêr e? Vê şevê, vê qiyametê, çi qewimî ye? Û hema ez kişandim hundiro. Min hîna pirsra zilamê wê nekiribû, wê got:

– Min jî got qey Tosino ye. Ew jî îşev nehatiye malê. Min hîna jê re qala tişteki nekiribû, wê got:

– Dîsa polîs?... Ne were, dîsa polîs? Lawo, ma nizanîm wê çawa be! Ev halê te wê çawa be?

Ji xwe re ji van deverna here, lawo! Ma ji xwe tu bûyî nîv însan...

Min dizanîbû ku ew li ber min dikeve, lê di wî halî de, teva wî lingê biherî û teva pîjema, wê şevê, gotinên wê qet bala min ne dikişand. Wê derhal çayek da ser tip û sobeyek dada. Heta ku sobe pev ket û çay jî keliya, dengê azana sibehê hat. Piştî vexwarina çay, wê zarokên xwe dan ser hev û haziriya cîhê min deyne, kir. Min jê re got ku, 'ez ê herim'. Wê xwe hilanî û li erdê xist û got:

– Ma te aqilê xwe beradaye? Tu yê vê şevê bi ku de herî? Hema bi Xwedê ez nahêlim tu bi tu derê de herî... Mêrê wê jî ji dûra ve mervê me dihat, lê ji ber ku min dizanîbû mêrê wê dilxerab e, teva ku min dizanîbû ew ji min dibkerabiyeke weha nake jî min nexwest bêyî ku zilamê wê li mal be, ez li cem wan bimînîm. Ji xwe êdî sibeh bû. Me hîna di ber hev de dida û min jê re digot:

– Ger tu bikaribî, ji kerema xwe re here ji malê sol û kincên min bîne. Divê berî ku dînya rohnî bibe ez ji nav bajêr derkevim. Wê xwe hazir kir ku ber bi mala me ve hilkişe, teqê teqê dengê qondereya zilamê wê ji devê hewşê hat. Ji xwe kuçeyên bajêr hemû kevir û kuçik bûn. Di dengê meşa Tosino de diyar dibû ku ew serxweş e. Dengên tewşo mewşo ji ber lingên wî dihatin. Ne

Xwedê heye, wexta zilamê wê kete devê derî û ez jî teva wî pîjemayê tenik û di wê seetê de, li mala wî û li cem jina ciwan, di wî halî de, piçekî şibha min jî ji min çêbû. Tosino, erê dilxerab bû lê, wî dizanîbû ku zinêkarî bi dê û xwehan re nabe.

Wexta ku ew çav li min ket, hişê wî bi yekcarî hate serê wî û bi min re eleqedar bû. Wî dizanîbû ku tiştin hatin serê min. Ji ber ku hemû dost û cîran elimî bûn... Êdî ew bûbûn wek guhên ku li ser gaziye bin. Wî jî wek Wesîlayê israr kir ku ez bi derekê de nerim û heta tişteke tê fêrî kirin, li cem wan bimînim. Min jî ber vê rûavêtina wan a ser min, qîma xwe bi li cem wan mayinê anî, lê min Tosino şand malê da ku alavên min bîne. Û min jê re got ku, "Berî ku tu here malê, li derûdora xwe mêze bike, ew dikarin li dora malê rûniştin!"

Em li bende Tosino û hatina wî bûn... Niv seer derbas bû, ew nehat, seetek derbas bû ew nehat. Êdî dinya rohnî bûbû. Wesîlayê rabû di bergiya wî ve çû. Piştî midetekê, Wesîla û dêya min teva alavên min bi hev re hatin. Lê belê Tosino nexuya bû. Êdî em ketin derdê wî... Lê Wesîlayê her digot, "Tişteke bi wî cehemiya nayê, dev jê berdin." Roj hate nivro û heta ku roj dageriya jî

me tu cewab ji Tosinoyê xwe hilneanî. Li ber êvarê, bixaltiyê min î Seyidxan bi ser me de hat û cewaba ku Tosino ji referê polîsan ve hatiye girtin ji me re anî. Bixaltiyê min î Seyidxan, zilamekî kone bû, lê di wan demên min î ku ez mahkûm dibûm de, wî tişteke teksîr nedikir. Wî ji bo min fedekariyeke mezin nişan dida. Esas ne wî tenê, gelek ji eqrebayan alîkariya min dikirin. Ji ber ku otomobîla Seyidxan hebû, hema kîjan gava çih li min teng bibûya, min dişand pê wî û min berê xwe ji bajêr diguhert. Heta ku hebekî av di ser min de zelal dibû, ez careke din li bajêr vedigeriyam. Êdî min rêya ku mehekê di bin çav de nemayinê, bi şertê ku di pêla pêşî de ez neyem zefî kirin, fahm kiribû. Ez jî, heta ku ji destên min bihata, min bi koneya hereketê dikir û yek caran jî, Eloyê beqçî, berî ku polîs dest bi operasyonan bike, cewab dida min. Erê herkesî bi xerabî qala Elo dikir, le Xwedê heye ku gelek caran wî alîkariya me kiribû. Heta cara ku berî vê carê ez bêm girtin, wexta ku ez di nezaretê de bûm, wî hatibû li halê min pirsîbû û wî, ew carcûra devançeyê ku min di bêrika xwe de ji bîr kiribû jî xelas kiribû.

Ez û bixaltiyê xwe Seyidxan, bi otomobîla wî, di cadeya hêla qubleyê bajêr de, bi tarîketina erdê re ji nav bajêr der-

ketin. Li biniya bajêr kontirola polîsan hebû. Di wê seeta ku em ji bajêr derdiketin de, polîs çûbûn xwarina êvarê. Em nêzîkî cîhê kontirolê bûn... Wecê bixaltiyê min piçekî zer bû. Berî ku em bighêjin cîhê kontirolê, ez ji oromobîlê peya bûm û bixaltiyê min î Seyidxan dewam kir. Wî heta bi cîhê kontirolê tûrek avêt û di nig de vegeyriya. Em bi silamêtî ji wê kontirolê xelas bûbûn. Em gihaştin qonaxa xwe... Piştî hefteyekê ji terefê cîhê min î kar, ji min re ce-waba ku divê ez rewşa xwe ya karmendiyê zelal bikim, hat. Divya bû ya min raporek bistenda û ya jî ji karê xwe îstifa bikira. Min da ber hev û ez dîsa vegeyriyam bajarê xwe.

Roja duşemê bû. Ez bi fisekî çûm cîhê karê xwe û min ji wir telefonî hevalêkî xwe yê herî dewlemendê bajêr bû kir. Piştî seetekê min û wî li benzînxaneyê wan hevdu dît. Têkilyên bavê wî û başqomsêr baş bûn. Qederê cixareyekê bavê wî jî hat yazîxaneyê benzîxaneyê. Bavê wî mirovekî qut û qalind bû û qet ken bi ber wecê wî nediket. Cixareya wî wer di kêleka devê wî debû. Û ew qet têkilî van tiştan nedibû. Lê li ser gotina lawê xwe, ew ne şikenandibû û wî ji bo xatirê lawê xwe û hevaltiya me, telefonî başqomsêr kiribû. Em hîn li yazîxaneyê wan rûniştibûn, başqomsêr bi tena serê

xwe hat wê derê. Başqomsêr ket devê derî û bavê hevalê min berî me ji ber wî rabû ser xwe. Bi rabûna wî re, ez jî mecbûr mam ku rabim ser xwe. Ew çawa ket devê derî, di bin çava re li min nêrî û got:

– Tu ji van camêrên nola haziran jî fedî nakî ku tu bi van tiştan re eleqadar dibî?

Bi ser gotina wî re, min li cem xwe digot, "Xwedo yarebî erd veqelişe û ez têkevim binî". Min bala xwe dida derûdora xwe û min digot, maşalê kesî em li cem hevdu nedîtibin. Min devê xwe tije kir ku ez bibêjim, "Ma min çi kiriye ku ez ji ber fedî bikim" bavê hevalê min li hêla min nêrî û bi awayê ku ji min re bibêje, "Dengê xwe neke" li min mêze kir. Hevalê min jî di ber xwe de ji min re got, "Heger ku tu deng bikî, tu yê her tiştî xera bikî!"

Başqomsêr, piştî barek tehdît û di nav re jî şîret kirin, got, "Ji bo xatirê Zîwer beg, em te vê carê nagirin. Lê heger tu xwe tev bidî, em bi çilika hustiyê te digirin û em ê heyfa kevn û nuh ji te hiltînin!" Piştî vê "efûkirinê", bavê hevalê min ji bo vê qenciya başqomsêr, jê re vîdeoyeke VHS kiribû.

Di ser vê hevdişînê re sê roj derbas bûn, careke din polîs hatin ber deriyê me û di ronîroyê de ez birim qereqolê.

Wê rojê heta êvarê ez di nezaretê de hiştim û ber bi êvarê, ew êkîpa ku ji bajêr hatibû, ez anîm vê derê.

Ji ber ku gelek ji wan ez nas dikirim, çawa ez gihastim hundirê vê qereqolê, bêyî ku ew min bînin hucreyan, yekî ji wan got, " Vî kurê qahpê, çawa be dê nepeyive. Wî rast bibin cîhê 'dansê'!" Wan vê re, ez şût î tazî kirim û ez li ser sandelyeyekê dam rûniştandin.

Di vir de, ez ketim navbera peyvê û min got:

– Ma te ew ê ku weha got, nas nekir?

Karmend:

– Çavên min girtibûn, ma min ê çawa ew nas bikira? Û dîsa dewam kir:

– Piştî çend pirsên beradayî, wan serê qabloyan bi tiliyên min ve girêdan û qolê wê makîneya wek a riştan bû, ba dan. Ez teva kursiyê rabûm û li erdê ketim. Her carekê ku ew qolê makîna rişteyan dizivirandin, heta bi tayên porên min diricifîn. Wan tu pirseke ku tişteki ji min der bixin nedipirsîn. Bi tenê pirsas ku, " Bê tu wê roja ku polîs hatin mala we, tu çima reviya ye" dikirin. Wan dev ji her tiştî berdanin û bi qûna vê pirsê girtin. Li min jî bûye inyard, ez ji wan re nabêjim ku ez wê şevê li malê bûm û ez ji ber we reviyame. Ez jî weke ku dêya min ji wan re gotibû, dibêjim, "Ez berî wê roja ku hûn werin bi

du rojan çûme wî bajarê ku ez lê emeliyat bûbûm."

... Û îro jî roja yanzdan e ku ew min dibin û tînin, ji vê pirsê pêvtir tu pirsên din ji min nakin. Di çend rojên ewilî de hin pirsên beradayî ji min dikirin, lê ev çend rojin ku ji vê pirsê wê de tir tu pirsên din nakin.

Bala min ket wê birîna ku li milên wî çêbûbû û min jê re got:

– Waye hîna dewsa askiyê li milê te xuya ye, ger tu derket mahkemeyê li wan gilî bike! Wî li min û wan her sê girtiyên din mêze kir... Di tariya hudirê hucreyê de, dirêj bûyina rîhên wan diyar dibûn.

Wî got:

– Ma kûçik goştê kûçik dixwe?

Wî, hîn dikira dewam bikira, tiqe tiqa dengê lingê yekî hat. Dengê tiqîna lingê wî gihast ber devê deriyê hucreya me û bû şerqîna surmeya hucreya li hemberî me. Ew hucreyên ku li hemberî hucreya me bûn, ne wek ya me bû. Em hemû bûbûn kurkurk... Deng ji me kesî nedihat... Me midetekê weha guhdarî kir. Piştî muxdarekî bû qîre qîra qîzekê. Ew ê ku nuh hatibû cem me, dikira bibizdiya. Ew di jiyana xwe de care yekem bû ku hatibû girtin û temenê wî jî li dora hufde-hîjde salî bû.

Karmend xwest ku wî teselî bike û jê re got, "Ew mexsûs wer dikin ku tu bitirse! Binêr, tu yê bibînî ku ne ewqasî zore. Hema tu piçekî dev li dilê xwe bikî, dê biqede. Piştî tu cara pêşî tiştekî nebêjî, êdî tu yê sava xwe bigrî û tu nema tiştekî dibêje!"

Bi dengê wê qar qarê re, hatin ew xortik birin. Berî ku ew derî vekin, Karmend bi destên wî girt û jê re got, "Biner, biner! A ku te li ser lingên te bisekinîne îradeya te ye û ji bîr nekî ku tu yê sibeh roj derkevî derve û tu yê li rûyê xelkê binêrî, ha! Dive tu ji navê bavê xwe fedî bikî, li gor wê, ha! Wî got, "Temam" lê, ling di bin de nedisekinîn. Ew bûbû wek hêlancûkê. Bi vekirina derî re û bi wê ronahiya ku ji lampeya korîdorê da serçavî wî re, zer bûna wî hîn bêtir diyar bû.

Ew xortik hate birin û nema careke din li hucreyê vegerandin. Piştî birina wî xortî, Karmend careke din jî birin îsintaqê û dawa ku wî şîret li wî xortî kirinin, lê hatibû kirin. Û ji bo wê jî ew hatibû terrik kirin.

Roja çardan bû. Biba sibeh, divyabû Karmend derketa mahkemeyê. Ew careke din jî hate îsintaq kirin. Û kirin û nekirin, wî li xwe heq nekir ku wê şevê ji malê reviya ye...

Ew ê ku zor dida Karmend, jê pirsî:

– Yanî ketiye serê te ku tu yê weha bi rehetî ji destê me xelas bibî? Ji te heye ku tu nepeyivî û em ê jî te berdîn, ha! Karmend bi xwe bawer bû û wî dizanîbû ku ev îsintaqa talî ye. Ew di hundirê van demên ku dihate girtin û beradan de, bûbû xwedî tercube. Wî li cem xwe digot, 'ev fortên dawî nin û ew dikin îfadeya min bi min bidin îmze kirin'. Polîsê ku îsintaq dikir, carake din jî ji Karmend pirsî:

– Tu yê wek camêran bibêjî, an na?

Karmend dîsa înkâr kir.

Polîs:

– Baş e! Gunehê te di hustiyê te de.

Wî destê xwe avêt wî paçê ku pê çavê wî hatibû girêdan. Vekir... Wî newêrîbû çavên xwe vekira.

Polîs got:

– Veke, veke!

Ew çawa çav li min ket, wecê wî qulipî.

Polîs:


– Ka tu yê îcar çî bibêjî?

Karmend:

– Derew! Giş derew in. Wî çî gotîbin, hemû derew in!

Sala 2002ê

Efsûnbaz



FEWZÎ BÎLGE

Min dixwest bibim wênesaz; ji hestî, goşt û Lxwîna neteweyekê wêneyan saz bikim. Pêşkêşî hemû Xwedayan û Şeytên bikim; da ku xezeba Xwedayan li min bibare û Şeytan çend caran min tî vegerîne ji avê. Wêneyên meşa qiti-

kan, lîlan û stranan, kereng û dobelanan, tolîk û tolîkvanan, têkoştin û hewaran çarçove bikim û bi stêrkan ve daliqînim.

Rengan hilbijêrim, ne ji yê n fermî; ji yê n zerî, esmer û gewran. Li ber bêhna gul, sosin û rihanana û di nava rûbaran de bi dizbê kevîm, wenda bibim dîsa...

Bibim firçe û boyax, têkevim çarçovê û ji roja girtî re bibim bêhnek, keserek... Wêneyên zarokên pêxwas saz bikim; yê n ku tîlên bi stîrî rûyê wan gez dike û jiyana wan diperçiqîne. Mêşan biqewirînim ji ser poz û devê wan bi perekî teyrê baz. Di Keştiya Nûh de veşêrim û nemir bikim heya qiyametê.

Ez zarokê Mezrobotan; navê min yê n nasnameyê zor tê ji zimanê diya min re. Lomeyan nekin, yê we jî werê ye ez zanim. ŞÎNO hîn hêsana tê ji zimanê diya min re. Zarokên beg û axayan rêncber û gundiyan di yek rengî de ne li ba me. Berî çêbûna me, diya me çavîk û berbejna dixwe stûyê me. Bav meqesê hazir dike, mam gûzanê, pîrîk dikewîne zikê me û pîşo dibe derman. Qêrîna dibe pêl dergûşê dihejt-

ne. Xwê diavên êgir, nezer diteqînin, nan belav dikin û ranazên di çilê me de heya roj hiltê. Bêlorîk dimirin em, bi şekirê lê xwendî şêrîn dikin devê me û ditirsin em bimirin di zarokatiya xwe de. Xwedê destûr bide hinek dijîn ji me. Gelek peyman saz kirine ji bona mirina me, dîsa jî jiyan mişt e li ba me.

Navê min Şîno ye; li Qoserê, di qijîna rojê de, dîsa, weke her car li ber paceya kargeha Efsûnbaz, bi dizî ketime temaşeyê. Min dil daye wêneyan wan jî daye min, ser bi ser. Ez girêdame bi heft werfêşên rîs. Di erdek bêmayîn de veşartokê dilzîm bi Efsûnbaz re; tirs tunebû sûc tunebû, şermok bûm.

Yekcaran di nava bêhneke efsûnî de diketim dewsa Wênesaz.

Min wêneyekî jineke Botanî diafirand; jineke diranzêr, bi eyûnên du alî, beyandûrek qaşmermer, çil kezîyên bi zîv hûnayî, biskên badayî, çavên xezalî, lêvtûyên şêrnî, kitanek Tirabzûnî, du cot hibriyên hemayî, şeş qor morî û mircanên binxetî, guharên helebî...

Gava ez ji xeyalan filitîm, tarî ketibû erdê. Bi lez û bez, min du gilok dezî stand û ji tîrsa lêdanê ber bi malê ve reviyam. Sibê ya min bû, meh û sal jî.

Roja din, dîsa, li ber paceya Efsûnbaz ketime temaşeyê ji min dûr û kûr. Wêneyek li hember paceyê danîbû; wêneyê jineke ku li ser kendalekî rûniştiye. Gava min çav bi tabloyê ket, du ramanên cuda ez zêft kirim û ez bi xwe re birim. Dudihiyê bi min girt, ez xistim nava ramanê kûr û ez ber bi bêdawîbûnê ve kişandim. Min li rûyê wê nihêrî; azadiya bêşnor, xweşikahiya têkoşer û bi esil, ewqas xwezayî û stewyayî serê min gêj kir.

Çavê wê, rengê keskek şêxanî, bi min re ber bi dawîbûnekê ve kete rê. Di awiran de pêlên evîndariyê dipekiyan. Wê jî zanibû bê çî qas xweşik e. Di spîka çavên wê de damarên zelal mîna rûbaran diherikîn. Ji bilî min çavên wê xwe dirêjî ezmanê heftan dikirin. Mîna ebrê di mêzîna mirovatiyê de cih digirt. Bejn û bala wê, te digot qey nobedariyê ji çandê gelek dewlemend re digre. Mîna peykereke Afrodît mûyê canê min kirin şûjin. Xweşikbûna wê ewqas yekta bû ku, çav jê nediqetiyên. Çavên min li çavên wê, dûre li lêvên wê, piştê li esmeriya wê; ji esmeriyê dîsa zivîrîn porê herîfî yê sor. Çav qerimîn û dîsa zivîrîn ser çavên kesek

Li hemberî pakbûn û bedewiya wê, mirov rêz digirt, rêz nedima, hezkirin diket şûnê. Mîna du hêzên xurt di mêjiyê mirov de li hevdu dixistin. Ji ber wê jî çav di-revîyan, debar nedikirin û dîsa vedigerîyan.

Xeml û xişrên wê, hûçik û xeftanê wê, çiqas nas bûna jî dîsa çav jê nediqetiyên. Werê li bejnê hatibû, mîna zirxan. Ewqas jî bi hêsanî radikir. Mirov qêmiş nedi-

kir... Carna awir diketin erdê û belav dibûn. Di her gul û kulîlkên xeftanê wê de ked diyar dibû. Mirov dixist nava gerînekên bêdawî, dikir rêwiyekî sewsî û bi çiyar dixist; çol tunebû.

Mirov dixist nava xeman, lê ne xem bûn. Mîna qîzeke ku bendewarê evîndarê xwe, lê kevîrê sebrê ne di dest de. Carna xwişkek, dayikek, jinek û carna jî evîndarek bû.

Wê dilê sirûştê li xwe kiribû. Teslîmîyet nas nedikir. Her xwe nû dikir di sîngê Sîpanî de berhemên nû xwe didan der.

Kevîr û gîha, çilo û qamiş bi kedeke mezin hevaltî ji wê re dikirin; nêrgîz di binê nigên wê de dilşad bûn. Li hemberî bejna ziravan, têlên ribabê ji hêrsa diqetiyar; ribab nedisekînî. Difikirîm; di nava xeyalan de kûr dibûm.

Axir, ziman û mêjiyê gul û kulîlkan, dar û latan tune ye ya na ez dibêm wê hilweşiya cîhan an mîzîna wê xira biba. Her tişt wê li ezmên, mîna molekulên bê sazûman şaş bigeriyana.

Îca qaşo mirov baqil û zane ne. Lewra zane û bîaqilbûna dijminê kedê, her dem çend xweşikê mîna Zirava diavên nava êgir. Roj nêz e; ez bawer im wê xwe biavêjin bextê Zirava. Roj nêz e; bext asê ye.

Wênesaz; yekî esmer, tenik û dirêj, riha wî hinek sipî û her dem dirêj. Xuya bû ku ji rihê dirêj gelekî hez dikir. Her dem diponijî; mîna ji şerekî giran derketibe, westanê di rûye wî de dabû der. Wekî ku bi Xwedayan re şer kiribe û xezeba Xwedayan lê barîbe. Dilşadî ji wî gelekî dûr, lê azad; azadiyeke berdêlgiran. Ji bona azadiyê xwe ji berdêlên nû re amade dikir; xwîn dida, rih dida, can dida, nedimir û vedijîn berhemên nû.

Doza dilşadiyê nedikir. Jixwe bikira jî dilşad nedibû. Dilşadî ji bona wî stûxwarî, têkçûn û tirs bû. Mîna Prometeûs ne dilşad, lê doza azadiyeke bêsnor dikir. Ji bona vê dozê bi xwe û carna jî bi Xwedayan re ji şer dikir. Di qermîçekên eniya wî de ev yek baş xuya dibû. Carna li Şeytên guhdarî dikir. Şeytan dostê wî bû. Mîna dînan lê dînekî pir zîrek. Loma ez ji wî neditirsîyam. Min dixwest bang li min bike û bi min re bipeyive, da ku ez wêneyên xeyalên xwe pêşî wî bikim. Lê tu caran doza min neçû serî û hay ji min nebû. Roj bi roj ez hîn bêhtir dibûm bengiyê wêneyên wî. Efsûnbazê min an wênesazê min çi kes bû ji min re ne xem bû. Berhemên ku diafirandin gelekî serkeftî xuya dikirin. Bi saya serê wî, ev nexweşiya wênesaziyê li min jî peyda bûbû. Xelasî jê tunebû.

Gelek sal û zeman di ser re derbas bû; ji ber gelek sedeman malbata me koçî bajarê Stenbolê kir. Li wir min dibistanên xwe qedandin. Çi qas zeman di ser re der-

bas bûba jî min Efsûnbazê xwe ji bîr nedikir. Lewre êdî min jî wêne saz dikirin; ew mamosteyê min bû lê tu caran ders jî nedabû min, lê ez ji wî fêrî gelek tiştan bûbûm. Ji bona gelek sedeman, ya girîng jî, bi hêviya ku Efsûnbaz bibînim, min çû Qosarê pêşangehek li dar xist. Roja vebûnê, gelek temaşevan hatin; hevalên zarokatiyê, yên kolanê, yên xortaniyê, mamosteyên min ên dibistanê. Gelek dilşad lê ew qas jî xemgîn bûm. Di nava şêniyê de çavê min li Efsûnbaz digeriya. Di her tabloyê de xuya dikir lê min ew nedidît.

Min xwe ji nava şêniyê xilas kir, ber bi maseya xwe ve çûm. Pakêteke xweşik û balkêş li ser maseyê bû. Sebrê zora min bir û min, bi lez, ew vekir. Wêneyekî min yê zarokatiyê, dema ku min li ber paceyê li wî temaşe dikir saz kiribû û wekî diyarî ji min re hiştibû. Piştî sê salan, ev wêne ketibû destê min. Di wêne de terz û hestên wî, darbeyên firçeya wî diyar bûn. Êdî tayên spî bi rih û porê min ketibûn, lê weke zarokan ken û girî li nava hev ket.

Çavê min hîn bi biryar bûn; hêstir hatin xwarê. Dîsa ken zora hêstiran bir. Bêhemdî qêrînek bi min ket û salon di cih de sar bû. Zeman sekinibû. Ez dîtibûm, wî ez dîtibûm!.. Min wêne mîna dîna pêştî temaşevanan dikirin: " Li vî binêrin!.." Awir giş li min zîq bûn. " Mamosteyê min Efsûnbaz wêneyê min saz kiriye!.." Min wêne di mûzeya dilê xwe de, di qorzîyekî pir taybet de, daliqand.

Gulên ku ji bona pêşangehê ji min re hatibûn. Min giş dane hev û di berbanga sibê de berê xwe da Goristana Şêx Sêlim... □



Pêşangehên Fewzî Bîlge

ÇIYA MAZÎ

Di van 2 salên dawî de wênesaz birêz Fewzî Bîlge, bajar bi bajar digere û wêneyên ku bi ronîya çavan çêkirine pêşkeşî mirovan dike. Berî du salan li Stenbolê, dûrî jêderka wêneyên xwe bû. Lê wekî her kurdekî, wekî her hunermendekî ez bawer dikim êdî hew di hundirê wî hilat û wêneyên xwe xist tûrê xwe û rahîst firçeya xwe, berê xwe da xaka xwe.

Pêşî Amed di bîrê de bû. Dû re Mêrdîn, Êlih, Sêrt û Qoser. Dû re dîsa Êlih. Ez jî bi çend hevalan re çûm pêşangeha Qoserê. Bi rastî wêneyên wî, tabloyên wî, tab û keda wî û rewşa wî, hestiyariyek bi min re çêkir. Li pêşangehê hate bîra min û min got "hêja ye mirov serê xwe li dîwaran bixe". Dibe ku hinek bibêjin "ev hinekî zêde ye" lê bawer bikin hêja ye ku mirov xwe ji ser tahtê jî bavêje.

Ji bo çi?

Birêz Fewzî Bîlge, dixwaze mirovên kurd bibihîzin û bibînin ku wêneyên êşên wan hêja nin. Dixwest mirov bibînin ku êş, hunermendên hêja derdixin holê. Di wêneyan de xwestiye ku êş û janan, tevî xwîn û xêza wan hişk bike û di serê mirovan de bi cîh bike.

Lê gelo çiqasî di wê ramana xwe de bi ser ketiye an bi ser dikeve? Ji bo hunermendek êş û janên mirovan nîşanî wan bide, ji wan re bibêje û bide temaşekirin jî, qey divê pir êşan bikişîne. Çûyîn, hatin, rê, qedexekirin, girtin, wêneçêkirin, kêmtir temaşevanî û aborî...aborî...aborî.

Ev êş ya hunermendên kurd, wêjevanên kurd gişan e. Lê Fewzî Bîlge vana gişa di



Hunermend i ewzi bilge digel tabloyek xwe

bedena xwe de bi awayekî dijwar hîs dike.

Hilbet hinek nixandî li ser wî û wêneyên wî hatine kirin. Lê ez dixwazim alîyekî ku kesî qal nekiribe xuya bikim.

Wênesaz Fewzî Bîlge, bi awayekî dilanî, bi çoş wêneyan çêdike. Amade dike, pêşangehan saz dike û li benda dîlana mirovan dimîne. Ew kêf û dîlana mirovan dê wî jî bicoşîne... lê belê...! wê dema ku mafê wî î kêfê tê carinan xwezî di qirîkê de dimîne. Carinan bi seetan çavê wî li derî ye. Û carinan jî çavên vîkî vala ku li wêneyan dinêre wî zivêr dike. Diviyabû ku di her pêşangehê de bi hezaran mirov bêne temaşeyê. Diviyabû ku di her pêşangehê de çend wêne bibûya bersîva çûyîna aborî da ku bikaribûya bixwara, vexwara û bijiya û wêne çêkirana. Em vê yekê jî bibêjin. Ji xwe yêr têne temaşeyê giş belengaz in. Wê demê cardin hêviya dewlemendan li dar dikeve.

Ew jî tune ye. Gelo çend heb dewlemendên kurd welatparêz in an çend heb di pêşangehên wiha de alîkariyê dikin?

Ew dibêje "aborî ne pir giring e, a giring ew e ku mirov bibînin û hinekî para min di guherîna civakê de çêbibe." Û dîsa dibêje "bila pir mirov bêne temaşeyê û



g e r a
pêşangehê,
ew jî ji min
re dibe sebr
û aram” (lê
min jî dît ku
ew daxwaz
nayê cîh)
Gelo ev peyv
ji devê çend
hunermendên
dinyê
derdikevin?

Gelo ev
qedirbilindî
wê kîjan demê
cîhê xwe
bibîne? Huner
û wêje di
guherîna civakê
de tiştên
bingehîn in.
Siyaset, siyasetmedar,
wênesaz û wêjevan
têne guherîna
jiyana wan
xelas dibin,
lê huner û wêne ma-

yinde nin. Wêje mayinde ye. Navê hunermend ji ber wê yekê pir xweş û bi qedr e. Diafirîne.

Di civakê de bi tilîkan têne jimartin. Kesên neqandî ne. Hilbet wê di demên pêş de rûmet xuya bibe ji berhemana re. Lê ji bo kurdan divê aniha jî rûmet hebe. Ji ber



ku civak paşdemayî ye, bindest e û li rêya azadiyê digere. Dil dixwaze mirovên aniha sûdeyê ji berheman bigire. Heke mirov aniha sûdeyê jê wergire û rûmetê bidêyê, di demên pêş de dê berhemên pir hêja derkevin holê.

Heke aniha rûmet neyê girtin, wê wekî her hêjahiyên me, biyanî li wan xwedî derkevin û bikin malên xwe.

Gelo wê demê wê çawa di hundirê me de hilê ku hinekî din bibin xwediyê tabloya "keçika gundî î gerdên morîk"? gelo mirov tabloya "keçika stuxwar" fêm neke tahma jiyane heye? Gelo mirov ji tabloya "sêpeka ji darê î li ser kela Amedê" sûdeyê negire jiyana dîrokî çiqas di bîra mirov de ye? Heke mirov vana bibîne û ji wan fêm bike û sûdeyê jê bistîne wê demê mirov dê ji tabloyên dîlanan jî hez bike. □

Pepûk

ENWER KARAHAN

Meha Gulanê, serê sibeha sêşemê Zilamekî navsere ket hefsê. Temenê wî, li dor şêst salî bû. Zilamekî biqilafet, rîh û simbêlên wî ji reş bêtir sipî xuya dikirin. Porê wî elebilûs hati-bû qusandin û bedlekî rengsûsik î tenik lê bû. Teva ku temenê wî bi pêş de ketibû jî wecê wî sorzepitî û diranên wî ne taxim bûn. Kurê wî yê ji jina wî ya ewilî jî di eynî hefsê de bû. Kurê wî ji dawa partîyeke siyasî hatibû girtin û di nav mahkumên siyasî de bû. Ew jî ji ber sûcê ku kiribû, ketibû qawîşa mahkumên edlî. Navê wî Hecî Siyamed bû... Ew du caran zewicî bû û ji jina wî ya pêşî çar law û sê keç û ji jina wî ya duyem jî lawek û du keçên wî hebûn.

Li qawîşa ku Hecî Siyamed tê de bû, her kesî dizanibû ew ji ber çî hatiye girtin, lê tu kesî ew culhet di xwe de nedidît ku jê bipirse bê sedema vê bûyerê çî ye. Ji bo çî ev xezeb hatiye serê wî. Di qawîşê de, wî zêde bi kesî re ne dida û ne distend. Gelek caran bi tena serê xwe dima. Yek carna mahkûmekî ku navê wî Sîno bû, bi tengala wî diket. Lê ew tucarî li ser meseleya girtina wî nedipeyvîn. Bi tenê bi hev re sohbet dikirin

û diçûn wî serî û vî seriyê hewşê...

Di ser girtina wî re heft meh û bîst roj derbas bûbûn. Ji çûyina mahkemeya xwe ya sêyem vedigeriya. Lawê wî Eto cewaba kuştina lawê wî yê li serê çiyê bû, da wî.

Li ser vê cewaba nexêrê tişteki zêde negot, bi tenê derket hewşê û cixareyêke qaçax vêxist. Sînoyê ku di van heft-heşt mehan de, bi Hecî Siyamed re bûbû destbirak, bêyî ku tişteki bibêjê xwe da tengala wî û bi qedandina cixareya wî re, cixareyêke pêçayî dirêjt Hecî kir. Piştî tûra sisiyan, Sîno ji Hecî re got:

– Bila yên mayî sax bin. Mirin tahl e, lê emrê Xwedê ye, em çî bikin... Divê mirov şikiriya xwe bine... Ew bi derba dewletê hatiye kuştin... Bê minetî ye! Xelefa we li Xwedê.

Sîno merivekî bîrbir û serwext bû. Ev sala wî ya şeşan bû ku di hefsê de bû. Ranza Hecî di ser ranza wî re bû û gelek caran ew bûbû şahid ku Hecî di xew de, bi destan dipeyive û kabûsan dibîne.

Hecî bêyî tişteki bibêjê di hewşê de tûr diavêt. Ev tûra bîst û heştan bû ku

Sîno jî bi wî re diçû wî serî û dihat vî serî. Bi vê cewabê re, birînên wî ji nû de der bûbûn. Ew ji kuştina vî lawê xwe bêtir, vegeriyabû wê roja ku wî perçeyek ji kezeba xwe kiribû. Gulpa dawiyê li cixareya xwe xist, bi gihîştina agirê cixareyê ku tiliyên wî şewitandin, li xwe hay bû. Çû seriyê hewşê yê hêla bakur şipiya sekinî û piştî xwe da dîwêr. Sîno jî li kêleka wî sekinî. Nigên xwe dan ber hev û qederê niv metroyê bi pêş de dan. Berê piştî xwe û dû re jî serê xwe sipart dîwêr. Midetekê ziq li dîwarê rojava nêrî û paşê berê xwe bi ezmên vekir. Ber êvarê bû, lê hîn li ezmên sitêrk xuya nedikirin. Ji hehecîk û ebabîlkan dîlanek li ezmên geriyabû. Ji şîre şîra dengên wan dîwarên hefsê dihejîya. Li hewşê, girtiyan bi sê-çar qolan tûr diavêtin. Ji bilî Sîno tu kes li cem wî tune bû. Sîno xwest ku xwe bera ser tutikan bide lê qêmiş Hecî nedikir ku wî bi tenê bihêle. Nigên wî ricifîn, piştî wî hêdî hêdî bi wan xiramên dîwêr re şemitî. Berê çongên wî fisiyan û dû re li ser hêla xwe ya rastê weke şekekî li erdê ket. Ji ser hişê xwe çû... Bi ketina wî re hemû girtî li ser serê wî vehewîyan. Yekî bazda hundirê qawîşê, qolanya anî û li ser çavên wî kir, paşê da ber bêvila wî. Ew bir li ser ranza wî danî...

Wê şevê, heta sibehê ew bi destan peyivî. Sîno jî ji ber serê wî ranebû. Gava serê sibehê bi xwe hisiya, serê wî pir diêşîya. Sîno hebeke novalgîn dayê û çû jê re qedeheke av anî. Piştî seetekê rabû ser xwe, çû daşîrê. Berê serçavên xwe

şûşt, dû re poşman bû û destmêjek girt. Limêja muxurbe, ya eşa û ya sibehê ku lê çûbûn, qeza kirin.

Roja din piçekî baştir bû. Ew û Sîno li ser ranzeyî Sîno rûniştin... Ew derneketin hewşê. Sîno carekê ji serî û heta binî li Hecî nêrî, destê xwe avêt kirçîka histuyê xwe, bi lez xurand. Ji xwe, hew li wî cihê ku dixurand por pêve mabû. Li gor temenê wî ne zêde mezinbû jî porê wî zû weşiyabû û wî şewqe jî nedida serê xwe. Tiliyên xwe tev derbas kirin û wek mirov pê li bendekeyeke hejîkên hîrokî bike, bû qirçe qirça tiliyên wî, carekê jî bi desteka tiliya xwe ya eşuhedê pê li ya girdikê kir, qirpandina dengê vê tiliyê ji yên din qalindtir derket. Sîno xwe li ber Hecî xweş dikir û ew tiştê ku ji serê heft mehan jê re bûbû meraq û ew culhetê ku bikaribe wê pirsê ji Hecî bike di xwe de nedidît, niha yet dikira bipirsiya. Wî careke din jî bihneke kûr kişand û got:

– Hecî! Ez dixwazim ji te... Lê Sîno li xwe fikirî û ew tiştê ku dikira bipirsiya, nepirsî. Peyiva xwe guherand û bi awayekî din domand:– Ez dixwazim ku kengî pêwîstiya te bi alîkariyê çê bibe, tu ji min re bibêjî. Ev serê heft mehan e ku em di eynî qawîşê de nin, ez wek birayekî xwe li te dinêrim û ez hêvî dikim ku tu jî min bi wî awayî bibînî. Hewce nake ku ez ji te re bibêjim û ji te re xweş bikim. Bi van gotinên Sîno re, Hecî piçekî fikirî û nola ku bizanibe mexseda Sîno ne ev gotin bûn. Lê Hecî di eynê xwe de dernexist û xwe ji bo ro-

jên pêş amade kir ku her gav Sîno dikare ji wî pirsra ku ew jê ditirse bike. Sîno di saniyeya dawiyê de fikira xwe guherîbû û pirsra dê wê rojê bikira, piştî hefteyeke din, di rewşeke ku Hecî piçekî kêfxweş bû pirsî.

– Birayê Hecî! Welêh, ev demek e ku ez dixwazim ji te pirsêkê bikim, lê ez her gav rewşa te didim ber çavên xwe û ez wê taqetê di xwe de nabînim ku bipirsim. Lê êdî nema di min de hiltê û ez dixwazim fêr bibim. Tu dizane ku di hefsê de, her gav pêwîstiya mirov bi însanekî ku mirov bikaribe jê re hundirê xwe veke, heye. Ez bala xwe didimê, tu heta nuha bi tu kesî re li ser sedema girtina xwe nepeyivî. Û ev çendak e ku ez xwe tije û vala dikim da ku ez bi te re li ser vê meseleyê bipeyivim. Lê min îro xwest ku ez xwe lê biqewimînim û ez hêvî dikim ku tu bi van gotinên min aciz nabî.

Weke ku Hecî li bende van gotinan bû, qet xwe aciz nekir. Di hewşa qawîşê de tûr diavêtin. Bi van gotinên Sîno re, bêdengiyek çêbû. Du tûran çûn wî serî û hatin vî seriyê hewşê. Hecî li orta hewşê sekinî... Destên xwe dan paş xwe û li çavên Sîno nêrî... Midetekê bêyî ku tiştekî bibêje, ziq li çavên wî nêrî. Hecî du caran li Sîno bû. Bi van nêrinên Hecî re, her ku diçû Sîno hûrikir dibû. Sîno nema dikarîbû berê awirên xwe ji Hecî daguheranda. Bi van nêrinên Hecî re, wek Sîno poşman bûbe ku ew pirs jê kiribe. Tu nema bû ku Sîno here destê wî û izra xwe jê bixwaze. Herdu jî

midetekê li orta hewşê weha bêdeng sekinîn. Sîno destê xwe da piştê Hecî, got:

– Ka em tûra xwe dewam bikin.

Hecî:

– Na, na... Ka em bîstikekê rûnin. Herduyan xwe li ber dîwarê hewşê bera erdê da û Hecî keserek ranîşt. Hecî dikira dest bi peyivê bikira, Sîno got.

– Birayê Hecî! Ger tu naxwazî, dev jê berdî. Hecî careke din jî bi dûçika çavan li Sîno nêrî û got:

– Lawo, ne ku ez naxwazim, lê... Ez çawa bibêjim. Ev çîrokeke dûr û dirêj e, Xwedêteala bi serê tu mexdûqî de nîne.

– Min lawê xwe kuştiye û ez ji ber wê hatimim girtin... Ev lawik, ji jina min a duyem bû. Piştî du xwehan ew çêbûbû. Hîn ew donzdehsalî bû, min û dêya wî nema li hev kir. Ji bo ku ez di nav alemê de nehetikim, min ji jina xwe ya kevin û zarokên wê rica kir ku ez careke din li wan vegerim. Wan jî ev daxwaza min qebûl kir û careke din deriyên xwe ji min re vekir. Demekê bi vî awayî berdewam kir û piştî wê, ez yek caran diçûm cem wan û dihatim. Emirquto çendakî wendabû û piştî li malê vegeyaya, wî çûyina malê jî li ber min herimand. Di wê esnayê de li bajarê me kuştina însanên "qesas nediyar" dest pê kiribû. Piştî demekê, xelkê ji min re got ku lawê te jî yek ji wan kesan e. Di serê pêşî de, me zêde bawer nekir. Lê her ku çû ev gotinên xelkê bi awayekî din zêde bûn. Êdî, ji xelkê xerîb bêtir nas û dostên me gazindên biheq dikirin. Gelekan

bi çavên xwe dîtibûn ku wî çend kesên miletperwer kuştin. Ez nema dikarîbûm derketama sûkê. Herkesî ez nas dikirim û dizanîbû ku ez mirovekî miletperwer im. Gelek caran ku ez di sûkê re derbas dibûm, dengê xelkê diket guhên min, digotin, "Tu ji xwe re bala xwe bidê, ew ji xwe re dibêje ku ez miletperwer im û ji hêlekê de lawên wî di zindanan de û li serê çiyar in û ji hêla din de jî lawê wî bûye "sofi" û rojê çend însanên feqîr û fuqare dikuje..."

Min çend caran hewil da ku ez wî li ber van tiştan bixim, lê mêrik qet li min guhdarî nedikir û nedixwest bi min re mihatab bibe. Min dêya wî bera pêxîla wî da, nebû. Min nas û dost lê rakirin, nebû. Birayên wî yê li çiyê û yê di hefsê de, jê re cewab şandin, nebû. Wî xwîna xwe xistibû çavên xwe û li tu kesî guhdarî nedikir. Sîno peyva Hecî birî.

– Ma te nîkarîbû ew bida destê polîsan?

Hecî keserek rahnîşt û dîsa domand:

– Ma min ê çawa ew bida destê polîsan! Ji xwe, polîs jî hevalên wan bûn û ya din, ma bi min diket ku min îxbarî bikira! Ji xwe heroduro li ber çavên polîsan û di orta sûkê de, xelk dikuştin. Herî dawîyê jî dostê min î herî sadîq, ew ê ku ji birayê min bêtir nêzî min bû, kuşt. Him jî ew li ber çavên min kuşt. Ji xwe di vî bajarî de, ew ê ku ez bi ser de diçûm û dihatim, ev dostê min bû. Dikana wî di sûka qaçaxçiyar de bû. Ez her roj diçûm dikana wî. Min qet firset nedîta jî ez di ber dikana wî re derbas

dibûm û min silavek lê dikir.

Wê rojê jî ez çûbûm ba wî... Ez ji dikanê derketim û qedere deh gavan ji dikanê bi dûr ketim, bû teqîn. Ez li paş xwe zivirîm ku lawê min û yekî din î birîh, herkê devançeyek di destê wan de, bazdidin. Ez bi rev, berî herkesî çûm hundirê dikanê. Dostê min î Şemso di nav xwîna de ramedandî bû. Hîn ruh jê neçûbû... Min destên xwe di bin serê wî re rakir û ew piçekî bilind kir. Wî hew bi çavên melûlî û bi awayekî bêhêvî li min nêrî û nîkarîbû tiştek bigota. Min histuyê xwe zivirand û min li pişt xwe nêrî. Hemû ew kesên ku li devê dikanê vehewiyabûn, bi çavên sîncaran li min mêze dikirin...

Sîno bala xwe dayê ku hêsir ji çavên Hecî diherikin. Destmala xwe ji bêrika xwe derxist û dirêjî Hecî kir. Hecî hêsirên xwe paqij kirin û li dora xwe nêrî. Kesek li giriyê wî hay nebûbû. Sîno cixareyek vexist û dirêjî wî kir. Wî xwest fişke, lê qêmîştî destmala Sîno nekir. Berê xwe ji Sîno û ji wan kesên ku di hewşê de tûr diavêtin guherî û fişkir erdê. Destê xwe di paş xwe de da û bi binê sola xwe ew şotika ku herikîbû, di erdê de da ... Sîno li Hecî dinêrî û bi vî halê Hecî re xwe wek sîncar didît. Lê Hecî carekê dest pê kiribû.

– Di ser kuştina Şemso re du roj derbas bûn. Min di wan du rojan de, çî dîtin û çî nedîtin, hew Xwedê dizane. Ez wan du rojan û çar rojên din jî li dû wan du rojan, di malê de mam. Min pir da û sitend... Min nema dikarîbû

rêyek jê re peyde bikira. Ez hîn di wê gerînakê de bûm, ji terefê lawê min î li çiyê, ji min re pisûlayek hat. Ew pisûlala ya ji min re jî bû sedema ku ez di biryara xwe de bigihêjim qeneeta dawîyê.

Piştî kuştina Şemso, roja heftan ez ji malê derketim. Min rast berê xwe da mala dêya wî. Dêya wî jî ji van kirinên wî aciz bûbû. Bêyî ku ez derbasî hundir bibim, min li wî pirsî. Dêya wî bersiva ku ev çend roj in ew nayê malê, da min. Esira teng bû... Min berê xwe da camiya li hemberî qereqolê. Ew tim diçû wê camiyê. Min destmêjeke teze girt. Ez derbasî hundirê camiyê bûm. Pirtî kêr xelk dihatin wê camiyê. Bi pirayî ew ê ku wek lawê min bûn diçûn wê camiyê. Min çavên xwe li nav însanên ku di camiyê de hebûn gerandin...

Qardiyar ket devê derî... Hewceyî ku tiştê bigota nedikir. Wexta girtina deriyê hewşê hatibû. Hecî peyîva xwe qut kir û rabû ser xwe. Sîno jî ji ser tutikan rabû. Bi rabûna Sîno re, li ber çavên wî reş hat. Xwe bi dîwêr girt... Piştî deh-panzdeh saniyeyan ew pêla derbas bû... Çûn hundirê qawîşê, li ser ranza Sîno rûniştin. Hecî li ser ranzeyê çarmêrkî veda, Sîno jî li seriyê din pala xwe da nigê ranzeyê. Hecî ji cihê ku lê mabû dewam kir:

– Nêzî muxurbeyê bû, ez dîsa çûm mala dêya wî. Ew dîsa ne li malê bû... Dêya wî li min ecêbmayî mabû ku di hundirê du seetan de, ev cara duyem bû, min lê dipirsî. Ez dîsa di nigê de vegeriyam. Bi vegera min re, li devê deri-

yê hewşê, ez li wî rast hatim...

Wexta ku Hecî dikira qala vê sahneyê bikira, wecê wî zer bû, destên wî diricifin. Sîno ev haletê Hecî ferq kiribû. Rîca ji Hecî kir ku ew meseleyê li vira biqedîne... Hecî piştî xwe sipart dîwêr. Cixareyêke din jî vêxist...

Di ser girtina Hecî Sîyamed re şeş sal derbas bûn. Ji ber cezayê wî hindik mabû û rewşa wî ya di hundirê hefsê de, ji terefê îdareya hefsê ve bi başî hatibû raporkirin; di cejna Remezanê de, ji bo pênc rojan îzina eydiyê jê re derket. Roja kulîçikan bû... Hecî çû bajarê xwe... Li xeraca otobusan ket texsiyêkê û berê xwe da malê. Li devê deriyê malê, hemê kuffetên wî sekinîbûn. Cîranên der û dora wan jî bihîstibûn ku Hecî dike were, wan jî serê xwe di pencereyan re derxistibûn û li rêya Hecî dinêrin. Hecî ji texsiyê peyabû û bi awayekî qudîmşikestî û bi gavên fisek ber bi kuffetên malê ve diçû...

Keça Hecî ya mezin, di pêşiya hemû kuffetên malê de, li devê deriyê hewşê bi bergiya wî ve çû. Hecî bi wecekî bêhêvî mizicî... Ew jî bi bergiya wan ve diçû... Berê Hecî ket keça wî û ew awirên wê, ji wî re saweke mezin ku bîhna mirinê jê dihat çêkir. Li devê deriyê demariya xwe û li nêzî çiyê ku Hecî perçeyek ji kezêba xwe kiribû, keça wî ew tiştê cemidî ji wê paxila xwe ya germ derxist û berê wê da Hecî. Efûya Hecî ji bo cejna Remezanê ji terefê dewletê ve derketibû, lê ji terefê keça wî ve!... □

Sala 2000î

ZANA FARQÎNÎ:

"Ditina her peyvekê bi serê xwe hez û dilşahiyeke e"

Hevpeyvîn: **SALIHÊ KEVIRBIRÎ**

SALIHÊ KEVIRBIRÎ: *Çi bû sedem ku tu dest biavêjî vî karî?*

ZANA FARQÎNÎ: Jixwe ji dibistana seretayî meraqa zimanê kurdî bi min re çêbûbû. Min zimanê kurdî û tirkî dida ber hev. Min digot, di tirkî de qertafa dema niha 'yor' e û tê paşiya peyvê, lê gelo ya me çi ye? Li ber destê min jî tu çavkanî tune bûn. Ev rewş, heta dibistana navîn berdewam kir, ta ku Mem û Zina Eh medê Xanî kete destê min. Hevalekî min ji min re behsa wê kiribû û li mala wan hebû, wî ev berhem dabû min. Erê me li ser dîwaran hin sloganên bi kurmancî dixwend û didîtin, lê cara pêşîn bi alfabeya kurdî ya latînî ev berhem kete destê min. Ew bû mamosteyê min. Min pêşî xwe bi wê hîn kir. Lîsê û heyna (çaxê) zanîngehê ango unîversîteyê jî ev eleqe û xebatên min ên li ser zimên berdewam kirin.

Li Stenbolê piştî ku Navenda Çanda Mezopotamyayê vebû, em derbasî wê bûn û di desteya karê nivîsaran a kovara Rewşenê de me cih girt. Bi vê pêngavê, êdî em ketin nav kar û barê weşangeriya bi zimanê kurdî. Em bi wê jî neman û tevî xebatên derxistina rojnameya heftane ya Welat bûn. Piştî ku Welat hate girtin îcar Welatê Me derket. Di Welat de min karê redaktorî û editoriyê kir. Di Welatê Me de, ji bilî van karan bi awayekî fermî me Berpirsiya karê nivîsaran girte ser xwe û pişt re em bûn gerîndeyê wê yê weşanê jî. Di pey wê de Azadiya Welat dest bi jiyana xwe ya weşanî kir, ku hîna jî bi domdarî derdiçe. Di wê de jî di sa me erka gerîndeyê weşanê pêk anî. Heta cezayê ku min ji ber berpirsiya karê nivîsaran xwaribû, ji min re bû asteng min karê xwe yê rojnamegeriyê li wê domand.

Ji ber çi ez van daxuyaniyan didim, ji ber ku di vê pêvajoya rojnamegeriyê de pêwîstiya ferhengê xurt a kurdî- tirkî, tirkî -kurdî xwe da aşkerekirin. Li ber destê



Ji milê çepê ve Zana Farqîni û Salihê Kevirbirî

me tenê ferhengêke ku bi kêrî me dihat hebû. Ferhenga D. Îzolî. Yên din têra me nedikirin. Êdî çêkirina ferhengê xwe li me ferz dikir

– *Ev ferhenga qerase çawa hate pê?*

– A rast pêşî rojnameya rojane Demokrasiyê, teklîfêk li min kir ku ez ji wan re ferhengokekê amade bikim, ku ew jî wê wek diyarî bidin xwendevanên xwe. Pêwîstbûna ferhengê ji zû de bi min re çêbûbû û min dixwest ez karekî wiha bikim. Ev yek jî, ji min re bû wesîle ku ez zend û bendan badim û dest biavêjim vî karî. Jixwe çaxê ku min berhemên bi kurdî dixwendin, min ji wan peyv derdixistin. Dikarim bibêjim ku min tu berhemên bi kurdî ji dest bernedidan; cureyên wan çî dibûn bila bibûna. Ev rewş hîna dewam dike.

Wêrekî û cesaret bi min re çêbû û min xwe li karekî wiha dijwar ku sebr û sema-xê dixwaze qirase kir. Piştî ku min zemîn ji vî karî re amade kir û çend mehan li serê xebitîm, li ser daxwaza Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, êdî ev xebat li ser navê wê hate amadekirin.

– *Ji destpêkê heta îro merhaleyên amadekirina ferhengê tu karî ji me re behs bikî?*

– Me berê hinek behsa destpêka amadekirina ferhengê kir, lê min divê ku ez çend gotinên din li wan zêde bikim. Beriya ku ez dest biavêjim çêkirina ferhengê,

bi hêsanî ez dişem bibêjim ji deh salan zêdetir bû ku ez bi berhevkirina peyvan û zebata li ser zimanê kurdî bilî dibûm ango pê mijûl dibûm. Lê belê amadekirina vê ferhengê sê sal û nivê gilover kişand. Di vê heyamê de ez bi tu karekî din daneke-tim. Çend xebat û karên taybet ne tê de, ez bi şev û rojan li serê xebitîm. Ji min re dem û saeta xebatê ne girîng bû. Me xew jî li xwe herimand û em jî bînaya çavan jî hinek bêpar man. Heta me di ber de por spî kir. Beriya ez dest biavêjim karê amadekirina ferhengê, min di çapana xwe de lêkolînek li ser ferheng û cureyên wan kir. Min çend berhemên teorîk ên der barê vî warî de xwendin û ji wan sûd û kelk wergirt. Her wiha der heqê azîz û metodan de ez agahdar bûm.

– *Ji aliyê dîtbarî, naverok û teknîkî ve tu dikarî ferhengê bi me bidî nasandî?*

– Ferheng li gor rêbaz û azîza ferhenga berfireh hatiye amadekirin. Her wiha ev ferheng ferhengeke du zimanî ye. Bi gotineke din, ev ferheng ferhenga zimanê tirkî û kurdî ye. Me li hemberî peyva zimanê tirkî kurdiya wê daniye. Ji bo ku peyv baş bê fêmkirin me hevokên nimûneyî jî dane. Ev yek jî têr nake; me cureyên peyvên kurdî dane diyarkirin, bê ka navdêr e, rengdêr e, daçek e, nêr e, mê ye çi ye û hwd... Me cureyên peyvan bi karakterên îtalîk, peyvên tirkî û hevokên nimûneyî jî bold dane. Her wiha me cih daye biwêjan ango îdyoman jî.

Di ferhengê de 40 hezar peyvên serê madeyan ên tirkî hene û ji 15 hezarî jî bêhtir biwêjen wê hene. Lê kurdiya wê ji van hejmaran pirtir e. Çimkî di zimanê me de peyvên hemmane hem zêde ne û hem jî navê tişteyan (objeyan) ji yên zimanê tirkî zehfîr e. Bi kurtî, gencîneya peyvan a zimanê kurdî ji ya zimanê tirkî zêdetir e. Lê tişteke heye ku divê mirov bibêje. Zimanê me bi qandî yê tirkî bi pêş neke-tiye, bi qasî wê ne pratîk e. Bikarhênerên wî zimanî ji yên me zêdetir in. Sedem çî dibe bila bibe ev jî rastiyeke e.

Ferheng di ebara kaxizê A4 de ye. Dirêjayî 24 cm û berayî jî 17 cm ye. Hejmara rûpelan jî 1278 e.

– *Roj çêbûn ku te got; "Ezê dev jî vî karî berdîm!"*

– Heke ez nebêjim di wexta amadekirina ferhengê de ez qet zivêr û aciz nebûm, ne rast e. Ne carek ne dudo, ez pir caran ditengjîm û min dixwest ku ez dev jê berdîm. Ji lewre gelek dijwarî û çetîneyî derdiketin pêşberî min. Ev asteng pirhêlî bûn. Ji rewşa aborî bigirin heta bi ya manewî. Dilşikestîbûn û dilmanî bi min re çêdibûn. Desteka malbatê û piştevaniya hevalan dikirin ku ez car din li xebatê sor bibim.

– *Nêçîriya peyvan hiseke çawa bi te re peyda dike?*

– Bi rastî, hîna min dest bi amadekirina ferhengê nekiribû ev navê hanê, yanê

'nêçîrvanê peyvân' bi dû min ketibû. Çaxê ku ez li rojnameyê dixebitîm, nemaze gava ku kurdên me yên Başûr dihatin cem me rojnameyê, min ew bernedidan. Peyvên ku ji me re lazim bûn û yên ku ez li kurdiya wan digeriyam, min ji wan pirs dikir. Ev rewşa min bala gelekî kişandibû. Jixwe gava ku em ketin nav vê kefteleftê, hey car ev aliyê me xwe da der.

We got, ma ev rewş bi we re hesteke çawa çêdike. Dîtina her peyvekê bi serê xwe hez û dilşahiyeke e. De îcar peyv peyveke wisa be ku tu bi taybetî li pey î. Rewş nayê salixdan. Baskên min hebin ez dê bifirim. Ez bi xwe bi berhevkirina peyvân tamişim. Tu car kaxiz û qelem ji min xalî nabin. Her civata ku ez tê de bim, ne mim-kûn e ku sohbet li ser ziman çênebe û ez jî kaxiz û pênuşê ji berîka xwe dernexim û peyv û bêjeyan tomar nekim. Ev bi min re bû wekî nexweşinekê. Na na bûye vîrûs û ketiye canê min.

De wisa hesab bike, çî berhem û esera ku ez bixwînim gerekî ez jê kelîme û biwêjan derxim. Lê tengasiyeke min heye, ev rewşa hanê ji min re dibe asteng û kelem. Nahêle ku ez tehm û çêjekê, lezetekê ji berhemê bibînin. Her hişê min li ser van peyvân e ku ji min re biyan û xerîb in, ku an ez tu car rastî wan nehatime an jî di wate û maneyêke din de ne.

– *Ku tu vê xebatê û yên din bidî ber hev, di warê ferhenga kurdî de dê tu çî bibêjî?*

– Ne tiştêkî xweş e ku meriv bi xwe nixandina berhema xwe bike. Divê ku ev yek ji hêla kesên din ve bê kirin. Çî ji me hatiye, li gorî zanîn û derfetên xwe me kiriyê, rexnekirin û hilsegandin gerek bikarhêner, nemaze kesê pispor bikin da ku mirov bi şaşî û kêmasiyên xwe bihese. Ev e serê salekî ye ku ev berhem derketiye, tenê yekî ji Bakûyê bi awayekî nivîskê ji me re nixandinên xwe yên li ser ferhengê şandibûn. Em li bende û hêviya wan kesan in.

Heta niha reaksiyonên baş hatine, ev jî tev bi devkî ji me re hatine gotin. Em ji bîr nekin ku adetê nivisandinê li cem me hîna bi pêş neketiye. Daxwaz û xwesteka me ev e: Çî kesê ku rahiştiye ferhengê û li gorî xwe, li gorî zanîn û pisporiya xwe çewtî û kêmanî tê de dîtine me divê ku wan tiştan ji xwe re, ji derdorê xwe bi tenê re nehêlin, bila bi awayekî nivîskî bigihînin me. Ev yeka hanê pêk bê kara wê ji me tevan re heye.


Gorîna dawî, min divê ku ez tiştinan vebêjim. Heke ne ji xebatên beriya me bûna, bêdilxuşûşî, bêşik û guman ferhengeke wiha nedihate pê. Ligel vî qasî, ew kesên ku peyv ji me re şandin û hevalên ku alîkarî dan min ji vê xebatê ne bêpar in. Mala wan tevan ava be, ku bi qasî serê derziyê be jî sûd û feydeya wan gihîştîye vê xebatê. □

Diyalektîka tenêtiyê

OCTAVIO PAZ

Tenêti ew e ku mirov xwe bi tenê his dike, xwe bi tenê dibîne, ji dinyayê cida, xerîbê xwe û ji xwe qutbûyî ye. Ev celebê tenêtiyê ne bi tenê ji bo meksîkiyan karakterîstîk e. Hemû mirovên dinyayê carekê ji caran xwe bi tenê dibînin û bi tenê ne. Jiyan ew e ku mirov xwe ji dema buhurî rizgar bike, da ku mirov bibe ewa ku mirov ê bibe, ango jiyânê bibe pêşerojê ne diyar û biyan. Tenêti ji bo daxwazên mirovan bingehê kûrtirîn e. Mirov yekemîn benderuh e ku xwe bi tenê dibîne û li têkiliyan digere. Xwezaya mirovan - ger mirov karibe ji bo cinsê xwe behsa xwezayê bike, ji ber ku mirov yekemîn benderuh e di wê riyê de xwe bi tenê dîtiye û ji xwezayê re gotiye "na" - mirov li dû wê yekê ye ku rastiya xwe di yekî din de bibîne. Mirov hêvî û lêgerîna komê ye. Her cara ku mirov xwe nas dike, an mirov bêriya hinekî din, an jî tiştekî din dike -mîna tenêtiyê.

Zarok bi cîhana der û dorê re yek e; jiyaneke pak, xav û herikbar e, xwe nas nake. Di çêbûnê de, em têkiliyên xwe ji korejiyana malzarokê dibirin, ku li wir tu navbir di navbera şabûn û têrbûnê de tune ye. Em hisa jiyânê ji cidabûn û navbirdayînê, ji bêalîkariyê û ji jiyana nenas werdigirin. Her ku em mezin dibin û digihîjin, kevnehisa me jî derbasî hiseke tenêtiyê dibe û paşê jî derbasî têgihîştinekê dibe ku me dike mehkûmê jiyana tenêtiyê. Herweha em têgihîştina zorbirina tenêtiyê jî bi dest dixin û em wê bi pêşerojê bihiştî ve girê didin ku em bi jiyânê ve kirine



Octavio Paz di 1914'an de li Meksikoyê ji diya
xwe bû. Di 1933'an de pirtûka xwe ya yekemîn;
"Hiva Çolan" weşand. Di 1990'î de
Xelata Nobel ya edebiyatê girt.

yek. Hemû xebat û keftelefa me ji bo nehiştin û avêtina tenêtiyê ye. Du navero-kên hisên tenêtiyê hene; yek jê ew e ku mirov xwe nas bike, ya din jî mirov ji xwe bi dûr bikeve. Hisa tenêtiyê ku bi xwe maneya jiyana me ye, ceribandineke ji holê-rakirina hemû tirs û şikan e. Yekbûn û ji nû ve yekbûn, bêhnberdan û şahiyê di xwe de hildigirin. Yekbûna bi dinyayê re di dawiya labîrenta tenêtiyê de li benda me ye.

Em dibînin ku tenêti li ba gel dibe eş. Êşa evîne eşa tenêtiyê ye. Bihevrebûn û tenêti û hesreta evîne dijmaneyên hev in, lê di eynî demê de hevdu tamam dikin. Û hêza tenêtiyê ya hêsan û azad, bi zanebûneke jîndar, dike ku mija li ser guneh û sû-can zelaltir diyar bibe: "Mirovê bi tenê ji destên Xwedê filitiye". Tenêti êşkişandî-nek e, bi gotineke din sûc û cezayek e. Ew cezayek e, lê di eynî wextê de soza dawî-hatina jiyana surgûnê ye jî. Hemû benderuh bi vê diyalektîkê ve mişt in.

Zayîn û mirin serpêhatiyên tenêtiyê ne. Em bi tenê tîn dinyayê. Tiştêkî bi qasî dema zayîne zehmet tuneye, bi tenê tiştêk heye, ew jî mirin e. Hebûna mirîne ji nişka ve derbasî mêjî dibe û mirîne di bîra mirov de tine. Zarok û mirovên prîmî-tîv bawerîya xwe bi mirîne naynin: ya rastî ew nizanin ku mirin heye, lê belê mirin bi dizî di hundurê wan de tevdilive. Ev keşîfa han, li ba mirovên medenî, zû tê za-nîn, hemû tişt me ji mirîne haydar dike û jê re amade dike. Bi kurtî, ji berdêla ku em hînî jiyane bibin, em hînî mirîne dibin. Û em hînî ya ne baş dibin.

Jiyana me di navbera zayin û mirîne de diçe û tê. Derketina ji malzarokê, destpê-ka tirsê ye, qevzeke talûke ye, rastî ye, ev yeka han heta mirîne destê xwe ji qirika mirov dernaxe. Mirin, vegera destpêka çêbûn û jiyane ye. Jinûvejiyan jiyana berî çêbûn û zayîne ye, ku wê demê aramî û tevger, şev û roj, dem û herheyî ne dijma-neyên hev in? Mirin ew e ku mirov qet namîne û hew dijî? Belkî jî mirin jiyana rastî ye? Em nizanin. Lê digel ku em nizanin, em bi hemû hêza xwe ji wan bûyerên ku eşê didin me direvin. Hemû (Zanebûn, dem, fêhmkirin, urf û adet) hewl didin ku mirov ji jiyane bikin der, lê di eynî demê de ew mirov ber bi paşerojê ve didin ajotin û ber bi cihê ku mirov jê hatiye ve dişînin. Û em evîneke xurt dixwazin, ku birçiyê yekbûn, ketin û mirîne ye, bi qasî jinûvejiyanê ye, -ku ew ê perçeyek jiyana rastî û perçeyek mirina rastî bide mirov. Em kêliyekê jî ji dewlemendiya jiyane dil-şahî û rehetiyê naxwazin, ku li wir bi peymanî jiyana û mirîne, dem û herheyiyê, gotinên dijhev di hev de dihelin û dibin yek. Em bi awayekî ne zêde zelal dizanin

ku mirin û jîyan nerînên eynî rastiye ne, li dijî hev in, lê hevdu temam jî dikin. Afirandin û wêrankirin di bûyera evîne de di hev de dikelin û mirov di kurtekêliyekê de xwe di rewşa herî pak de dibîne.

Li cîhana me, evîn hema hema tecrubeya dereceya negihîştinê ya herî bilind e. Hemû tişt, yanî exlaq, sinif, qanûn, nijad û evîndar bi xwe jî li dij in. Jin ji bo mêran hertim bûye ya "duwemîn", hem bûye diymaneya peyayî hem jî ew temam kiriye. Aliyek ji daxwaza me hertim bêriya yekbûna bi jinê re dike, lê aliyê din jî me jê vediqetîne, wê bi zorê ji me bi dûr dixê û li derve dihêle. Jin alavek e, ew carinan alaveke pir bi qîmet e, carinan jî kêmqîmet e, lê hertim guherî û cihê ye. Peya jinê ji bo xwe, ji bo bêbalansiyên hemû întresên xwe, ji bo valabûn û bêmaneyiya xwe, ji bo tirs û evîna xwe wê diguhere û dike alavek. Jin dibê alaveke ku mirov bi wê zanebûnekê bi dest dixê, çî kêf, çî şahî, çî jî riya gihîştina jîyanê be. Jin, li gora Simone de Beauvoir, îdol û Xwedayek e, dayikek e, pîrebokek û Xwedayeke stranbêjîyê ye, lê ew qet nabe ew bi xwe, ew hertim tişteki din e. Loma, di bingeh de pevgerêdanên me yê erotîk wêran û nepak bûne. Pîrebokek di navbera jin û mêran de xuya dibê, ew kirasê pîrebokî ye ku mêran jî jinan re dirûtiye, ew kiras e ku jin li xwe dikin. Em nikarin destê xwe bidinê, mîna em destê xwe bidin laşekî ji xwe bêhay, hingî ew laşê bêhurmet yê di navbera me û jinê de wenda dibê. Û bi vî awayî jin ne xwe nas dike, ne jî ji xwe têdigihîje, ew bi tenê objeyek e û ya "duwemîn" e. Ew nikare qet li ser xwe biryarê bide. Pevçûn û qerepera jinê hertim cihê ne; ew cihêti di navbera hebûna wê ya rastîn û wêneyê di derbarê wê de ne; ew wêneyê ku malbatê, sinifan, dibistanê, hevalên wê, dîn û hezkirê wê xêz kiriye. Jinîtiya wê qet berpêş nabe, ji ber ku ew bi forma ku ji aliyê peya ve hatiye afirandin berpêş dibê. Evîn ne aksiyoneke xwezayî ye. Ew tişteki mirovî ye, ya rastî ew ya herî mirovî ye, bi gotineke din ew afirandineke welê ye ku di xwezayê de peyda nabe...

- Dûmahik heye -

Wergera ji swêdi: **F. CEWERI**

Werger hinerek e

MUSTAFA AYDOGAN

Werger yek ji wan pirsan e ku di civaka me de, bi qasî ku tê xwestin ne hatiye minaqeşekirin. Di vî warî de, minaqeşeyeke pirhêl û bisewîye pêwîst e. Ji bo vê yekê, divê mirovên di vê qadê de dixebitin bi awayekî aktîftir beşdarî vê minaqeşeyê bibin. Hêvîya min ew e ku feydeyê fikirên di vê nivîsê de tên pêşkêşkirin ji bigihêje vê minaqeşeyê (qesda min minaqeşeya wergera kurmancî ye). Ez ji zû de difikirîm ku li ser wergerê û rola wê xebateke berfirehtir bikim. Min di destpêkê de nedixwest, ez qîma xwe bi nivîsekê bi tenê bînim. Ji ber ku li gora min, hinerê wergerê divê bi her awayê xwe ve û bi detay bê nivîsandin. Lê berfirehiyêke weha di çarçoveya vê nivîsê de hilnayê ku ji bo kovarekê hatiye nivîsîn. Loma ji divê mirov di destpêkê de bizanibe ku nivîseke weha dê nebe bersiva gelek tiştan. Lê tevî vê jî ez ê hewil bidim, da di vî warî de ji nav tiştên girîng, ên herî girîng hilbijêrim û bi awayekî weha li ser wan rawestim ku di çarçoveya vê nivîsê de hilên.

Werger pêwîstiyek e. Werger bersiva pêwîstiyekê ye. Ji gava ku mirovahî bi vê xusûsiyeta wergerê hisiyaye û heta nuha, ev pêwîstî zêde bûye û kêm nebûye.

Werger û rola ku wergerê di pêşveçûna ziman û edebîyata neteweyekî de, ya rastî bi giştî di pêşveçûna çanda neteweyekî de leyiziyê, hertim bûnin mijarên minaqeşeyê. Gelek netewe bi vê xusûsiyeta û tesîra wergerê hisiyandin û loma ji wan girîngiyêke mezin daye vî hinerî. Werger di navbera du kulturana de piyeyêke pir xurt û girîng e; di eynî wextê de, rêya diyaloga kulturana e. Ew meydana pêwendiyên kulturên cuda firehtir dike. Werger di warê dewlemendkirina ziman û kulturana de jî

xwedîya fonksiyoneke mezin e. Zimanê ku bû mijarê wergerê, êdî nema dikare wek berê bimîne. Ji ber ku werger zorê dide sînorên zimanan û firehbûnê li ser wan ferz dike. Neteweyên ku hayên wan ji vê yekê henin, ji bo ji nîmetên vî hinerî feydeyê bibînin, carinan seferberiyên mezin îlan kirinin.

Ger em dîr neçin, em dikarin nimûneya Tirkîyeyê bidin. Piştî ku Komara Tirkîyeyê ava bû, wezîrê kulturê di serî de, ji bo wergera klasîkên dinyayê seferberîyêke mezin dest pê kir. Bi saya vê helwêstê û hewildanên wê demê, di hindurê pêvajoyê de, berhemên Dostoyevskî, Tolstoy, Şolohov, Hugo, London, Stenberg, Gonçarov, Homeros, Voltaire û hwd hatin wergerandin. Ancax piştî wê, li Tirkîyeyê ji bo pêşdeçûna bi giştî edebîyatê û bi taybetî jî romanê, zemîneke pir baş peyda bû. Û îro ger edebîyata tirkî gîhaştibe qonaxekê, di vê yekê de para wergerê pir mezin e. Gelo îro, Shakespeare, Zola, Çehov, Dostoyevskî, Gogol û bi hezaran mirovên din, bi tirkî tune bûna, rewşa vê edebîyatê dê çawa bûya?

Bala xwe bidin cihanbûna berhemên nivîskarên Swêd û Norwêçê. Ez meraq dikim, ger ne bi xêra wergerê bûya, hayê kê dê ji berhemên Strindbergê swêdî çêbûbûya ku bi zimanê heyşt milyon mirovan (gava Strindberg sax bû, nifûsa Swêdê pir kêmtir bû) bi tenê hatinin nivîsandin. Gelo mirovên din dikaribû îmkan xwendina berhemên wî bi dest bixista? Gelo ew ê li dinyayê ew qasî bihata naskirin? Bi ya min, na! Ev giş bi xêra wergerê bûnin. Heger ne weha bûya, ji bo xwendina berhemên Strindbergê li vê quncika bakurê dinyayê, diviyabû hemû mirovên bi zimanê berhemên wî nizanibû, fêrî swêdî bûbûna. Ev ji bo Norwêçê ku nifûsa wê ji ya Swêdê jî kêmtir e, her weha ye. Knut Hamsun dîsa ne ji ber ku berhemên wî bi norwecî hatibûn nivîsandin, lê bi saya wergerên wan ên zimanên dinyayê yên din, bû beşekî jîyana herkesî. Na na, bi tenê mirovên Norwecê û kesên din ku fêrî norwecî bûbûn, dê berhemên Hamsun bixwendana. Vê yekê jî Hamsun nedikir malê dinyayê. Lê niha em dibînin ku ne Strindberg di çarçoveya Swêdê de maye û ne jî Hamsun di ya Norwêçê de. Herdu jî bi saya wergerê, bûnin malên dinyayê û nivîskarên cihanî. Hin şaş tê digihêjin, dibêjin qey gava piranîya hevvelatîyên deverêkê bi zimanên biyanî zanibin, pêwîstîya wergerê namîne. Ger weha bûya, divê Swêd yek ji wan welatan bûya ku werger lê pir kêmtir dihat kirin. Lê gava em bala xwe didinê, em dibînin; tevî ku piranîya swêdîyan bi çend zimanan dizanin jî li Swêdê, hejmara berhemên ku hersal werdigerin swêdî, gelek caran ji yên swêdî bi xwe, zêdetir e. Ev yek jî tesîreke mezin li edebîyata swêdî dike. Ji ber vê yekê, hin swêdî bi heq dipirsin: Gelo edebîyata Swêdê bê wergerên Shakespeare dê çawa bûya?

Bifikirin, ger em hemû klasîkên dinyayê wergerînin kurdî

Hinerê wergerê di jîyana gelên cîhanê de roleke pir êrênî leyiztiye. Lê kurmançiya me heta nuha jî bi qasî ku tê xwestin, an bi qasî ku heq kiriye, para xwe ji vî hinerî wernegirtiye. Em di vî warî de jî dereng manin. Ji ber vê yekê, ji bo werger di jîyana kurdan de jî rola xwe ya biderengkerî bileyize û di warê pêşveçûna ziman û edebîyata kurdî de, tesîra xwe bide xuyakirin, divê em vê qada jîyanê ya ku mîmarîyeke dîyaloga kulturana dixwaze, bi hosteyî bi kar bînin û ji nîmetên wê sûdê werbigirin. Ji her neteweyî bêtir, pêwîstiya neteweyê me bi wergerê heye. Werger li dijî asîmîlasyonê jî çekeke me ya xurt e, lê em qîmeta vê çekê, hê jî bi qasî ku pêwîst e, nizanin. Divê em hewil bidin, da em hemû klasîkên dinyayê wergerînin kurdî. Bifikirin, ger hemû klasîkên dinyayê bi kurdî hebin, gelo rewşa ziman û edebîyata me dê çi qasî bê guhertin? Gelo piştî peydabûna îmkanin weha, rewşa hin warên ku em xwe tê de qels dibînin, an em ji kêmanîyan gazindan dikin, dê çawa be? Li gora bawerîya min, me kurdan heta nuha ji fonksiyona wergerê, bi qasî ku tê xwestin feyde nedîtiye û divê em vê yekê, wek kêmanîyeke mezin qebûl bikin. Divê em hewil bidin û heta ji destên me bê, girîngiya wergerê aktuel bikin û di warê rola wê de bêtir şîyar bin.

Minaqêşeya pirsê wergerê di civaka me de, ne kevin e. Hêvîya min ew e ku ev minaqêşe dê bi sewîye bê birêvebirin, da encama ku tê xwestin, jê bê wergirtin. Ji ber vê yekê, ez dîsa dubare dikim ku divê ev pirs bi gelek alîyan ve bê minaqêşekirin û mirovên me di derheqê efekta wergerê de, baş bînin agahdarkirin.

Em pireyan dibînin, lê hosteyên pireyan nabînin

Di hemû demên dîrokê de, mirov dikare bi hêsanî bibîne ku neheqîyeke mezin li wergêran dibe. Em dibêjin ku ji bo ziman pêş de biçin, werger zorê dide sînoren wan. Em dibêjin ku dîyaloga kulturana, an pireya navbera kulturana, bi saya wergerê mumkun bûye. Baş e, gelo ev bi xwe çêdibin? Ma ne avakarên vê pireyê û vê dîyalogê henin? Ew jî wergêr in; mirovên ku bi vî karê girîng mijûl dibin û şîyana xwe dixin xizmeta dîyaloga kulturana... Lê gelek caran, tu kes ji me wergêran nabîne. Em behsa rola wergerê dikin, lê wergêr nayê minaqêşekirin. Em pireyan dibînin, lê hosteyên pireyan nabînin. Ji xwe, li gelek welatan navên wergêran nayên zanîn jî. Tevî ku wergêr tesîrên mezin li civakê dikin jî ne xuya nin. Gava ji hinan tê pirsîn jî rûyê xwe diqermeçînin û dibêjin, ma wî/wê çi kiriye? Xelkê nivîstiyê û wî/wê jî wegerandiye. Ma tu dibêjî qey dinya fetih kiriye.

Ez li dijî vî awayê rêgihîştinê derdikevim û vê yekê wek neheqîyeke mezin îlan dikim. Ew mirov ji bîr dikin ku ew bi saya wan wergêrên ku ew bi hêjayîya karên wan zêde nizanin, dikarin di ser pîreyên ku wan ava kirinin re derbas bibin û xwe bigihînin çandên gelên cuda. Ev neheqîyek e ku li wergêran tê kirin. Ji bo nemana neheqîya di vî warî de jî mînaqeseyên weha girîng in.

Septuaginta û dîroka wergerê

Di dîroka çand û zimên de, cîhektî wergerê yê pir girîng heye. Ji xwe, dîroka wergerê vê yekê bi awayekî pir zelal nîşan dide. Di pêşveçûna zimanê wergerê de jî roleke wergerê ya berbiçav heye. Gelo hinerê wergerê çawa dest pê kir? Pirtûka ku cara yekem hat wergerandin, kîjan e û ev li ku pêk hat? Li gora nivîsa André Lefereve ku yek ji wan beşên pirtûka Lars Kleberg (Bi gotineke din) e, dîroka wergerê li wela-tên rojavayî, bi wergera Ahîda Kevin dest pê kiriye. Li gora eynî nivîsê, desthilatdarê Misirê Ptolemaiosê Duyem dibîne ku li koloniyên Misirê, xelk êdî nema dikare Ahîda Kevin bi zimanê orîjînal bixwîne. Ji ber vê yekê, ji Qudusê dixwaze ku Ahîda Kevin wergerê zimanê grêkî. Li gora ku tê gotin; ji bo vî karî, 70 kes ji Qudusê diçin Îskenderîyeyê. Her yek ji wan dikeve hicreyekê û heta ku wergerê diqedînin jî pêwendiyên wan bi hevdu re çênabî. Di dawiyê de, Septuaginta werdigere zimanê grêkî û bi vî awayî li Rojavayê dîroka wergerê jî dest pê dike. Di derheqê tarîxa wê de, agahdarîyeke zelal tune ye; li hin deveran bi texmînî, behsa BZ (Berîya Zayînê) salên 200î tê kirin û hin jî dîsa bi texmînî dibêjin; salên BZ yên navbera 300-100î.

Septuaginta navê wê pirtûkê ye ku hatiye wergerandin. Septuaginta bi zimanê latînî, tê mahneya 70yî. Ji ber ku 70 wergêrî ev pirtûk wergerandiye, bi latînî jê re dibêjin; "Septuaginta". Li gora agahdarîya eynî nivîsê, ev pirtûka ha, pirtûka yekem e ku hatiye wergerandin.

Ji Septuaginta û pê ve, werger di dîroka geşbûna medenîyetan de, dest bi tesîra xwe ya bêhempa dike. Ger em bala xwe bidin edebîyata romayî ya klasîk, em ê bibînin ku ger ne efekta wergerê bûya, belkî ew ê bi vê ihtîşama xwe peyda nebûya. Ji ber ku ev lîteratur bi awayekî xurt li ser bîngehê wergera ji zimanê grêkî geş bû. Latînî bi saya wergerên ji grêkî gul veda. Loma mirov dikare bi hêsanî bibêje bike ku di avakirina medenîyeta Ewrûpayê de, keda wergêran roleke bîngehî ye. Ev jî diyar dike ku hinerê wergerê ne bi tenê îroj, herweha ji dema wergera Septuaginta-yê û vir de ye ku bi keda xwe beşdarî xurtkirin û geşkirina medenîyetê dibe. Gava

dêrê li Ewrûpayê bi qaîde, bi şertên xwe yê taybetî û bi qedexebûnê zor da vî hinerî, an rê li ber geşbûna wî girt, wergerê li Rojhilata Navîn îmkanên pêşdeçûnê peyda kirin. Ji dema helwêsta dêrê ya ku Ewrûpa kir girîngeha rewşenbîrîyê û pê ve, berhemên filozofên grêkî wergerîyan zimanê suryanî û farisî. Gava Ewrûpa di destê tarîfîya çaxa navîn de, ne di tu halî de bû, şewqa hinerê wergerê li Rojhilata Navîn belav dibû. Berhemên zaneyên grêkî û di serî de yê Aristoteles, ancax piştî geşbûna misilmanîyê û deshilatdarîya ereban û danûstendinên ewrûpayîyan û zaneyên ereban, dîsa bi saya wergerê li Ewrûpayê belav bûn û beşdarî amadekirina şertên ronensansa rojavayî bûn. Ji xwe heta wê çaxê, ereban hemû nivîsên Aristoteles wergerandibûn zimanê erebî. Ji ber vê yekê, ewrûpîyan di demeke dirêj de, hin berhemên wî ji zimanê erebî, hin jî ji zimanê grêkî wergerandin latînî û bi vî awayî, piştî demeke dirêj, hemû nivîsên wî li Ewrûpayê berdest bûn. Ji wê demê û vir de ye ku werger di pêşveçûna çanda ewrûpayî de, roleke sereke dileyize.

Dîroka pêşdeçûna edebîyata swêdî jî şahida wê ye ku hinerê wergerê li bakurê dinyayê jî roleke pir girîng lezitiye. Li gora nivîsa Lars Wollin (Wergera li Swêdê), wergerê di mahneya xwe ya nûjen de, bi Wehîyên Bîrgîtayê dest pê kiriye. L. Wollin di nivîsa xwe ya "Ji Bîrgîtaya Pîroz heta Barbara Carlândê" de jî îstatîstîkên wergerên sê peryodan; 1866-1870, 1926-30, 1986-1990 dide ber hevdu. Hemû jî pexşan in. Li gora agahdarîyên wî, di peryoda 1866-70yî de, li Swêdê 213 berhemên edebî hatinin wergerandin. Di peryoda 1926-30yî de, ev hejmar gîhaştiye 1490î û Di peryoda 1986-90î de jî 5 500 berhem hatinin wergerandin. Di eynî nivîsê de, îstatîstîkên berhemên ku zimanê wan î orijînal swêdî ye jî tîn dayin: Di peryoda 1866-70yî de, li Swêdê 187, di peryoda 1926-30yî de 1120 û di peryoda 1986-90î de jî 1 500. Yanî di 1866-70yî de, ji sedî 53yên hemû literatûra swêdî (%53) werger bûn; Ev di 1926-30yî de, ji sedî pêncî û heft (%57) in û di 1986-90î de jî ji sedî heftê û neh in (%79). Zimanê reqeman heye, ew bi xwe dipeyivin. Ji ber vê yekê, mirovên dibêjin ku hema hema nêvîyê kultura Swêdê werger e, ne neheq in.

Werger îro jî dewreyeke mezintir dileyize. Dîrok diyar dike ku pêwîstîya mirovan hertim bi wergerê hebûye. Lê ev pêwîstî di tu demên dîrokê de, bi qasî nuha derneketiye pêş. Her çî qasî hin dibêjin ku herkes bi çend zimanan dizanin, ji ber vê yekê rola wergerê dê di civaka nûjen de pir kêr bibe û heta pêwîstîya mirovan dê bi wergerê nemîne jî em di jîyanê de dibînin ku berevajîya wê, yanî pêwîstîya wergerê her ku diçe zêdetir dibe û kêr nabe. Îro bi tenê di nav sînoren Yekîtîya Ewrûpayê de, wergera ku herroj dibe, bi tu demên dîrokê re nikare bê miqayesekirin. Loma jî mirov dikare bi hêsanî bibêje ku werger di pêşveçûna Yekîtîya Ewrû-

payê de roleke girîng dileyize û projeya Yekîtîya Ewrûpayê jî ji bo geştirbûna hine-
rê wergerê îmkaneke mezin e.

Fikira li ser wergerê her hatiye guhertin

Fikira li ser wergera ku bi Septuagîntayê dest pê kir, di pêvajoya dîrokê de her hatiye guhertin. Demek hebû ku tiştê ji wergêrî/ê dihat xwestin, ew bû ku divê werger bi awayekî bihata kirin, da xwendevan bikaribin di wê nivîsê de, xwe bibînin û nas bikin. Ji ber vê yekê, wergêrî/ê dikaribû teksta orîjînal ji binî de biguherta, da xwendevanên wê demê bi hêsanî tê bigihêjin. Yanî karê wergerê, li gora hêvî û daxwazên xwendevanan dihat kirin. Lê demek hat ku durustîya bi tekstê û stîla orîjînal re bêtir derket pêş. Armanç ew bû ku xwendevan têkevin jîngeheke biyanî û bi awayê bikaranîna zimên ya guhertî re rû bi rû bibin.

Nuha jî di warê wergerê de lênerînên pîrf cuda henin. Hin dibêjin ku divê werger eynî gotinê bide; li gora hinin din, divê eynî fikirê bide. Tew hin dibêjin, gava ku mirov wê bixwîne, divê mirov pê nehise ku werger e, lê hinin din jî qîma xwe bi vê nînin û dibêjin ku divê wek wergerekê be. Hin henin jî girîngiyê bêtir didin stîla orîjînalê û hwd...

Bi giştî kategoriyên wergerê

Hin kategoriyên nivîs û wergerê henin. Gava mirov wergerê dabeş dike, li gora hin pîvanan, wê dike gelek beşan. Pîvana li gora qalîteya nivîsê, yek ji wan e. Di vê kategoriyê, wergera gotinên serbixwe, an fras û hevokên serbixwe heye. Nimûne: Raweste! Odeya mêvanan, Kişandina çixareyê qedexe ye. Nivîsên ku bi zimanên akademîk, an meslekî hatinin nivîsandin, wek nivîsên li ser hiqûq, tib, kîmya, komputurê û hwd; nivîsên edebî û helbest û heta wergera axavtinên filîman û hwd jî dikevin vê kategoriyê. Werger li gora pîvanên fonksiyona nivîsê û qada wê jî tê dabeşkirin. Dabeşkirineke din jî heye ku li gora meqseda wergerê, an armanca wergerê tê kirin. Ez naxwazim hemû awayên dabeşkirinê û pîvanên tînan bikaranîn, li vê derê binivîstinim. Ji ber ku ev nivîs ji xwe dirêj e, îcar ez naxwazim wê dirêjtir bikim. Lê ez dixwazim bi tenê hin rêzan li ser wê dabeşkirinê binivîstinim ku li gora meqseda wergerê tê kirin.

a- wergera pragmatîk

Di vê wergerê de, ya herî girîng mesaj e, naveroka teksta orîjînal e. Yanî agahdariya ku di tekstê de heye, ya herî girîng e. Uslûb û estetîk û hwd li gora naverokê,

ne zêde girîng in.

b- wergera poetîk û estetîk

Di vê wergerê de, ziman bi xwe pir girîng e. Heta, mirov dikare bibêje ku di wergerê weha de, ziman ji naverokê jî girîngtir e. Wergera bi vî awayî, dibe ku ji gelek awayên din diwartir be. Ji ber ku werger bi xwe hinerekî înemumkunî tê dîtin, îcar di nav vî hinerê înemumkunî de, wergera poetîk û estetîk a herî înemumkunî e. Di vî beşê wergerê de, belkî diwarfîyên herî mezin ji semantîk û morfosyntaktîkê bêtir, ji ber poetolojîya zimanê wergerê peyda dibin.

c- wergera etnografîk

Di vê wergerê de, wergêr forma zimên weha dike, da xwendevan bikaribin, tam têbigihêjin. Di vî awayî de, tesîra kulturê gelek e. Ji bo kulturên nêzikî hevdu, problemên pir mezin peyda nabin, lê ger kultur pirî dûrî hevdu bin, wê gavê, wergêr nikare qîma xwe bi wergera tekstê bi tenê bîne. Divê ew bi îzah û ferhengokê ve xwendin û têgihîştina naverokê hêsantir bike.

d- wergera lingvîstîkî û dîdaktîkî

Ev awayê wergerê bi piranî, ji bo danberheva zimanên cuda û analîzkirina wan tê bikaranîn. Mirov ji bo vê yekê, nivîsê morfem bi morfem werdigerîne. Ev ji bo miqayesekirina zimanan a ji aliyê strukturê ve, materyalekî baş pêşkêş dike.

Nimûne: Küçük kız Ahmet'in evini gördü.
Piçûk keçik Ehmed-GEN mal-POSS-OBJ dît

Wergera wê ya normal: Keçika piçûk mala Ehmedî dît.

Hin henin ku vê metodê di wergera nivîsên normal de, belkî di yên edebî de jî bi kar tînin û wê gavê tekstên pir ecêb ku di zimanê wergerê de nayên tu mahneyan derdixin ortê. Qesda min ne ew e ku mirov nikare vê metodê bi kar bîne, lê qesda min ew e ku bi vê metodê tu werger pêk nayê. Dibe ku mirov bi vê yekê ferhenga gotinên wê nivîsê derbixîne meydanê, da mirov bikaribe pê zimanê orjînal fêm bike. Lê divê bê zanîn; nivîsa ku derbikeve ortê, ji wergerê bêtir dê bişibe ferhengokê. Ji ber vê yekê, divê mirov ji derveyî hin armancên taybetî ku li jorê hatin diyarkirin, xwe nêzikî metodeke weha neke.

Werger mumkun e

Werger ji aliyê teorîyê ve ne mumkun e. Lê di pratîkê de mumkun e. Ger qesd bi

wergerê sûreteki ji %100 wek ê orijînalê be, yanî ne di warê efektê de, ne di warê stîlê de û ne jî di warê mahneyê de, divê milîm şaş nebe, an jî bi gotineke din, şert ew be ku ne di formê de û ne jî di naverokê de, guhertineke herî piçûk jî çênebe, wê gavê werger ne mumkun e. Lê tevî vê yekê jî dîroka hinerê wergerê şahida mumkunbûna wê ye û em bi xwe jî dibînin ku ev hinerê nemumkun, bi xebatên mirovan di pratîkê de mumkun bûye û nuha li unîversîteyan wek ilmekî tê qebûl-kirin û xwendin.

Ji ber vê yekê, werger hem zanistîyek e û hem jî hinerek e. Lê hinerekî pirî dijwar e. Hinerê wergerê hinerekî taybetî ye. Ew ne bi tenê zanebûnê, an pisporîyekê dixwaze, herweha hewildaneke dijwar, kedeke mezin jî dixwaze. Li gel şîyaneke binge-hî, cidîyet û berpirsiyarîyekê dixwaze.

Ger di nivîsekê de, his û îdyom tune bin, wergera wê hêsantir û mumkuntir e. Ez ê hevokê zimanekî biyanî wergerînim kurdî.

Bila hevoka me weha be:

Min di nûçeyên êvara îniyê de bihîst ku spîkêrî got; Do nîvrojê, êzingvanîyekî ji gundê Şêbê, hirçeke mezin kuştiye.

Wergera hevokê weha zêde ne zehmet e.

Ez agahdarîyên vê hevokê ji bo analîza naverokê rêz dikim:

- 1- Min di nûçeyan de bihîst
- 2- Nûçeyên êvara îniyê bûn
- 3- Spîkêrî got; Do nîvrojê, êzingvanîyekî hirçek kuştiye
- 4- Hirç mezin e
- 5- Êzingvanî ji gundê Şêbê ye

Tevî ku ev hevok hevokê ne zêde zehmet xuya dike jî dîsa li vê derê, çend xal, ya rastî çend feqên piçûk henin ku divê ez bala xwe bidimê, ew jî ev in; êvara îniyêroja pêncşemê ye û ji ber vê yekê, do nîvroj a di tekstê de, nîvroja çarşemê ye, spîkêr mêr e, êzingvanî mêr e, lê hirç mê ye. Di vê hevokê de, du lêkerên transîtîv henin û dema herduyan jî dema derbasbûyî ye. Ji ber vê yekê, divê ez li qaîdeyên ergatîva split miqate bim. Êdî piştî ku min rê li ber wendabûna naverokê girt û ji bo feqên rêzimanî tedbirên pêwîst wergirtin, divê ez li awayê orijînalê hûr bibim û vê naverokê, bi awayekî nêzikî awayê orijînalê bihûnim. Lê divê ev nimûneya besît ya li jorê, me nexapîne ku wergera hevokê edebî yê ji qewla me kurdan, his û îdyom tê de didin çîre vîtan jî ew qasî hêsan e. Ji ber ku ev wergera hevokê zimanê rojane ye û his û îdyom tê de tune nin, mirov dikare bi analîzê weha besît ji heq wergera wê derbikeve. Lê ferqeke mezin dikare di navbera wergera wê nimûneyê û

wergera hevokên çîrok û romanê de hebin û tew helbest bi xwe qet naşibin wê. Şî-yarbûna ku ji bo wergera hevokeke weha tê xwestin jî diyar dike ku werger bi xwe, ne karekî hêsan e.

Wergera berhemên edebî û hin sedemên astengiyan

Heçî wergera berhemên edebî ye, wergera herî dijwar e. Ji wan jî heçî wergera helbestan e, mirov dikare bibêje ku hema hema ne mumkun e. Ji ber ku wergera wan jinûvenivîsandin e, şirovekirin e. Ji xwe, li gora min, ger wergêrên helbestan bi xwe jî ne helbestvan bin, an jî ne ew mirov bin ku şîyana nivîsandina helbestan bi wan re hebe, wê gavê zehmetîya wê pirtir e ku mirov bikaribe wan ji nû ve binivîsîne jî. Tew gava ez li heksametreyî grêkî difikirim û wezina hece û arûzê bi bîr tînim, ez di warê wergera vî beşê edebîyatê de, bêhêvîtir dibim. Ev in, dibin sedem ku ez di warê wergera helbestan de bi raswas û dudilî bim.

Heçî wergêrên roman, çîrok û hwd nin, ger ne bi qasî wergera helbestan bin jî dîsa pir dijwar in. Ji ber ku di van berhemên de zimanekî rewan û formulasyonên ku bi hûrbijarî hatinin çêkirin li pêş in. His, heyecan, evîn, bengîniya jîyanê, êş û elem û hwd bi zimanekî xweşik, bi hostetîya hûnandineke estetîk û bi hêz û şîyana teswîreke bedew li pêş çavên xwendevanan tînin raxistin. Xwendevan di jîngeha bûyeran de, bi serpêhatîyên lehengan re dibin yek; carinan bi wan re hêrs dibin, carinan bi wan re kul û derdên wan tev radibin, carinan bi wan re di nav hisên ji xweşîya jîyanê dizên vedigevizin û di dergûşa bextîyarîyê de bi dilovanî kil dibin. Reng û ronahîya zimên xwe li hemû nivîsê belav dike û bi hevdu re diçirsin. Jîyaneke pîrhêl bi hemû tîkilîyên xwe yê civakî, dijîtîyên ji wan dizên û hêjayîyên subjektîf ku taybetîyên mirovbûnê tê de veşartî, xwendevanan ber bi xwe ve dikişîne. Gotin bi meqamên xwe yê di hûnandinê de, bi kirasên xwe yê wî zimanî û girêdanên xwe yê di hevokan de, bi hevdu re derdikevin pêşîya xwendevanan. Di nivîsandineke weha de, taybetîya simbolîzebûnê ne bi tenê di gotin û formulasyonên cuda cuda de, herweha di tevahîya nivîsê de ye. Nivîsên weha, ji alîyê her mirovî ve bi awayekî tê fahmkirin û nirxandin

Taybetîyên berhemên edebî yê li jorê jî bi kurtî behsa wan hat kirin, diyar dikin ku feqên li ber wergêrên berhemên edebî ji yê li ber wergêrên din pirtir û diwartir in. Ji ber vê yekê ye ku wergera berhemên edebî di nav "hinerê nemumkun" de, "hînera herî nemumkun" e. Loma jî mirov di vî warî de, nikare wergereke bê-qusûr bike.

Ger werger be, qusûr jî dê tê de hebe

Durustîya bi form û naveroka tekstê re şert e, lê min berê jî got; wergerêke ji sedî sed wek orjînalê, dîsa jî tiştekî ne mumkun e. Ji ber vê yekê, divê em li wergera bê-qusûr nefikirin. Ger werger be, dê qusûr jî tê de hebe. Îcar li vira divê em diyar bikin, bê em destûrê ji bo kîjan qusûran didin û kîjan qusûran jî qet qebûl nakin. Yanî ger di wergerê de dê qusûr hebe, kîjan qusûr, an şaşî normal in û kîjan jî ne normal in? Mirov di vî warî de, dikare gelek tiştan bibêje, lê ez ê qîma xwe bi çend nimûneyan bi tenê bînim.

Şaşîyeke normal ew e ku gava mirov wergerê bixwîne, bo nimûne; divê mirov wê bi derbekê re ferq neke, yanî ew şaşî ne pir beloq be. Wekî din jî divê ew şaşî, stîla kurdî xerab neke, mahneyan bi temamî neguherîne, an wan nexe kirasekî weha ku mirov nikaribe tê bigihêje, bê qesd çî ye. Di vî awayê saxtîkirinê de, ger mirov ferhengê bi kar neîne û gotinên wergerê nede ber yê nivîsa orjînal, ev şaşî dê wek probleman xuya nebe. Lê gava mirov gotinên wergerê ji girêdanên wan ên hevokan rizgar bike û bi alîkariya mahneyên wan ên ferhengî bide ber gotinên teksta orjînal, ev şaşîyên ku di qonaxa xwendineke normal de, mîna probleman diyar nedibûn, dikarin wek şaşîyên ku mirov qet nikare qebûl bike, derkevin pêşîya mirovî. Saxtîkirineke weha, ne metodeke pir baş e. Ev mirovan diajo ser şaşîyeke din ku wergerên xwe gotin bi gotin bikin. Lê tevî vê jî gava mirov nivîsek wergerand, heta ku ji mirov bê, divê mirov ji nav hevmaahneyên gotinan -çî di warê mahneyên wan ên bi serê xwe û çî jî di warê girêdanên wan ên di hevokan de- ya herî bêtir nêzikî mahneya gotina nivîsa orjînal bi hûrbijarî hilbijêre. Mirov bi vî awayî, dikare şaşîyan pir bi sînor bike. Tevî vê yekê, di wergera herî baş de jî şaşîyên leksîkalî dê hebin.

Divê werger ji aliyê rêziman, hevoksazî û stîlistîka kurdîya nivîskî bê nixandin. Şaşîyên di vî warî de, ji xwe nayên qebûlîkirin û ev xusûsiyetên wergerê yê bingehî ji ortê radikin. Lê ji derveyî van, hin şaşîyên din jî henin ku nayên qebûlîkirin. Bo nimûne; gava teksta orjînal teksteke akademîk be û wergêr bibêje, ji bo herkes têbigihêje, ez ê wê bi zimanekî sivik wergerînim, ez wê gavê nikarim vê şaşîyê qebûl bikim. Carinan jî teksteke zimanê wê ne pir giran, di wergerê de dibe teksteke zimanê wê pir giran. Ez bi xwe nikarim vê yekê jî wek qusûreke normal bibînim û li hemberî wê bi tolerans bim. Nimûneyeke din: Ger di nivîseke swêdî de, bûyerek di sedsala 17an de çêbûbe û wergêr di kurdî de jî bibêje sedsala 17an, wê gavê şaşîyeke pir mezin derdikeve ortê. Ji ber ku swêdî heta ku salên bi hezar û şeş sedî dest

pê dîkin neqedin, nabêjin sedsala 17an, yanî li ba wan 1699 jî tê de, sedsala 16an e. Gava wan got, sedsala 17an, qesda wan ew e ku salên bi hezar û heft sedî dest pê dîkin. Tu kes nikare bibêje ku şaşîyeke weha ne pir xeter e. Li gora min, ev şaşî nayê efûkirin, ji ber ku di orta nivîsa orîjînal û wergerê de, ferqek heye ku bi qasî sed salan mezin e. Li vê derê, girîngîya taybetîyekê derdikeve ortê; şîyana têgihîştina netêgihîştinê. Wergêr divê têbigihêje ku di vî warî de, ferqek di navbera swêdî û kurdî de heye. Helbet mirov dikare ji bo şaşîyên ku nayên pejirandin, gelek nimûneyan bide. Ez dixwazim çend nimûneyên din jî binivîstînim. Ger wergêr Treni kaçardim a tirkî weha wergerîne; **Min trênan revand**, an jî **Altunî üstüne getirmek** ê re bibêje, **Binî anîn serî**, an jî ji **Anasîni aqlatmak** ê re bibêje, **Dêya wî bi girî kirin** ev ne şaşîyên normal in. Gava di nivîsa orîjînal de, esilzadeyek bi esilzadeyêkî din re bi zimanê serayê bipeyive û wergêr peyivên wan mîna yên kuçeyan wergerîne, yanî sosyolektê têk bibe, ev jî ne şaşîyeke normal e. Wekî din jî ger wergêr ji **Ben oynadım** a tirkî re bibêje; **Ez leyiztim** û ji **Onu götürdüm** ê re bibêje; **Min wî bir**, ez ne van qusûrên hanê û ne jî yên dişibin van, wek qusûrên piçûk û normal qebûl dikim. Ger wergêr hevoka nivîseke li ser kongreyeke komeleyekê ya bi tirkî **Ben çekiliyorum** ê weha wergerîne; **Ez xwe dikişînim**, an jî **Ez dikişim**, tu kes nikare bibêje ku divê mirov çavên xwe ji van qusûran re bigire. Ji ber ku em hemû dizanin, **Ez xwe dikişînim** û **Ez vedikişim**, an **Ez jê vedikişim** eynî mahneyê nadin.

Tew hin henin, pirtûkên ku dê bînan wergerandin, deh caran, bîst caran dixwînin, yanî heta ku jiber bikin dixwînin. Wergêrê/a bi vê teknîkê dixebite, piştî jiberkirinê, pirtûkê datîne alîyekî û dest bi wergerê dike, naveroka ku di serê wî/wê de maye, bi xwe dinivîstîne. dî ew û bextê xwe... Lê zêde dike, jê kêm dike, Xwedê dizane.

Ez bi xwe, ne terefîdarê wergereke weha mim û tişteki weha di nav qusûrên nayên qebûlkirin de jî nahesibînim. Ji ber ku ev êdî bi naveroka di bîra wergêrî/ê de maye, dibe tişteki din. Li gora min, wek min li jorê jî diyar kir, divê naverok baş bê fahmkirin û di pêvajoyeke analîzkirinê re derbas bibe. Piştî wê, heta ku ji destê mirov bê û ziman destûrê bide, divê formeke nêzikî forma orîjînalê bê peydakirin. Carinan ev pir zehmet e. Lê divê mirov hewil bide, da ne ji aliyê formê ve û ne jî ji aliyê naverokê ve, ferqeke mezin nekeve nav werger û orîjînalê. Em dizanin ku ev di tekstên edebî de diwartir e, lê di hin warên din de, ev kar dikare bi awayekî hêsantir û serkevftir pêk bê.

Xalên nîrxandinê

Baş e, wê gavê divê mirov ji wergerê kurdî çi bixwaze? Ez ê piştî vî beşî, li ser hin xalan, wek wergera îdyom, peyivên pêşyan, argoyan û hwd bêtir rawestim. Lê ez dixwazim berîya wan, hin xalên nîrxandinê diyar bikim. Ji ber vê yekê, ez dibêjim, ger ez li dibistanekê mamoste bim û ez karekî wergerê bidim xwendekarên xwe, ez ê ji wan bi giştî tiştên li jêrê hatinivê nivîsandin bixwazim. Mirov dikare listeya li jêrê dirêjtir bike û bi detaytir tiştan bixwaze, an jî hin mamoste dikarin bibêjin; "Em ê vê listeyê kurttir bikin", lê ez bi xwe bim, tevî kêmanîyên ez jê haydar im, ez ê bi kêmanî li gora listeya jêrîn, wergerên xwendekarên xwe binîrxînim.

- Ji ber xusûsiyeta kurmançî ya ergatîvbûnê (split ergativ), divê kiryarên (subject) hevokan rast bînin hilbijartin.

- Divê lêkerên di nivîsê de henin, rast bînin nivîsandin û tewandin. Divê mirov hay ji "verbkongruens"ê hebe. Di kurmançî de, ev tê wê mehneyê ku forma lêkerê li gora kiryarên lêkera întansîtîv û bireserên lêkera transîtîv tê çêkirin.

- Divê navdêrên di nivîsê de henin, rast bînin nivîsandin û li gora nêr û mêtiyê, yekhejmarî û pirhejmarîyê û hwd rast bînin tewandin.

- Divê rengdêrên di nivîsê de henin, rast bînin nivîsandin û di atributên ku ji nav û rengdêran pêk tên de, divê girêdana wan li gora taybetîya kurmançî pêk bê. Zimannas zimanan ji aliyê girêdana navdêr û rengdêran jî ji hevdu vediqetînin û grûpên cuda çêdikin. Ji ber ku kurmançî ji aliyê vê sistema dabeşkirina zimanan ve, dikeve kategorîya NRê (navdêr+rengdêr), divê ev girêdan li gora vê qaîdeyê çêbibe. Yanî di halê weha de, divê mirov struktura atributa zimanê orjînal bi ya kurdî biguherîne.

- Divê hevok li gora hevokasazîya kurmançî hatibin avakirin.

- Divê nivîs ji aliyê naverokê ve rast hatibe wergerandin û mirov bikaribe tê bigihêje.

- Divê cudabûneke mezin di orta forma wergerê û ya orjînalê de çênebe.

- Ji ber ku ez li jêrê behsa teknîka wergera îdyoman dikim, ez ê di vî warî de bi tenê weha bibêjim; divê wergera hatiye kirin, ne gotin bi gotin hatibe wergerandin û ji aliyê îdyomî ve jî rast be.

- Divê gotin û fras bi awayekî hûrbijarî hatibin hilbijartin û mirov ew û hevmaneyên wan ên din baş dabîn ber hevdu.

- Divê nivîs biherike, yanî zimanê wê rewan be, girêdana wê baş hatibe çêkirin û bi zimanekî ku mirov lê hildikume nehatibe wergerandin û hwd...

Werger û îdyom

Yek ji wan astengiyên wergerê, wergera îdyoman e. Ji ber vê yekê, pêwîst e ku di derheqê wergera wan de rêya herî rast bê peydakirin. Ji ber ku îdyom ew celeb peyivîn ku mirov nikare li mahneya gotinên ku di avakirina wan de hatinîn bikaranîn binihêre û mahneya wan fahm bike. Ji berdêla wê, divê mirov her îdyomekê mîna yekîneyeke leksîkal bihesibîne. Yanî gava mirov di ferhengê de, li mahneya îdyomekê bigere, divê mirov li mahneya gotinên wê yek bi yek negere, îdyom ji çend gotinan pêk hatibe jî divê mirov wê wek yekê bibîne û bi temamî li wê bigere.

Hin awayên wergerandina îdyoman yên ku mirov di qada wergerê de dikare lê rast bê, ev in:

a- "Îdyom gotin bi gotin tê wergerandin"

Ev awayê wergerandinê ne awayekî rast e. Ji ber ku ev awa, îdyomê wek yekîneyeke leksîkal nahesibîne û bala xwe nade mahneya wê, di zimanê ku mirov werdigerîne de, dikare peyiv, an komikên peyivan ên bêmahne bînin holê. Carinan jî dibe ku werger di wî zimanî de, bi xwe îdyomekê çêbike. Lê her çî dibe, bila bibe, ev awayê wergerandinê dibe sedem ku tiştekî weha bê meydanê, da ji bo zimanê ku mirov werdigerîne, gelekî xerîb be. Ji ber vê yekê, ev awayê wergerandinê, ne awayekî biserketî ye.

Ger mirov li gora vê metodê bike, divê mirov îdyomên tirkî yên li jêrê weha wergerîne. Gelo wê gavê, tu kes dê hebe ku ji wan fêhm bike?

O kaldırım mühendisidir: Ew mihendisê peyarêyê (trotuarê) ye:

Dimyat a (Payasa) pirince giderken evdeki bulgurdan oldu: Çû Dîmyatê (Paya-sê) birincê, ji bilxurê malê bû

Nuh der peygamber demez: Dibêje Nûh, nabêje pêxember

Kafayı çekmek: Serê xwe kişandin

Kafayı bulmak: Serê xwe dîtin

Yan gelip yatmak: Li ser kêlekê hatin û razan

An jî ger ez îdyomên kurdî weha wergerînim tirkî, ew ê di tirkî de bînin çî mahneyê û gelo wê gavê, tu kes dê hebe ku ji wan fêhm bike?

Ew hesin bi sarî dicû: O demiri soğuk soğuk çiniyor

Kaya şil firotiye: Yaş saman satmış

Li enîya xwe xistin: Alnına vurmak

Ji ber vê yekê, ez metodeke weha qet qebûl nakim. Mirov dikare gelek nimûneyên din binivîsîne, lê ev nimûne bi tenê jî têra nîşandana şaşbûna metodeke weha dikin. Nuha jî ez dixwazim ji hin berhemên kurdî, hin nimûneyan pêşkêş bikim.

Hem werger, hem nivîs û ya herî xerab jî mixabin hem ferhengên me bi şaşiyên weha ve mişt in. Ez naxwazim navên berheman binivîsînim. Ji xwe, mebesta min bi tenê ew e ku ji bo şaşiyên di vî warî de henin, ez hin nimûneyan pêşkêş bikim. Bo nimûne; mirov di hin nivîsan de dibîne ku **Kabak başına (başında) patlamak** bûye **Kundur di serî de teqandin**; **Koltukları kabardıya** tirkî bûye **Bin çengên wî nepixîn**. **Çukurova kazan biz kepçe bûye Çukurova beroş û em çöçik û hwd.**

Di vî warî de, şaşiyên ku di hin ferhengan (tirkî-kurdî) de henin, tew mirov ecêbmayî dihêlin: **Hoşuna gitmek** bûye **Lê xweş hatin**; **Gözünü dört açmak** bûye **Çav çar hilkirin**; **Orgazm olmak** bûye **Ji rê çûn**; **Baş başa vermek** bûye **Serî dan ser hev**; **Baştan çıkarmak** bûye **Ji serî derxistin** û hwd. Mirov dikare ji gelek berhemên kurdî, gelek nimûneyên din jî li vê derê binivîsîne, lê bi ya min, ji bo nixandina şaşiyên di vî warî de, ev mestere têrê dikin.

Şaşbûna vî awayê ha, di wergera peyivên argoyî de jî xuya dibe. Ger di nivîsekê de, **Kırığın teki** hebe û mirov di kurdî de wê bike **Şikesîyekî dera hanê**; ji **Yırtığın birine rastladım** ê re bibêje **Ez li yekî/a çiriyayî rast hatim**; ji **Ense yapmak** ê re bibêje **Paşsitu çêkirin**, ma wê gavê mirov dikare ji wan re bibêje ku ev werger in? Li gora bawerîya min, mirov nikare wan wek wergerê bihesibîne. Ji ber ku ev ji wergerê bêtir nêzîkî ferhengê nin û mirov dikare bi alîkarîya mahneya wan a leksîkalî ve zimanê orijînal bixwîne.

b- Metoda duyem ya ku divê mirov behsa wê bike ev e ku di zimanê orijînal de fraseke normal e, lê di wergerandinê de wergêr îdyomêkê li hemberî wê peyda dike.

Ev metodeke ne hêsan e. Di vê metodê de, talûke heye ku wergêr ji ustûba orijînal bi dûr bikeve. Dibe ku mirov di wergereke biserkerî de, bikaribe hin frasên normal di zimanê ku mirov wêdigerîne de bike îdyom, lê divê hejmara wan ne zêde be, da cudabûneke mezin nekeve navbera nivîsa orijînal û wergêrê. Ji ber vê yekê, wergêrên ku ev metod ji xwe re hilbijart, divê pir lê miqate bin, da balansa di orta herdu nivîsan de wenda nebe. Ji bo vê yekê jî divê wergêr nemaze li beşên ku dê li gora vê metodê wêdigerînin, pir baş hûr bibin û nehêlin meqseda nivîsa orijînal bêguhertin.

c- Metodeke din heye ku mahneya îdyomên zimanê orijînal wêdigerîne. Yanî di

zimanê orjînal de îdyom e, lê di zimanê wergerê de bi gotinên normal mahneya wê tê îzahkirin.

Pir normal e ku îdyomek di zimanê orjînal de hebe, lê di zimanê wergerê de peyda nebe. Wê gavê, divê wergêrê/a nivîsê mahneya wê îdyomê wergerîne. Lê divê weha neyê fahmkirin ku ev metod metodeke biserketî ye. Talûkeya herî mezin ew e ku xurtbûna mahneya ku di îdyomê de civîyaye ser hev, bi formeke sist pêşkêş bibe û îdyom bi hemû hêz û rengên xwe ve dernekeve pêş. Ji ber vê yekê, gava mirov li hemberî îdyoma orjînal îdyomek peyda nekir, an di wî zimanî de, ew îdyom peyda nebe, divê mirov di îzahata wê de pir bi dîqet be, da di kirasê zimanê wergerê de jî nêzîkî hêza xwe ya berê diyar bibe û ji rengên xwe yê berê kêmtir neçirise.

d- Di wergerê de, îdyom li hember îdyomê tê peydakirin

Li gora bawerîya min, metoda herî baş ev e. Gava ez vêya dibêjim, ez ji bîr nakim ku hin îdyom henin ku mirov hertim nikare îdyomên hemberî wan peyda bike. Lê tevî vê jî divê mirov bi wan bersiva nivîsa orjînal bide û ger di nivîsê de îdyom hebin, divê mirov di zimanê wergerê de, li hember wan îdyoman îdyoman peyda bike. Ji ber ku di eslê xwe de, îdyom nayên wergerandin, lê îdyomên hemberî wan tên peydakirin. Ji ber vê yekê, ji derveyî hin rewşên taybetî ku min di beşê "c" yê de behs kir, divê tu kes hewil nede, da ku îdyoman ji zimanekî wergerine zimanekî din. Ev kar hema hema ne mumkun e. Ji berdêla wê, heta ku mumkun be, divê li hemberî îdyoman, îdyom bîn peydakirin.

Ger mirov li gora vê metodê wergerîne, divê mirov hin nimûneyên beşê "Îdyom" gotin bi gotin tê wergerandin ê weha wergerandana:

O kaldırım mühendisidir: Ew beqan dixesîne; ew kêçan dixesîne; ew sa xwê dike.

Dimyat a (Payasa) pirince giderken evdeki bulgurdan oldu: Çû heyfa bavê, qûna dê li ser kir.

Nuh der peygamber demez: Barê êzingê min; dibêje, barê êzingê min.

Kafayı bulmak: Serxweş ketin

Û hwd...

Werger û peyivên pêşîyan

Heçî peyivên pêşîyan in, ji bo nîşandana hêjayî û pîvanên civakan, pir girîng in. Taybetiyên çandên cuda xwe di wan de didin der. Ew li ser bingehê zanebûn û tecrubeyên civatan hatinin avakirin, şîretên wan rênîşander in û di jîyana civakî de ro-

lên pir mezin dileyizin.

Peyivên pêşyan jî wek îdyoman, peyivên tayberî nin û nayên guhertin. Qalibên wan ên serrastkirî henin. Lê hin ferq henin ku peyivên pêşyan ji îdyoman vediqetînin. Berîya hertiştî, piraniya peyivên pêşyan gelek caran ji îdyoman dirêjtir in û hevokên temankirî nin. Navrokên peyivên pêşyan ji yê îdyoman konkrettir in. Peyivên pêşyan gelek caran encama serpehatîyan in û ji ber vê yekê, taybetîyeke wan jî ew e ku ew an rewşekê, an jî çîrokekê dinimînin. Mirov nikare ji peyivên îdyoman tê derxîne, bê mahneya wan çî ye. Ew di vî warî de xwediyên sirên mezin in, lê peyivên pêşyan mahneyên xwe zêde venaşêrin. Heta, ji bo ku mirov bi giştî bikaribin têbigihêjin, alîkarîya mirovî dikin. Yanî ew di vê mahneyê de, ji îdyoman birehmtir in. Qesda min ne ew e ku tu astengên wergera peyivan pêşyan tune ye û hema mirov çawa çav li wan bikeve, mirov ê bikaribe pir bi hêsanî û bê problem wan wergerîne. Heçî peyivên pêşyan in, wergera wan bi qasî ya îdyom û peyivên argoyî ne dijwar be jî dîsa divê mirov li wergera wan pir miqate be. Lê berê jî hat gotin, mahneyên gotinan ên leksîkalî alîkarîya mirovî dikin, da mirov bikaribe şiroveya mahneyên peyivên pêşyan bike.

Ger mirov bala xwe bide van nimûneyên tirkî, mirov ê bibîne ku mahneyên gotinan ên leksîkalî çî qasî rênîşander in û dilbirehmîya peyivan pêşyan çî qasî ji ya îdyom û peyivên argoyî zêdetir e: Düşenin dostu olmaz; Alna yazılan başa gelir; Ateş olmayan yerden duman çıkmaz; Ayıpsız dost arayan dostsuz kalır; Dağ dağa kavuşmaz, insan insana kavuşur; Demir tavında dövülür; Derdini söylemeyen derman bulamaz; El azına bakan karısını tez boşar; Her horoz kendi çöplüğünde öter; Ne ekersen onu biçersin; Tatlı dil yılanı deliğinden çıkarır; Yoldan kal, yoldaştan kalma û hwd...

Zimanê qels tune ye, pêwîst nake ku em dilên xwe bi xwe bişewitînin

Yek ji wan gazindên ku bi minasebeta wergerê tîn kirin, qelsbûna zimanê me ye. Ma gelo zimanê me qels e? Zimannas zimanê qels nas nakin. Tu ziman ji tu zimanan ne qelstir e. Tu zimannas nikare wê cesaretê di xwe de bibîne û bibêje, li falan devera dinyayê zimanek heye ku qels e. Tiştêkî weha tune ye û ji ber vê yekê, ne pêwîst e ku em dilê xwe bi xwe bişewitînin. Ji ber ku avahiyên hemû zimanan bi awayekî giştî dişibin hevdu. Di hemû zimanan de, deng henin ku hejmara wan gelekî bi sînorkirî ye; ziman bi saya bikaranîna wan dengên ku bi serê xwe tu mahneyên wan tune nin, bi sed hezaran elementên herî piçûk yê bimahne ava dikin û bi

xêra wan jî li gora prensîpên avakirinê, hevokên bêhejmar çêdibin. Yanî taybetiyên giştî yên strukturî, mîna dengsazî, xizneya gotinan û rêzimanî li ba her zimanî peyda dibin. Ger qesd bi dewlemendbûna zimanekî, hejmara gotinên wî zimanî bin, her zimanek xwedîyê wê îmkane ye ku li gora qaideyên xwe yên afirandinê, gotinan çêbike. Ji ber vê yekê, divê mirov baş bizanibe ku zimanê prîmîtîv tune ye. Lê dibe ku hin ziman zimanên civatin weha bin ku li gora civatên din zêde pêş de neçûbin û loma jî ji teknolojîyê pêşketî bê par bin. Lê ji ber misteweya teknolojîya wan civatan, mirov nikare bibêje ku zimanên wan jî qels in. Divê mirov qebûl bike ku di hin zimanan de, mefûmên zanistî hê tune nin. Lê wek min li jorê jî got, divê ji ber vê yekê bawerîyê şaş li ba mirovî peyda nebe ku ew ziman nikarin mefûmên zanistî çêbikin. Taybetîyê zimanan a giştî heye ku her ziman xwedîyê sistemeke komunîkasyonê ya vekirî ye. Ev ferqeke mezin e ku zimanê mirovan ji zimanê heywanan vediqetîne. Ji ber vê yekê ye ku di warê afirandina gotinan de, bi her zimanî re ew şîyan heye ku peyivên nuh çêbike û bi îmkane xwe bersiva vê pêwîstiyê bide. Îro em dibînin, gelek zimanên ku pêşketî tînin hesibandin jî li gel avakirina xwe ya taybetî, ji zimanên din jî peyivan werdigirin û bersiva vê pêwîstiyê didin.

Peyvandina bi zimanekî ya ji aliyê hejmareke mirovan a hindik jî nabe pîvana qelsbûnê. Tew zimanek heye, navê wî taîap e. Li gora agahdarîyên pirtûka profesore lîngvîstîkê Östen Dahl (Ziman), ev ziman li gundekî bi tenê tê peyivandin û nîfûsa wî gundî li doratooî ye. Ji van 89 kes bi awayekî rewan bi taîapî dipeyivin. Ji derveyî wî gundî, li tu deverên din tu kes bi wî zimanî napeyive. Yanî zimanekî weha ye ku ji dorhêla xwe îzolekirî ye. Ji xwe, taîapa nivîskî tune ye, bi tenê zimanê axavtinê ye. Lê tevî vê jî gava mirov hevokeke wî zimanî ji bo analîzê werdigirîne, mirov dibîne ku hevoka wî ji wergera xwe ya bi gelek zimanên din komplekstir e û morfemên hevokê yên rêzimanî, ji yên gelek zimanên pêşketî bêtir in.

Lê ger hin bibêjin ku divê em di her warî de, peyivan peyda bikin, da ku kurmancî hem di warê felsefê, mentiq, ekonomî, hiqûq û hwd de bi rewanî bê bikaranîn û hem jî wergera pirtûkên van waran hêsantir bibe, ez ê heq bidim wan. Lê peyiv lihevhatineke civakî dixwaze. Gava em bi kurmancî ji "lêvê" re dibêjin "lêv", ev ji xweber çênebûye. Di bingehê wê de, lihevhatineke civakî ya nexuyayî heye ku heta nivîşê me hatiye. Ji ber vê yekê, ji bo afirandin û bikaranîna peyivên nuh jî divê mirov îmkaneke weha peyda bike ku bikaribe şertê vê fonksiyonê pêk bîne. Ger îroj, otorîteyê kurdan a di wî warî de hebûya, şertên lihevkirina civakê ya li ser peyivên nuh û qebûlkirin û bikaranîna wan dê hêsantir û birêkûpêktir peyda bûbûna. Îmkaneke weha dê karê wergeran jî hêsantir bikira. Îro kurd bo nimûne, li

Swêdê, di jîyana xwe ya komeleyetîyê de, yanî gava di komeleyên xwe yên cuda de dixebitin, di warê peyivan de, li tu astengên mezin rast nayên. Lê berîya bîst salan, gelek ji me di vî warî de, ji aliyê peyivan ve zehmetî dikîşand. Lê îro em hemû destûr û programên xwe bi kurmançî dinivîsînin û hemû civîn û kongreyên xwe bi kurmançî bi rê ve dibin. Kurdan di vê pêvajoyê de dît ku gava pêwîstî çêdibe, kurmançî ji bo qadeke jîyanê dikare peyivan biafirîne. Ev taybetî li ba her zimanî heye û li ba kurmançî jî heye. Ma berîya Şerê Cîhanê yê duyem, di zimanê Îngilîzî, swêdî, erebî, tirkî, farisî, almanî, fransî û hwd de peyivên komputerê hebûn? Lê nuha, em hemû dibînin ku ferhengên di vî warî de henin, her ku diçe mezintir dibin. Her ziman li gora qaîdeyên xwe, an wan werdigerîne, an li gora mentiqê xwe diafirîne, an jî raste rast ji zimanên din werdigire û xwe di vî warî de bê peyiv nahêle. Ev qaîde ji bo kurmançî jî derbas dibe.

Lê mixabin, asîmilasyonê qad ji ber zimanê kurdî vegirtin. Divê kurdî van qadan ji nû ve vebigire, bibe zimanê hemû qadên jîyana me û prestîja xwe bilindtir bike. Di vî warî de, hemû beşên civata me dikarin rolê bileyizin, lê wergêr bi wergerên hemû qadên jîyanê dikarin îmkanên berxwedana vî zimanî xurttir bikin û roleke bêhempa bileyizin.

Îcar derdê herî mezin ne zimanê kurdî ye, kurd bi xwe nin

Pirseke din heye ku gava mirov li ser pirsên wergera kurmançî bipeyive, divê mirov balê bikişîne ser wê jî. Ew jî helwêsta kurdan a di warê kurmançî de ye. Ev tesîreke neyînî li wergera kurmançî jî dike. Ev helwêst meydana ku werger dixwaze tê de dewra xwe bileyize, tengtir dike û hem ji bo bi giştî zimên û hem jî bi taybetî wergerê, wek gefeke mezin fonksiyonê dileyize. Ji ber vê yekê, gelek girîng e ku gava mirov behsa astengên vê qadê bike, divê mirov behsa meylên neyînî jî bike. Ji bo berdewamiya jîyana zimanekî, tiştê girîng ew e ku ew ziman bê bikaranîn û ji nifşan dewrî nifşan bibe. Zimanê ku neyê bikaranîn û dewrî zarokan nebe, ji xwe wê gavê mirina wî nêzik dibe û Ruhstîn li ku be, dê li derîyê wî bixe. Rewşa kurdan a taybetî û pêlên asîmilasyonê yên ku bi xezebeke nedîtî bi ser me de tînin, cîh li zimanê me teng kiriye. Ev tiştêkî pir êşkere ye. Lê bi ya min, zimanê kurdî herî pir noqan ji kurdan vala dike. Ji ber ku misogerîya berdewamiya jîyana vî zimanî, bi helwêstên kurdan ve girêdayî ye. Lê ger her kurdek ji bo kurdî bi kar neîne, li mahneyekê bigere û zarokên xwe fêrî kurdî neke û bi vî awayî nifşên nuh bi zimanekî din mezin bibin, wê gavê ji êrîşên asîmilasyonê bêtir, yên ku cîh li kurdî teng dikin û

bêhna wê diçikînin, kurd bi xwe nin.

Tendensên ku kurdî piçûk dibînin jî di vî warî de, roleke mezin dileyizin. Yên weha difikirin, kurdî mîna zimanê nexwendîyan, zimanekî "pîmîtriv" dibînin. Dibe ku gelek ji wan bîst- bîst û pênc salan li dijî asîmîlasyonê peyivîbin û belkî hin ji wan jî ji ber vê yekê, deh-panzdeh salan di hefsê de mabin, lê hê jî li mala xwe bi kurdî napeyivin û wan şertan ji ortê radikin ku zurîyetên wan bikaribin vî zimanî zindî bihêlin. Îcar, gelo sûcê zimên e, an sûcê xwendîyên zimên e?

Hin jî henin, ji wan heye ku ew navend in û hertiştên din jî li dora wan digerin. Gava kêmanîyek li ba wan peyda bibe, ji xwe divê li ba herkeşê hebe. Li gora wan, pîvan ew bi xwe nin. Dinyaya mirovên weha pir piçûk e. Ew hew xwe dibînin. Di pencereyêke pir piçûk re li derve dinihêrin, ji ber vê yekê, nikarin rastîya ji derveyî xwe bi hemû ebatan bibînin. Di pîrsa zimanê kurdî de jî meylên weha tên dîtin. Mirovên weha gava kurdîya wan têrê nake, ji wan heye ku kurdî têrê nake. Ji ber ku ew egosentrîst in û dibêjin qey kurdî bi zanebûna wan ve sînorkirî ye. Li gora wan, ger kurdîya wan qels be, ji xwe ev ji ber "qelsbûna kurdî" tê.

Lê li gora tiştên li jorê jî hatin gotin, problema mezin ne ji zimanê kurdî ye, ji wan kurdan tê ku zimanê xwe bi kar naînin, zarokên xwe fêrî zimanê xwe nakin, an jî çareyekê ji bo qelsîya xwe ya di warê kurdî de, peyda nakin. Yanî ger mirov bi awayekî din bibêje, di têkiliyên kurdan û kurdî de, seqetîyek heye ku wan ji şûra neteweyî bi dûr dixîne. Kurd roj bi roj hejmara qadên ku kurdî tê de bi kar tînin, kêm dikin. Her ku diçe, çih li kurdî tengtir dibe û hejmara kurdên ku di jiyana xwe de, zimanekî din di şûna kurdî de bi çih dikin, zêdetir dibe. Pîrsa bingehtî ev e û divê em teşhîsa xwe şaş danînin. Ji ber vê yekê, ez dibêjim ku di eslê xwe de, derdê herî mezin ne zimanê kurdî ye, helwêsta kurdan e, kurd bi xwe nin. Zimanê qels tune ye, lê kurdên qels pir in.

Hevoksazî di ser hertiştî re ye

Pîrsa hevoksazîyê yek ji wan pîrsan e ku divê mirov di warê wergerê de jî derxîne pêş. Ji ber ku wergêr bi piranî ji tunebûna gotinan gazindan dikin û ji ber vê digihêjin qenaetekê ku kurmancî ji bo wergerê pir qels e. Ji xwe, min li jorê diyar kir ku zimanê qels tune ye. Îcar ez ê ji aliyê tiştê di zimên de herî bingehtî ve, li ser vê pîrsê bi awayekî din rawestim û rola hevoksazîyê binivîsînim. Sedema vê pêwîstîyê ew e ku gelek mirov henin ku serên xwe bi hîlbijartina gotinan diêşînin û ji wan heye ku di zimên de tiştê herî bingehtî bikurdîbûna gotinan e. Yanî li gora wan, ger

wan gotinên bi kurdî bi kar anîn, ji aliyê kurmançbûna nivîsê ve, tu mesele namîne. Ji ber vê yekê, hewil didin ku gotineke biyanî jî di nivîsên wan de neyê bikaranîn. Ez dixwazim fikirên xwe bi awayekî pir kurt binivîsînim û mînaqêşeya vê pîrsê ya bi awayekî firehtir, ji nivîseke din re bihêlim.

Di zimanekî de, hemû tişt girîng in. Lê di nav van hemû tiştên girîng de, ya herî bîngeh, hevoksazî ye; yanî qaîdeyên avahîya hevokên wî zimanî nin, tahma wî zimanî ye, di hevokan de, prensîpên pêwendîyên gotinên wî zimanî nin... Ger we hevoka xwe li gora hevoksazîya wî zimanî ava kir, ew tê wê mahneyê ku hûn bi wî zimanî difikirin. Heta ku hûn rîayetî hevoksazîya wî zimanî bikin, hemû gotinên ku hûn di avakirina hevoka xwe de bi kar bînin, ji zimanekî biyanî hatibin wergirtin jî hevoka we dê hevokeke kurdî be. Bo nimûne; nuha ez ê sê gotinên erebî hilbijêrim û di avakirina hevokê de bi kar bînim:

Qunbele: bombe

Met em: aşxane, restorant

Fecirî: teqîya

Nimûne: Qunbele li met'emê fecirî: Bombe li aşxaneyê teqîya.

Tevî hersê gotinên erebî jî ev hevoka me hevokeke kurdî ye. Ji ber ku pêwendîyên hersê gotinên erebî, ne li gora hevoksazîya erebî, lê li gora hevoksazîya kurdî hatinin danîn.

Lê ez ê vê carê gotineke biyanî jî bi kar neînim û ji çend gotinên xwerû kurdî hevokekê ava bikim.

Gotinên ku ez ê bi kar bînim, ev in:

Ez

hez dikim

gelek

ji

vî

karî

Hevoka min a nimûne jî weha ye: Ez hez dikim gelek ji vî karî.

Wek hûn jî dibînin, hemû gotinên hevoka min, bi kurdî nin, lê hevoka min ne hevokeke kurdî ye. Ger ez bi awayekî din bibêjim; her çi qasî malzemeyên wê li fabrîkeyeke kurdî hatinin çêkirin û ji dikaneke kurdî hatinin kirîn jî hostetîya ku hatiye bikaranîn, ne hostetîya kurdî ye. Yanî ev hevok bi gotinên kurdî, lê ne li gora qaîdeyên hevoksazîya kurdî hatiye avakirin û ji ber vê yekê jî ne hevokeke kurdî

ye. Bi vê yekê jî baş diyar dibe ku bi gotinên xwerû kurdî bi tenê hevokeke kurdî nayê çêkirin. Divê em hevoksazîyê di ser hertiştî re bigirin. Lê divê ev neyê wê mahneyê ku ez ji bo avakirina hevokan, gotinên biyanî pêşniyar dikim. Na! Ez bi xwe ne purîst im, lê ez pir hewil didim ku gotinên xwerû bi kurdî bi kar binim û heta ku ji min tê jî ez bi kar tînim. Qesda min bi tenê ew e ku ez ya herî girîng diyar bikim.

Gelek gotinên farisîya ku îro mirov pê dipeyivin, ji ber sedemên diyar, gotinên erebî nin (qesda min koka wan erebî ye), lê em dîsa jî jê re dibêjin, farisî. Ji ber çî? Ji ber ku ew gotinên erebî li gora hevoksazîya farisî bi hevdu ve tînin girêdan û hevokên farisî pêk tînin. Ger gotin elementa herî girîng bûya, îro divê me tu kesî behsa farisî nekira. Ji ber ku farisî ji aliyê gotinên erebî ve hema hema hatiye dagirkirin. Lê her ku di hevokan de, hevoksazîya farisî ya taybetî bê paraztî, tu kes dê ji wan hevokan re nebêje, hevokên erebî. Ger mirov li van nimûneyan binihêre; "Hayatta en hakiki mürşit ilimdir, Turistik tesisleri, Ziraat Bankası, oktisadi ve Ticari olimler Akademisi, içtihat kararı, Tıp Fakültesi, haddi hesabı, kör payı, istihbarat şefi, istihkam sınıfı, istişare heyeti kaptan pilot emanete hiyanet" û bi qasî malzemeyên ferhengêkê gotinên din... Gelo kîjan ji wan bi tirkî ye? Lê kombînezona wan bi tirkî ye

Ger îro em gotinên almanî û îngilîzî ji swêdî derbixin, swêdî hema hema dê lal bimînin. Lê di hevokan de, pêwendîyên gotinên almanî û îngilîzî wek ên hevokên herdu zimanan çênabin, ew li gora qaîdeyên hevoksazîya swêdî, pêwendîyan bi hevdu re datînin û bi vî awayî hevokên swêdî çêdikin.

Ji ber vê yekê, ez ji wergêrê/a kurd re dibêjim, wergerîne, gava te hin gotinên zimanên biyanî jî bi kar anî, zêde netirse! Ji ber ku ya herî girîng ew e; tu ji mentiqê zimanê kurdî veneqetî, hevoksazîya kurdî biparêzî û nivîsê bixî kirasê kurdî...

Werger û tîpguhêzi

Ji ber ku nivîsên kurmançî bi çend elfabeyan henin, divê em girîngîyekê bidin tîpguhêzîyê jî. Lê em gelek caran tîpguhêzîyê û wergerê tev li hevdu dikin. Ji ber vê yekê jî girîng e ku mirov di vî warî de zelalîyekê peyda bike. Her çî qasî hin henin ku gava wergerê li gora misteweya wergerê dabeş dikin, tîpguhêzîyê tê de dihesibînin jî ez ji rastbûna wê zêde ne ewle mim. Ger ez ji aliyê wergera form û naverokê ve lê binihêrim, ez ê jê re nebêjim werger. Lê gava ez wek hinan bikim û ji aliyê wergerandina tîpan lê binihêrim, dibe ku ez jê re bibêjim wergera tîpan. Di tîpgu-

hêzîyê de -ji xwe ji navê wê jî tê fahmkirin- tîpên tekstê tên guhertin. Yanî gava mirov nivîsekê ji sistemeke nivîsandinê diguherîne sistemeke nivîsandinê ya din, mirov tîpguhêzîya wê nivîsê dike, yanî translîterasyona wê dike. Loma jî gava mirov nivîseke kurmancî ya ku bi elfabeya kirilî hatiye nivîsandin, li gora elfabeya latînî diguherîne, mirov wê ji alîyê naverok û formê ve wernagerîne, lê tîpên wê diguherîne. Ev kar jî tîpguhêzî ye. Wergera ku ez behsa wê dikim ew e ku mirov nivîsê ji zimanekî dike zimanekî din. Baş e, ger werger ew hiner be ku di navbera du zimanan de pêk tê, gelo gava mirov nivîseke bi soranî dike kurmancî, mirov çi dike? Rast e, mirov nivîseke soranî ji sistemeke nivîsandinê diguherîne sistemeke din. Lê ma mirov tîpan bi tenê diguherîne? Ji ber vê yekê, bi ya min, karê ku nivîsekê ji soranî dike kurmancî, werger bi xwe ye. Ji ber ku di vê rewşê de, mirov ne hew tîpên sistema nivîsandina erebî dike tîpên latînî, mirov hevokên nivîsê li gora qaîdeyên gramatîkeke din ava dike. Heta gelek çaran divê li hemberî gotinên soranî yên kurmancî bîn peydakirin û gelek çaran gava eynî gotin di herdu zaravayan de, di eynî mahneyê de bîn bikaranîn jî mirov mecbûr e ku wan li gora fonetîk û rastnivîsandina kurmancî binivîsîne. Yanî mirov di herdu halan de jî ji soranî werdigerîne kurmancî.

Ferqa di navbera soranî û kurmancî de heye, ji ferqa navbera swêdî û norweçiyê bêtir e. Lê tevî vê yekê jî gava mirov nivîsekê ji swêdî dike norweçî, mirov wê werdigerîne. Îroj, tu kes behsa zaravayên Skandînavyayê nake, lê behsa zimanên Skandînavyayê yên cuda tê kirin. Loma jî divê em bi xwe zor nînin û vê yekê mîna wergerê binixînin. Hin mirov dikarin weha bipirsin, ma ger werger di navbera du zimanan de çêdibe, wê gavê kurmancî û soranî du zimanên cuda nin? Çi ziman e û çi zarava ye, tu kes nikare defînîsyoneke zelal pêşkêş bike. Gelek çaran ne pîvanên zimannasîyê, lê pîvanin din dibin sedem ku du zaravayên berê mîna zimanekî dihatin dîtin, lê ji demeke û pê ve, êdî mîna du zimanên cuda tên dîtin. Serboxirwetî berîya çend salan mîna zimanekî dihat zanîn, lê nuha em dibêjin, zimanê sirbî, zimanê xirwetî û hwd. Gelo ev guhertin li gora pîvanên zimannasîyê çêbû? Na! Ji ber vê yekê jî gava mirov li ser girêdanên kurmancî û soranî dipeyive, divê mirov xwe nexe qaliban û gelek faktorên ji derveyî zimannasîyê jî bibîne û dû re bigihêje qe-naetekê. Loma gava em dibêjin, kurmancî û soranî zaravayên zimanekî nin, pîvanin me yên din henin ku bingehê nixandina me pêk tînin. Tevî vê jî divê em biza-nibin ku ev minaqeşeyeke kûr dixwaze û di çarçoveya vê nivîsê de hilnayê.

Neheqîya li hinerê wergerê û li jinan dibe

Hin dibêjin; " Werger wek jinekê ye. Ger xweşik be, ne sadiq e, ger sadiq be, ne xweşik e." Ev ji alîyekî ve, bi giştî li jinan û bi taybetî jî li jinên xweşik heqaretek e û ji aliyê din ve jî neheqîya li wergêran bi xwe ye. Li gora vê îdfayê, nivîsa orijînal mêr e û werger jî jin e û loma jî werger xwe çî qasî bixemilîne û li dora xwe here û were, sêdaqata wê ew qasî kêr dibe. Li gora wan, çare ji sêdaqata wergera xweşik re tune ye. Lê dîroka wergerê nişan daye ku werger tevî hin qusûrên di şnorên qebûlkirinê de hiltên, dikare hem xweşik be û li gel taybetiyên xwe yên wergerê, sadiq be jî. Sêdaqata wergerê ne ji bo xatirê nivîsa orijînal bi tenê, herweha ji bo xatirê xwendevanên zimanê wergerê ku xwe dispêrin wergêran jî gelekî girîng e. Lê navê wê li ser e; werger. Ji ber vê yekê, di hinerê peyda kirina balansa nav du zimanên cuda de, wergera hem xweşik û hem jî -tevî qusûrên ku ilmê wergerê qebûl dikesadîq bi hevdu re derkeve ortê

Ez di warê wergerê de, şikên henin fêhm dikim. Ez bi xwe jî li wergerên pir xerab rast hatimim. Lê em li vê derê, wergera cidî û wergêrên xwedîşîyan minaqeşe dikin. Li vê derê, hewildana min ji bo wê ye ku em ter û hişk bi hevdu re neşewitînin, ne ku paraztina wergerên xerab e.

Wergêr û nivîskar

Karê wergerê ji aliyê pisporiyê ve mîna nivîskariyê ye, di warê zimên de zanîneke kûr dixwaze. Dibe ku şiyana wergêr a afirandinê bi qasî ya nivîskêr ne xurt be, lê tiştêk heye ku bivê nevé divê pê re hebe, ew jî şiyana bikaranîna zimên e. Li gora min, yek ji wan ferqên bingehî yên di navbera wergêr û nivîskariyê de ev e û divê mirov vê yekê tu carî di ser guhên xwe re neavêje. Werger bûyerek e ku di qada civakî de, di navbera mirovan de çalakîyeke ragîhandinê ye û di qada kesî de jî du tiştên cuda wergêrî/ê di quncikê de asê dike; ji alîyekî ve nivîsa zimanê orijînal dixwaze wergêrî/ê têxe bin kontrola xwe û ji aliyê din ve jî qaîdeyên sîstema zimanê wergerê. Loma jî karê wergêrî/ê ew e ku di navbera du bûyerên cuda de balanseke peyda bike. Lê nivîskar ji vê zehmetiyê azad e.

Wergêr û zanîna zimên

Pîvanên ji bo wergêrên zimanên din tînin bikaranîna, ji bo yên kurdî jî derbas dibin. Ji ber vê yekê, divê wergêr berîya hertiştî, di warê rêziman, hevoksaftî û stîlistîka kurmancîya nivîskî de xwedîyê/a zanîneke pir baş be. Ev xusûsiyet di ser hertiştî

re ye. Ji bo karê wergerê, ya herî bingeh ew e; bêyî wê nabe. Ev taybetîya ha, di pêvajoya wergerê de bi mirov re çênabe. Dibe ku di pêvajoya wergerê de, ev taybetî xurttir bibe, lê ji bo destpêkirina vî karê ku pisporîyekê dixwaze, berê ev taybetî pêwîst e. Yanî divê piştî ku mirov di warê zimên de xwe amade kir û piştî ku ev taybetî li ba mirovî çêbû, mirov dikare dest bi karê hinerê wergerê bike.

Ji derveyî zanîna zimên, taybetîyeke din, an şiyaneke din jî heye ku divê bi wergerî/ê re peyda bibe. Ew jî ev e; gava mirov di nivîsê de tiştek fêhm nekir, divê mirov di destpêkê de, ji nivîskarê/a nivîsa orijînal nekeve şikê ku ew tiştên bêmahne dinivîsîne. Ji berdêla wê, divê mirov wê şiyana xwe derxîne pêş ku mirov bi xwe ew fahm nekiriye. Yanî divê şiyana têgihîştina netêgihîştinê bi mirov re hebe û divê li ba wergeran berîya şikê, hisên rêza li hember nivîskarê/a teksta orijînal peyda bibin. Ev bi qasî zanîna zimên ne girîng be jî jê ne kêmtir e. Gava ev taybetîyên ha bi hevdu re, bi mirov re peyda nebin, divê mirov ne xwe li wergerîyê bike bela û ne jî têkeve tora wê. Hin xusûsiyetên din henin ku li gora zanîna ku min li jorê anî zimên, ne ew qasî girîng in. Ji ber ku gava xusûsiyetên li jorê hatin nivîsandin, bi mirovî re peyda nebin, ji xwe, xusûsiyetên din hebin jî şertên wergerbûnê pêk nayên.

Gelek caran weha ye ku mirov bi zimanê orijînal pir baş dizane û ji ber wê yekê ye ku mirov dibêje qey mirov dikare wergerîne zimanekî din. Helbet, zanîna di warê zimanê orijînal de, pêwîst e. Bo nimûne; gelek kes henin ku bi tirkî baş dizanin, li malên xwe jî fêrî kurdî bûnin û bêyî ku li ser zimanê kurdî baş bixebitin û zanînen di vî warî de henin werbigirin, divê qey ew ê bikaribin ji tirkî wergerînin kurdî. Ji ber ku ew weha bawer dikin ku zanîna wan a tirkî têrê dike. Lê tevî wê jî ev bawerî şaş e. Ji ber ku zanîna herî kûr ji bo zimanê ku mirov dê wergerîne pêwîst e û gava mirov herdu zanînan bide ber hevdu, ev ji zimanê ku mirov jê werdirgerîne jî girîngtir e. Bo nimûne li Swêdê, gava mirov bixwaze di warê wergerê de bibe desthilatdar, mirov miracaetî dezgeheke taybetî dike. Wê gavê divê mirov diyar bike, bê mirov dê ji bo kîjan zimanê bibe desthilatdar. Yanî bo nimûne; mirov dê ji swêdî wergerîne kurdî, an jî ji kurdî wergerîne swêdî. Ji ber ku imtihanên wan cuda nin, ji bo her yekê imtihanêke taybetî heye. Mirovek dikare bi swêdî pir baş bizanibe, lê tevî ku kurdîya wî mirovî baş be jî di wê de, bi qasî swêdî ne şareza be. Ew mirov dibe ku dikare ji kurdî wergerîne swêdî, lê nikare ji swêdî wergerîne kurdî. Hin werger dikarin hebin ku bi salan desthilatdarên wê bin ku ji swêdî werdirgerînin kurdî, lê desthilatdarîya wan ji bo nivîsên ji kurdî werdirgerin swêdî tune bin.

Ger mirov dê bibe wergerê/a nivîsên herdu zimanan, bo nimûne, ger mirov dê ji

swêdî wergerîne kurdî û ji kurdî wergerîne swêdî, wê gavê divê mirov herdu zimanan pir baş bizanibe û li ser vî bengehî, desthilatdariya wergera herdu zimanan werbigire. Ev ji bo wergêrên resmî derbas dibe.

Li gora min, ya herî baş ew e ku mirov berê wergerîne zimanê xwe yê bav û kalkan (ji qewla hinan, zimanê zikmakî). Ji ber ku mirov zimanê xwe bi her awayî baştir dizane. Ev divê neyê wê mahneyê ku wekî din nabe. Belê, wekî din jî dibe. Lê li gora min, ya baş, ya herî îdeal ew e ku zimanê mirov ê duduyan bibe zimanê orîjînal, yanî zimanê nivîsa ku dê bê wergerandin û zimanê mirov bi xwe jî zimanê wergerê be. Mirov ê ku nuh dest bi vî karî bike, ji zimanê xwe dest pê bike, yanî berê wergerîne zimanê xwe dê baştir be. Lê mixabin, ev li ba kurdan bi awayekî pir berevajî pêk tê. Ji ber ku problema gelek kurdan a herî mezin ew e ku ew bi zimanê xwe pir baş nizanin. Ev jî di vî warî de, taybetîya rewşa kurdan diyar dike.

Tiştêkî din jî heye ku divê ew jî bi kurtî bê diyarkirin; wergêr hem pisporên zimên û hem jî pisporên beşekî jîyanê nin. Bo nimûne; ger mirov wergêrê/a beşê hiqûqê be, divê mirov li gel pisporîya zimên bi giştî, di warê zanebûna hiqûqê de jî pir baş be. Ger mirov wergêrê/a bazara kar be, divê mirov li gel zanebûna zimên, qanûn û termînolojîya li wê qadê derbas dibin jî baş bizanibe. Yanî mirov wergêrê kîjan beşê jîyanê be, divê mirov li gel zanebûna zimên, xwediyê/a zanebûna prensîp, qanûn û termînolojîya wî beşê be jî.

Meslek û hobi

Hin wergêr henin, berî wergerê pirtûka ku dê wergerînin ji serî heta binî dixwîne û dû re dest bi wergera wê dikin. Lê hin jî henin, pêwîst nabin ku berê giştî bixwînin, hema raste rast dest bi wergerê dikin. Li gora wan, ji ber ku ew profesyonel in û li gora karên ku dikin, pereyan werdigirin û bi wan pereyan debara xwe dikin, tu lukseke wan a weha nîne ku berê bixwînin û dû re wergerînin. Ew bi vî awayî naxwazin eynî karî du caran bikin. Ji ber ku ew di pêvajoya wergerê de, ji xwe dixwînin. Dû re -gava bo nimûne ger pirtûkê dê werbigere kurdî- ji bo kirasê kurdî tam lê bibe û uslûbê tam bibe uslûba kurdî dixwînin û cara dawiyê jî ji bo teshîhê dixwînin. Yanî bi vî awayî, wergêrêkî/e profesyonel ji xwe bi kêmanî, sê caran dixwîne. Wergêrên profesyonel ji hin deveran, bo nimûne ji weşanxaneyan bi heqê xwe kar werdigirin û li gora karên ku ji wan tên xwestin dixebitin. Carinan jî çend karan bi hevdu re werdigirin û dema qedandinê jî diyar e. Ji ber vê yekê, gelek xwezayî ye ku awayê xebata wan jî cuda be.

Wergêrên ku bi vî karî xwe xwedî nakin, piraniya caran ew ê kîjan pirtûkê wergerînin, ew bi xwe biryarê didin û ji ber vê yekê jî hem ji aliyê hilbijartina berhema ku dê bê wergerandin azadtir in, hem ji aliyê demê ve bêhna wan firehtir e û hem jî ji aliyê awayê xebatê ve luksa wan heye ku beriya ku wergerînin, berhemê carekê, an du caran bixwînin.

Bila kes nefikire ku wergerên wergêrên profesyonel hertim ji yê nêdeel baştir in. Ji ber ku ji bo wergêrên profesyonel, ev karekî ticarî ye, ji ber vê yekê, ew gelek caran ji bo karên xwe di dema xwe de biqedînin, mecbûr in ku bi lez û bezê bixebitin. Ev jî carinan tesîrê li qalîteya wergerê dike. Ji xwe, em gelek caran li wergerên bêhûrbijar rast tên. Lê divê ev neyê wê mahneyê jî ku wergerên îdeel ji yê nê profesyonel baştir in. Li herdu alîyan jî hem wergerên biqalîte û hem jî yê nê di ser guh re hatînin avêtin henin. Li vê derê, tiştek heye ku divê ji bo herdu alîyan bingeh be, ew jî zanîna di warê zimên de ye. Mirovê/a ku ne desthilatdarê/a wî zimanî be ku dê berhemê wergerîne, wek min berê jî behs kir, divê xwe li vî karî ranekişîne.

Ji ber ku carinan hin dibêjin, min wergerandiyê, ji kerema xwe re li zimanê wê binihêre û rast bike. Gava mirov lê dinihêre ku kiras ne kirasê kurdî ye, wê gavê dibêjin, kurdîya me zêde ne xurt e, lê hêdî hêdî çêdibe. Divê em hewil bidin ku wergera kurdî ji vê belengaziyê rizgar bikin û yê nê kurdîya wan ne xurt be, ji kerema xwe re, kengî kurdîya wan xurt bû, bila vegerin vê meydanê, da em bikaribin wê gavê feydeyê ji karên wan bibînin û kurdî jî bi keda wan geştir û şêrîntir bibe. Ji ber ku beriya karê wergerê, karekî wan î din heye ku divê kurdîya xwe pêş de bibin û gava gîhaştin wê qonaxê ku zanîna wan a kurdî têra wergerê dike û ger ew jî dixwazin vî karî bikin, bila dakevin qada vî hinerî û pîreyên navbera kulturana ava bikin. Di warê wergerê de, rêya herî baş ew e ku divê em ji bo profesyonelkirina vî karî bi awayekî cidî bixebitin.

Divê em bi xwe rûmetê bidin zimanê xwe û prestîja wî bilind bikin

Ji bo vê yekê jî werger pêwîst e. Yek ji wan sitûnan werger e ku divê em xwe bispêrinê. Loma divê kurd bi awayekî pir cidî li ser wergerê rawestin. Divê em rûmetê bidin zimanê xwe û nehêlin ku li gora zimanên din, bi kêmanî di jîyana me de, têkeve dereceya duyem. Ger em weha nekin, wê gavê heqê me tune ye ku em xweşbîn bin. Wê çaxê, gava em îdîa dikin û dibêjin, em ji bo nasname û kultura xwe têdikoşin, ji naveroka xwe bêpar û wek sloganeke vit î vala dimîne. Heta weha be, em sedsalî jî di ber xwe de bidin, û di wê berxwedanê de, nêvîyê me jî tê de here, ji

yên mayî re tu mîras namîne ku pê şêxsîyeta xwe ya neteweyî xurttir bike.

Divê zimanê me li ba me, nemaze jî li hember erebî, tirkî û farisî, xwedîyê prestîjeke taybetî be. Divê prestîja tu zimanî, li ba me ji ya zimanê me ne zêdetir be. Ger em weha nekin, ji berdêla zimanê xwe, prestîjê bidin zimanên din, kurdîya me dê nikaribe xwe li ber wan bigire û ew ê bi destên me têkeve rewşeke xerab. Ne hew asîmilator, helwêstên di vî warî de henin jî tesîrê li pêvajoyê dike.

Werger pêwîstîyek e, lê ji bo kurdan, awayekî lêbixwedîderketinê ye û li dijî asîmilasyonê jî keleheke me ya xurt e. Gava ji tirkî, erebî an farisî pirtûkek wergerîya kurdî, divê em nebêjin "Ez dikarim vê pirtûkê bi zimanê wê ye orjînal bixwînim. Ji ber vê yekê, ne hewce ye ku ez wergera wê ya bi kurdî bixwînim". Ger em weha bikin, wê gavê, kurdî bi tenê ji wan kesan re dimîne ku ji derveyî kurdî bi tu zimanên din nizanin. Ev ji bo zimanên xwedîyên dezgehan in û misogerîya berdevarîya wan di misteweya dewletan de hebe, dibe ku ne pirseke zêde girîng be. Lê ji bo kurdan û ji bo kurdîya ku hin dixwazin wê rojekê berîya rojekê gor bikin, helwêstên taybetî pêwîst in. Hinerê wergerê di vî warî de jî sitareke me ya mezin e ku divê em xwe lê bigirin. Lê berîya wê, divê li ba me, prestîja wergera kurdî pir bilind be.

Gelo ger nivîskarên kurd bibêjin, "Xwendevan bêtir bi tirkî, erebî an farisî dizanin, em ê bi wan zimanan binivîsînin", wergêrên kurd bibêjin; "wergera bi tirkî, erebî an farisî hêsantir e, mirov di warê termînolojîyê de, tu zehmetîyan nakişîne. Ev ziman hêsantir in, em ê wergerînin van zimanan"; ger siyasetvanên kurd bibêjin; Ya girîng mesaja me ye. Em dû re dikarin li ser pîrsa zimên rawestin û bi vî awayî, zimanên jîyana me ya siyasî her zimanên biyanî bin, ma tu çirûskên hevîyê dê di pêşeroja me de xuya bibin? Ji bo ku em di derheqê pêşeroja xwe de, mişt bi hevî bin, divê em prestîja zimanê xwe, di jîyana xwe de, di jîyana kurdan de bilindtir bikin û di vî warî de hinerê wergerê jî xwedîyê roleke mezin e.

Wergêrno, ji bîr nekin ku kurdî erdekî bêav e û hinerê wergerê çemekî boş e diherike! Wergerînin! Nemaze ji tirkî, erebî û farisî wergerînin! hûn dikarin pirtûkên ku ji zimanê wan wergerîyanin kurdî nîşanî wan kesan bidin ku dibêjin; "Kurdî tune ye, ger hebe jî formeke zimanê me ya xerabe ye." Ji wan bipirsîn, bê ka çi ji wan fêhm dikin. Îcar yê ku kurdî înkâr bikin, wê gavê di serî de kultura xwe înkâr dikin, hem berhem û hem jî nivîskarên wan berheman bi xwe înkâr dikin. Helbestvan û nivîskarên ku wergerên berhemên wan bi kurdî hebin, nikarin bibêjin kurdî tune ye. Ger ew bibêjin jî xwe înkâr dikin. Di vê mahneyê de, wergera kurdî ya li dijî asîmilasyonê mertalek e, li dijî înkarkirinê jî şûrek e. Divê baş bê za-

nîn, kurdîya ku bû mijarê wergerê, êdî nema dikare wek berê bimîne. Ji ber ku werger pêşveçûneke bileztir li ser zimanê wergerê ferz dike. Werger zorê dide sînoran û zimanê wergerê tevî kultura wergerê, bi gelek kulturên cuda, awayê fikirandin û têgihîştinên cuda cuda re rû bi rû dike. Divê zimanê kurdî ji vê îmkanê bê par neyê hiştin.

Her çi qasî di kurdî de mînaqêşeyên li ser wergerê, ne pir kevin in jî em dibînin ku tradîsyoneke wergerê hêdî hêdî li ba me jî bi cîh dibe. Ev hêviyê dide mirovî. Lê ji bo ku werger bi fonksiyoneke temam tesîra xwe diyar bike, divê em di vî warî de, baş agahdar bin û her sal bi kêmanî bi qasî ku em dinivîsînin, an jî du qatê nivîsandinê, ji zimanên biyanî wergerînin kurdî. Bila wê gavê, kurdî di meydana danûstendina çand û zimanan de, bi serbilindî here û were û bila wergêrên vî zimanî pîreyên mezin ava bikin, da ev ziman jî xwe pê bigihîne her deverên cîhanê. □


Li herkesî guhdarî bike, guh bide şîretên herkesî, lê bi a xwe bike.

F. Cewerî

Du celebên pozbilindî û quretiyê hene; yek jê yê ku pir qala xwe dike û pesnê yên kêmi xwe dide, yek jê ji yê ku qala xwe nake lê kesî jî naecibîne.

F. Cewerî

Hermann Hesse (1877-1962)



Hesse roja 2. 7. 1877 li Calw/Württemberg (Almanya) hatiye dinyayê. Ew kurê yekî mîsoner bûye. Di xortaniya xwe de ew wek pirtûkfiros xebitiye. Ji sala 1900 pê ve Hesse wek nivîkar û rexnegirê edebiyatê jiyana xwe dewam kiriye.

Wî di romanên xwe yê despêkê *Peter Camenzind* (1904) û *Unterm Rad* (1906) de dema dibistana xwe afirandiye. Her ku çû di berhemên wî yê edebî de bandora felsefeya rojhilatê xwe diyar kir. Wî bi taybetî ev yek di romana *Siddharta* (1923) de aniyê zimên. Rawestina wî ya li ser Psycho-analyse di romana bi navê

Demian (1919) de bi tehrekê edebî hatiye hûnandin. Di şerê cihanê yê yekê de Hesse wek hevkarê Xaça Sor a Almanyê xebitiye. Li dijî militarîzma Almanyayê derketiye û di sala 1919an de li Siwîsre bi cih bûye. Di sala 1923an de hemwelatiya Siwîsreyê wergirtiye. Li wir wek pasîfistekî xwe daye pêş. Wî bi Romain Rolland û Stefan Zweig re hewl daye ku elîta Ewrûpa li dijî wehşeta şer bixe nava tevgerê.

Digel pir xelatên din yê edebiyatê Hesse di sala 1946an de xelata Nobel a edebiyatê wergirtiye.

Hermann Hesse roja 9.8.1962 li Montagola ya nêzîkî Lugano (Siwîsre) çûye ser heqîya xwe.

Name ji yekî komunîst re

HERMANN HESSE

Formulekirina bîr û baweriyên min ên di derheqa komunîzmê de ne dijwar e. Niha komunîzim (ku ez jê bi tevahî armanc û ramanên Manifesta Komunîst a kevin î marksî fam dikim) pêkanîna xwe li dinyayê dide qebûl kirin. Dinya ji vê yekê re kemilî ye. Ev tişt ne bes ji cergî ku sistema kapîtalîst nîşanin gelek vekirî yê hiltweşînê rê dide, wanî ye. Bi teybetî ji cergî ku Sosyaldemokrasiya- "Piranî" jî alaya şoreşger bi tevayî terk kir û vir de ev wusa ye.

Ez komunîzmê ne bes xwedî maf dibînim. Ez wê wek tiştê ku divê pêk bê dibînim- angû ku em li dijî wê bin jî, ew ê bê. Kî îro li aliyê komunîzmê ye, ew pêşerojê dixwaze.

Ji vê erêbûna ku aqlê min ji bo programa we ji min re dibêje û pê ve, ji cergî ez dijî dengê di nava min de heye ku ji bo bindestan dipêyive; ez her dem ji bo kesên ku tên çewisandin li dij zorkeran, ji bo kesên ku tên sûcdarkirin li dijî dadgêran û ji bo kesên birçî li dijî kedxwiran derketime. Lê min ê ev hisên xwe, yê ku bi min xwezayî tên, tu carî wek komunîzm binav nekirina, bilakîs min ê bêtir ew wek hisin xiristiyaniyê bi nav bikirna.

Ango: Ez bi we re di wê baweriyê de me ku riya marksî piştî kapîtalîzma li ber mirinê, rizgarbûna proleteriya ye. Ew riya pêşerojê ye. Dinya bixwaze jî nexwaze jî divê di wê re derbas bibe.

Hetanî vir ez û hûn bi hev re ne.

Lê ez texmîn dikim ku hûn niha dipirsin: Ku tu ji rastiya komunîzmê bawer

dikî û tu alîgirê kesên bindest î, çima tu bi wan re danakevî qada tekoşînê û tu pênuşa xwe naxî xizmeta partiya wan?

Dana bersîva vê pîrsê dijawab e, ji ber ku mebest li vir tiştin in ku ji bo min giring û pîroz in, lê ji bo we çî bigre ew nîn in. Ez ji binî ve red dikim ku ez wek endamê partiyê derkevim an jî nivîskariya xwe bixim xizmeta programa we. Her çiqas ku ramana hevallî û biratiya dunyayek ji kesên ku di eynî fikrê de ne bi min jî cazîb e.

Lê ez û hûn ne di eynî fikrê de ne. Ji ber ku ez armancên we bipejirînim jî, yan jî bi gotinîna vekirî: Ku ez bawer dikim dema komunîzîmê hatiye, ew ê di despêkê de bi rijandina xwîna û şer bê ser hikim û berpirsariyek pîrr mezin bigre ser xwe- lê ji bo min ev wek ku ez dizanim wê piştî meha Mijdarê di demek kurt de zivistan bê. Baweriya min bi komunîzîmê wek programa dema mirovatiyê a pêşerojê heye, ez wê pêwîst dibînim. Lê dîsa jî ez ji bo vê qet bawer nakim ku komunîzîm jî pîrsên jiyana yê mezin re xwedî tu bersîvên çêtir ji yê ilm û felsefeyên berî xwe ye. Ez bawer dikim piştî teoriya sed salan û tecrûbeya mezin a Rûsyayê him maf û berpirsariya komunîzîmê heye ku ew xwe li dunyayê pêk bîne û him jî ez ji dil bawer û hevî dikim ku ew ê di rakirina birçîbûnê de bi ser keve û barekî pîrr mezin ji ser mirovan rabike. Lê ez bawer nakim ku bi vê yekê, ew tiştên ku berî bi sedsalan ol, qanûnçêker û filozofên demên berê nikarîbûn pêk bînin dê pêk werin. Ez bawer nakim ku komunîzîm jî daxuyaniya mafê herkesî yê ji bo nên û qîmeta şexsî pê ve ji tu baweriyên berî xwe çêtir e. Rehên wê jî sedsala nozdan, ji nava erdeke hişk û reşîtarî a hikumdariya êqil tîn, ji keleha pîrofesoren ku xwe ji hemû kesî zanetir dihesibînin, lê bêfantezî û evîn in. Karl Marks di vê dibîstanê de fêrî fikirîna bû, nerîna wî ya dîrokê a Ekonomîstekî Netewî, a spesyalîstekî geure ye, lê ew ji tu nerînen din, ne "rasttir" e, ew fewqelade yek alî ye û ne elastîk e: Qîmet û meşrûtiyeta wê, ne di mezinhîya maneviyata wê de ye, ew di bibiryarbûna a ji bo kirinê de ye.

Eger em îro ji dêvla sala 1931ê ve di ya 1831ê de bûna, bi ihtîmaleke mezin dê qolinc û heja sibe û dusibe, min wek helbestvan û nivîskar bêhuzûr bikirina û min ê ji bo demekê hemû hêza xwe bida famkirina serûbinbûna ku her diçû nêzîktir dibû. Di wê demê de helbestvan Heinrich Heine jî wisa kiribû. Ew ji bo demekê, belkî di dema temenê xwe ya herî biber de, li Parîsê bûbû heval û hev-

karê Karl Marxê ciwan. Lê îro wê eynî Heine, dîsa ji dêvla ku tiştêkî ji mêj ve diyar bûye ku rast e û divê bê pêkanîn bêtir ji bo sibe û dusibe elaqe rê bida. Ew ê îro bê dijwarî têbighîsta ku sosyalîzîmê dibîstana xwe li dû xwe hiştiye, û yan divê ew hikimdariya dunyayê bixe destê xwe, yan jî ew têk çûye. Û wî ê ev bûyer, nîzama dunyayê a komunîst bipejiranda û rast bidîta, lê wî ê tu daxwaz his nekira ku ew bi xwe têkeve ber wê erebeya ku bihêz digindire; wî ê nexwesta wê bi dû xwe de bikşîne.

Helbestvanek, nivîskarek, ji wezîrêkî, muhendîzêkî an jî axîftvanekî gel ne çêtir e, û ne jî tu tiştên wî ji yên wan kêmtir in. Lê ew tiştêkî ji wan pîrr çihêtir e. Bivir her bivir e, mirov dikare bi wî yan daran biqelêse, yan jî seriyên. Lê saetek yan jî barometreyek bi kêrî tiştin din tên. Ku mirov bixwaze bi wan dar an seriyên biqelêse, bêyî ku kesek ji wan tu fêdê bibîne ew ê xera bibin.

Vir ne cîhê ku mirov yek bi yek qala valîni û fonksiyonên nivîskar û helbestvanan wek wesîteyêke taybetî a mirovatiyê bike û wan îzah bike. Belkî ew di vucûdê mirovatiyê de cûreyek reh (nerve) e, organek ji bo ku bangkirinên nazîk û daxwazan his bike, ew organa şiyarkirinê, îkazkirinê û balkişandinê ye. Lê ew ne organeke ku mirov bi wê afîşan (plakatan) binivîsîne û bi dîwaran ve daliqîne. Ew bi kêrî bangên li meydana nayê, ji ber ku hêza wî qet ne di dengê bilind de ye. Hitler dikare wê pîrr çêtir bike. Lê karê nivîskêr çî dibe bila bibe: Ew bes xwedî qîmet e û mirov dikare bi wî bawer bibe ku ew xwe nefroşe û nehêle mirov wî bi kar bîne, ango ku ew ji dêvla ku xiyanetê bi tiştê di nava xwe de re bike, ezab bikşîne an jî bimre.

Karl Marx jî bo edebiyat û hunera paşerojê-vek mînak ji bo ya Yûnanîstanê pîrr elaqe rê dida, û belkî ku ew di xalek ji ilmê xwe de ne tam durust be, ew jî ew yek bû ku li gel zanabûna xwe, wî huner ne wek organek mirovahiyê, berovajî, wî, ew bes wek pariyek ji "seravahiya îdologiyê" dipejirand.

Na bilakîs, ez dixwazim we komunîstan îkaz bikim ku hayê we ji wan nivîskar û helbestvanên ku xwe pêşkêşî we dikin hebe; ango ji wanên ku bi kêrî qêrîn û tekoşînê tên! Elaqeya komunîzîmê bi edebiyatê re pîrr tune ye, di dema Marx de jî ev wisa bû û di roja me de elaqeya wê hîn hindiktir e. Bi ya min komunîzîm wek hemû pêlên hukmê maddî wê Edebîyata Bedew bixe xeterê, ew ê ji bo qalîteyê ne xwedî pîrr his be, û ew ê bi gavên hêdî pê li gelek şepahîyan bike

û wan bêpoşmanî bikuje. Ew ê hemû herifandin û nîzamên nû bîne heta ku ji bo civata nû mala nû hat avakirin û wê gelek xirbe li dû wan bimînin. Tiştêkî ne li rê ye ku em wek hunermend li wir mîna hevkarên kar bikin. Mirov ê di wê demê de bêtir bi me û tirsên me yê zîravbihîstyar bikenin û ew ê gelek caran ji dema borjûwazî hîn kêmtir rûmetê bidin me.

Lê wê zû di mala mirovahiyê ya nû de dîsa bedbextî çêbibe, û piştî ku tîrsa birçîbûnê nemîne, dê diyar bibe ku mirovên ji rêzê û yê pêşerojê jî xwedî ruh in, û ev ruh jî cûreyên birçîbûn û hewcedariyên xwe li gor înstînkî û mecbûriyeta xwe diafirîne. ß înstînkî, îhtiyaç, daxwaz û xewnên vî ruhî di hemû tiştên ku mirovahî difikire, dike û dixwaze de, xwedî parek mezin in. ß ku wê demê pisporên ruh, ango hunermend, nivîskar, birewer, şewirmend, kesên ku di ber dil de bidin û rêber li wir hazîr bin, wê ji bo mirovahiyê çetir be.

Nuha vatîniyên we baş diyarin. Hûn komunist xwediyê programeke vekirî ne ku divê hûn ji bo pêkanîna wê hewl bidin. Di dema em tê de vatîniyên we ji yê me pîrr zelaltir, cidîtir û pêwîstir xuya dikin. Lê wek gelek carên berê, dê ev jî bêguhertin.

Belkî hûn ê bi mafê yekê di şer de nivîskarekî li vir, an li deverê din bikujin, ji ber ku ew ji neyarên we re kilamên şer dinivîsîne; bi ihtîmaleke mezin wê pişt re diyar bibe ku ew qet ne nivîskar bû, lê ew bes nivîserê pîlakatan bû. Lê ku hûn bawer bikin kesê nivîskar wasîleyek e ku her carê çîna serdest dikare wî wek koleyekî an jî meharetêkê bikar bîne, hûn ê zerara wê bi xwe bibînin. Hûn ê bi vê fikra xwe tev nivîskarên xwe bişemîtin û şaş bibin û wê bi taybetî ewên bêkêr bi we re bimînin. Lê ku hûn pişt re bixwazin hunermend û nivîskarên rastî nas bikin, hûnê bikaribin bibînin ku ew kesin wisa ne, ku hewcedariyeke wan a bêpîvan ji bo serxwebûnê heye, û kesek bixwaze wan mecbûrî kirinike ne li gor wijdanê wan e bike, ew tavilê dev ji kar berdidin. Ew ê ne bi zor û bertilê, ne jî bi mewkiyên bilînd bîn kirin, û ew ê ji dêvla ku xwe bidin bikaranîn, ew ê xwe bikujin. Ji van tiştan hûn ê bikaribin wan nas bikin.

(1931)

Wergera ji almanî: HUSÊN DÜZEN

Seydayê Mela Ebdulsemed



BEDIRXAN EPÖZDEMÎR

Seydayê Mela Ebdulsemed

Dema min xebera wefata çinara mezin, mamostayê payebilind Seydayê Mela Ebdulsemed bihîst, ez pir êşiyam; lerizîm, qamqurffî bûm, ji taqetê ketim. Ji 15ê Adarê heya îro min gelek caran xwest ku ez li ser jîyana Seyda rawestim. Lê divê bi resteqînî bêjim; ez û pênuşa xwe li himberî xebera reş bêhêz ketin. Çinkê Seyda ji bo min gelekî watedar bû. Careke din mala xerîbîyê bişewite, careke din bila navê mirinê bêbext be.

Ez navê bi gotinên xaf û yên kevnar li vir pesnê Seyda bidim. Bawer im ku wek her kesê gernasên gel yên esl pêwîstiya Mamostayê mezin bi vana tune. Gerek insan ne bi gotinan lê bi kirinên xwe bêne yad kirin. Ku em bivên ew di gora xwe da rehet razên û hestiyê wan di gorê de jan nede, gerek em xebera wan ji xwe re wek nimûne bibînin.

Jîyana Seyda, jîyaneke dûr û dirêj bû. Di wê jîyanêda wî gelek eza û cefa dît. Lê jîyaneke bi rûmet bû. Tim serbilin û bextiyar bû. Ketibû şoreşa Şêx Seîd efendî. Di sala 1946an de li gel bavê xwe, bi alaza tevlibûna Komara Mehabadê, peyarî ketine rê. Lê mixabin sedema hinek astengan, ne gihîşine wî mirazê xwe yê pîroz.

Kî çi dibêje, bila bêje rola medresan di jîyandina çand, zimen û dîroka gel de pir giring e. Em gelek tişt deyîndarên seyda û alimên xwe ne. Wan li ser reyên Feqîyê Teyran, Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî şin bûne. Wek berdevkê wan, wana gîhandine dema me. Me ji wan ramên xweş û hêjayan bêpar neheşine.

Seyda li gelek deverên Kurdistanê di medreseyan xwe de bi sedan feqî û melayên welatparêz gîhandine. Di hişyarkirin û rêzbûna gel de bandora feqî û melan nayê înkare. Mamostayê nemir, Seydayê Mela Ebdulsemed li Şamê bi nûnerê ronesansa

kurd Mîr Celadet Bedir-Xan ra hevdîtîn çêkirîye. Sedema wê hevdîtîne di sala 1943an de li Terwanê di heqî wî de doz hatîye vekirin. Ji bilî wê dozê ji sala 1952an heya sala 1988an ji ber ramiyarî û xebatên xwe yê welarparêzî û olî hatîye girtin û di heqê wî de doz vebûne. Lê ewî tucarî li himberî dagirkeran serê xwe nizim nekirîye. Bi inyat heya dawîya temenê xwe, ji bo edlayî, aşîtî, biratî, wekhevî û evîniyê rêkoşaye.


Seyda nefspiçûk bû. Bi mezinan re mezin, bi piçûkan re piçûk bû. Remza dilsozî û dilovanîyê bû. Bi bejin û bala xwe, bi rûyê xwe yê bi ken, bi rîyê xwe yê ku nûr jê dibarî bawerî û moraleke bilind dida meriv.

Min Seyda di sala 1968an de nas kir. Pêwendîyên me li welat tim zindî bûn. Wek merivekî tî û birçî min lê zîyaret dikir. Ez ji wê kanîya zelal û sifra dewlemend têr nebûm. Sohbet û şîretên wî pêşîya min vedikir. Dema sala 1980 ê ewrên reş ezmanê welat girtin, ez terkê welat bûm. Min bi salan hesret û kesera wî kişand. Di nav mercên dijwar yê penahendîtiyê da bi telefonan car-caran min bêna xwe derdixist. Gava digot Bedirxanê min (li xerîbîya xopan du kes bi vê xitabê moralê min geş dikirin. Yek Seyda bû, yê din jî rehmîtiyê Heçî Dirsîn bû. Ku ew jî berî salekê çû ser dilovanîya xwe. Herdu jî heval û dostên hev yê dilsoz bûn.) Min kul û xem jibîr dikir. Dengê wî sê mehan têra min dikir. Piştî 12 salan ku ez vegeftiyam welêt dotira rojê ez çûme zîyaretîya Seyda. Bi hesreta salan min ew himbêz kir, destê wî maçî kir, ew bèn kir. Qey eyb e ku ez bêjim? Ez têr girîyam. Ew jî kelogirînî bû. Berdîlya da ber dilê min. Min hêsa kir. Va ku em tenê bimînin. Ji mêhvanan îcaze xwest. Em li ku mabûn, me li wê dom kir. Ketine nav sohbetên kûr û me da-wî li şevê anî.

Seydayê Mela Ebdulsemed sala 1908an li gundê Xorosa Hîzana Bedlîsê hatîye dinê. Kurê seydayê mezin Mela Osmanê Xorosî ye. Mela Osman tenê ne li navçeyê lê li seranserê welêt alim û tekoşêrekî bi nav û deng bûye. Mamostayê nemir Mela Ebdulsemed roja 17ê Adara 2001ê de li Îzmîrê, di Nexweşxaneyê Zanîngaha Egeyê bi ruyê xwe yê ken, bi menewiyateke bilind çû ser dilovanîya xwe. Seyda di 17ê Adara 2001ê de li Terwanê ji hêla girseya gel ya mezin ve hate pêşwazîkirin û li rexê mizgefta xwe hate veşartin. □

10. Gulan. 2001

Di edebiyatê de bûyerên dîrokî



ŞEREFXAN CIZÎRÎ

Romana ku li ser mijareke dîrokî Rhatiye nivîsandin, gelo pêwîst e çawa were ava kirin? Ma tu danûstandin di navbêna dîrok û edebiyatê de heye gelo? Edebiyat a ku li ser mijareke dîrokî ava bibe û edebiyata ku li ser psîkolojiya kesayetiyê raweste, di kîjan waran de ji hevdû cihê dibin, an jî çawa hevdû timam dikin? Li ser van pirsan mirov dikare gelekî bibêje û bikole. Mirov dikare ji aliyê zanyarî de, di vê tevgirêdanê de hûr û kûr lêxîne. Kurdan heta niha bi zanyarî qala van pirsan qet nekirine. Lê di dîroka edebiyata Rojava de ev pirs pir caran hatine bersivandin. Bi hawayekî kûr li ser vê mijarê hatiye rawestandin. Metod û normên edebî hatine nîqaşkirin. Romana dîrokî weke hîmke bingehîn ya romana nûjen tê şîrove-

kirin. Îro jî romana dîrokî xwedî cihêkî bi taybetî ye. Hema hema hemû nivîskarên navdar xwe carekê li vê mijarê ceribandine. Ji ber ku mijareke balkêş e. Li ser vê mijarê bi taybetî mirov dikare vê yeka hanê bibêje; wexta ku welatperwerî pêş de diçe, weke mijareke edebî di romanê de, di edebiyata welatekî de xeta romana dîrokî pêş dikeve. Hişmendiya welatperwerî û dîroka civatekê raserî hevdû dimeşin. Li hevdû dibanin, bi hevdû şa dibin, ji hevdû hêz digirin. Wexta ku Walter Scott li ser welatperweriya scottiyan dinivîsand, wî bi taybetî dîrok û lehengên welatê xwe derdixistin pêş. Welat û gelê Scotlandî bilind dikir. Dîsa wexta ku Firdewsî Şahname xwe dinivîsand, dîrok û lehengên gelê Îranî derxistin pêş. Lehengiya

Ristemê Zalê bi alîkariya Firdewsî derkete pêş û li himberî moxolan hate bikaranîn. Bi kurtî; wan herdû nivîskaran û gelekên din dîroka gelê xwe nalet ne dikirin, ne diricimandin, gelê xwe biçûçik nedikirin, etnîsîta xwe xayîn îlan nedikirin... Eksê wê gel û dîroka xwe bilind dikirin...

Rastiyeke dîrokî li vir heye; wexta ku edebiyat ji xwe re dîrokê weke mijar hildibijêre, wê gavê bi haweyekî objektîf û bi hişmendî motîfên welatperweriyê û perwerdekirina mirovan derdikeve pêş. Hişmendiya welatperwerî bi fêrbûna dîroka welêt re geş dibe. Hilbet di warê vê xeta roman û dîrokê de dîtînen cihê cihê jî hene. Ev jî hilbet weke hemû tiştên din in... Lê belê li vir emê zêde li ser dîtînen giştî ranewestin. Bi taybetî di romana Mîrza Medenî Ferho de ev mijara hanê çawa hatiye nixxandin, ez ê li ser vê yekê hinekî rawestim.

Romana Mîrza Medenî Ferho bi navê "Marê Di Tur De" gîhaye xwendevanên xwe. Hema di destpêkê de em dikarin bibêjin; Mar di zargotina kurdan de sembola bêbextî û xayintiyê ye. Ango ji serî de Mîrza Medenî Ferho biryara xwe daye ku di herêma xwe de hinekan xayîn îlan bike. Mijar bi simbola mar û etnîsîta kurdan re tê hûnandin û bi motîfên xayîntî, bêbextî, nezanî, poşmanî, pesindan, şelafî, berberî ûhw tê xemilandin. Li ba marê Medenî Ferho kew jî hene hilbet, kewê ku li ba Medenî Ferho dibin xayîne cînsê xwe...

Kurdan li kewan wilo kiriye dibêje nivîskar...

Nivîskar di romana xwe de, bi raya min mijareke balkêş tîne ziman. Ev mijar bi timamî li herêma Tora Hevêrkan derbas dibe. Di vê romanê de gelek tişt hene; berberiya hevêrkiyan, jiyana toriyan ya rojane, bi giştî ya eşîra hevêrkiyan (ne ya hevêriyan weke ku nivîskar dinivîsîne, xelk dibêje hevêrkî nabêje hevêrî) û bi taybetî jî malbata axayên hevêrkiyan. Heger mirov hîna jî bi wir de here, ewê mirov bi hêsanî baş bibîne ku hinek axayên hevêrkiyan nivîskar ji xwe re kirine mijara romanê. Mirov bi hêsanî dikare bibêje ku axayên ku dilê nivîskar ji wan re dixwaze bûne mijara romana wî. Hilbet ev mijar, bi raya min hêja ye ku mirov li ser binivîsîne, bi bîr bîne, nîqaş bike, analîz bike û çî weke mijareke edebî an jî çî weke mijareke dîrokî vê rastiya civata xwe raxewber çavên xwendevanan. Lê wê gavê divê mirov di vî warî de zêde şelafîyan, pesindanan û dilbijandinên xwe yê şexsî jî dernexîne pêşiya rastiya civatê. Roman nabe bibe platformeke subjektîf li himberî hinek kesan. Divê mirov hewl bide ku civat û dîroka xwe weke ku ew objektîf heye binixîne û avaniya vê civatê bi metodên zanyarî di nava tekstên romanê de bihûne. Wana di nava tekstên romanê de bi hosteyî bi kar bîne. Ango bûyerên dîrokî di nava tekst û hevokên romanê de, divê bi hosteyî û bi vate werin raxistin...

Di jiyana me ya rewşenbîrî de ev mijarên ku em li vir qal dikin baş nehatine nivîsandin. Lê belê di kultur û edebiyata devkî de ev mijar gelekî bi berfirehî heye. Dengbêj û çîrokbêjên kurdan ev mijara hanê sistematîk anîne ziman. Wan mîraseke dewlemend ji me re hiştine. Ew bûne weke hiş û dîroka kurdan... Lê mixabin gelek siyasatmedar û rewşenbîrên weritî ew mijara girîng xistin bin hesîran. Wan bahwer dikirin ku siyasat li ser tehran cotkirin bû... Di vê navbêne de jî nalet li dîroka xwe, li bav û kalên xwe dianîn. Civata xwe diricimandin, qerfên xwe bi rêzana civata xwe dikirin. Eynî weke ku bi devê wî kesê kevnare ku di romana Medenî Ferho de derbas dibe, tê gotin; "xortanî navê nûjeniyê ye û li pêşiya demê dimeşe." Dîsa "xortanî navê guhertin û nûjeniyê ye, r. 54." ûhw. Li vê derê têgihîştîneke biyolojîk dikeve şûna têgihîştîneke sosyal û îdeolojîkî. Eşkere ye ku di nava nişên sosyal de hinek sixletên cihê cihê hene. Lê belê kamilbûna siyasî, weke ku baş tê zanîn ne di xortaniyê an jî di kalitîyê de veşartîye. Rastiya civata me ya îro zelal pêşiya mirovan dide ku kategoriya helî ji asimilasyonê re vekirîye, kategoriya xortan e û nişên nûjen in. Ewên ku di zimanê xwe de qels in, ewên ku hayê wan ji kultura wana nîne, ewên ku kesayetiya wana nerûniştî û deriziye, bi hêsanî dikarin ji nava kategoriya xortan derkevin. Ewên ku di civatan de xortan û xortaniyê îdealîze di-

kin, di rastiya xwe de kesên westiyayî ne. An jî dixwazî xortan weke alavekî siyasî û ekonomîk ji xwe re bikarbînin. Bi zimanê kurmançî mirov dikare bibêje ku barûda wan kesan wilo, ji bona têkoşîna siyasî qet nemaye. Wan hevî û barên xwe danîne ser milên xortên nûhatî...

Weke ku baş tê zanîn, ew xortên hanê ku em li vir qala wan dikin, ji gelek aliyan de xwe ne ji civata kurdan dihesibandin. Li gora wan ev civat li paş mayî bû... Ew civata ku ne li gora modernîta civata dagirkeran bû, weke civateke li paş mayî, hov û ne azad dihate nixandin. Mirov digot qey ev xort ji ba Xwedê nazilî civata me bûne. Lê ku mirov hinekî li karaktêr û sixletên wan baş bikola, ewê malê wan zû derkeve mazatê. Weke ku Miradê Kinê di straneke xwe de baş gotiye; ewên ku cênkên xwe berdidan, keziyên xwe dirêj dikirin, destek cilên ciwamêran li xwe dikirin, bazdidan serê xaniyan û digotin; em axa ne! Ango danûstandinên sosyal û civakî ji keçkanî de dixistin. Brevajî dikirin. Civat, dîrok û adetên xwe înkâr dikirin, diavêtin nava lîngan, di heriyê didan, ew dilewitandin û xwe jî bi vê yekê re paqij dikirin. Ango bi rastî zaroktî dikirin. Ew paqij û neqandîbûn û bav û kalên wan jî lewitî û li paş mayî bûn. Ew bûyera hanê ku gelek normên sosyal û psîkolojîk tê de hebûn, ewê bi rastî bikêrî psîkolog Sigmund Freud baş bihata...

Xortên civata me digotin qey radîkalîzm wilo ye... Lê di rastiya xwe de xortên civata me radîkalîzm û nihîlîzm tevlihevdu dikirin. Exlaqekî Yesûit ji xwe re pêde kiribûn. Di vî exlaqî de hemû tişt serbest dibû, ji bona ku mirov karibe bigihêje armancên xwe, îcaza hemû tiştan hebû... Tenê armanc li vir giring bû, riya ku biçûya ser armancê, çawa ba jî xem nedikir... Armanc her tişt bû û rê jî netiştêk bû!. Wan digot qey riya azadiyê û rizgariyê di vir re derbas dibe... Dijayetî bi civata xwe re û dijayetî bi sistema dagirkeran re tevlihevdu dikirin. Lê belê dihat jibîrakerin ku ev nixandî û têgîhiştin eynî weke ya dagirkerên welatê me bû...

Li ser navê Marks û şoreşgeriyê tevger dikirin. Lê dîsa jibîra dikirin ku ramanwer û şoreşgêrên weke Marks û Engels dîrokerperwer bûn, zana û filozof bûn, evîndarê edebiyat û dîrokê bûn, ji kedkaran û xelkê xwe hez dikirin, edebiyata klasîk gelekî dipesinandin, lêkolîvan bûn, Shakespeare dixwendin, Walter Scott dixwendin, Cervantes dixwendin, Dante dixwendin, Balzac û klasîkên yunaniyan dixwendin. Ango ne li dijî tiştên kevnare û klasîk bûn. Li ba Marks û Engels nihîlîzm tunebû. Di huner û edebiyatê de xeta realîstî diparastin. Di edebiyatê de daxwaz dikirin û dipesinandin ku kes û bûyer bi haweyekî rastî di tekstên edebî de werin veguhastin. Heta kes û bûyerên ku di edebiyata nivîskarên weke Balzac de dihat

hûnandin, di Kapîtalê de cihê xwe digirt. Ango daneyên di edebiyatê de ji Marks re dibûn bingeh ji bona ronîkirina modela kapîtalîstî. Hilbet wexta ku dane di edebiyatê de rast û balkêş bin, civatî û sosyalbûna, ekonomîst û filozofan jî dikaribû ji wan fêde bikirana...

Vêca wexta ku mijara romanekê dîrokî be divê ji pir aliyan de mirov gelekî bi hest tevger bike. Girêdayî rastiya dîrokî bimîne. Divê mirov dîroka vê dema ku ji romanê re bûye mijar baş nas bike û objektîf bûyeran di nava tekstan de raxîne. Di vî warî de mînakek helî baş ya romanê, ya nivîskarê swedî Arthur Lundqvistê, ku ew jî bi navê "Helbesta Şervan" hatiye çapkirin e. Roman li ser Eskenderê Zilqirneyn hatiye nivîsandin. Nivîskar dibêje ku hemû lêkolînan ku li ser vê mijarê hebûn min xwendine. Min ji aliyê helwest de bêalî tevger kiriye, dibêje. Avaniya romanê û herka bûyeran li gora rastiya dîrokî hatiye nivîsandin, lê belê hinek fantezî jî di romanê de heye. Ev fantezî rastiya romana xweştir û kûrtir dike. Ango bingeh û skelata romanê ji rastiya dîrokî hatiye wergirtin, lê belê xemilandina bûyeran li gora daxwaziya nivîskarê romanê hatiye raxistin. Di romanê de çewtiyên dîrokî tune ne...

Di vê tevgirêdanê de, heger nivîskar xwe weke tacîdarê dîrokê bibîne û dadgehekî li himberî bûyer û kesan lidarxîne, wê gavê divê nivîskar bi rastî bêalî û objektîf tevger bike. Lê belê Mîrza Me-

denî Ferho qet wilo tevger nake. Ji rastiya civat û dîroka herêma xwe dût dikeve. Xeyala ji xwe re ava dike. Li şûna rastiya dîrokî, pesinandina kesan û şelafiya bi hêzên siyastî re derdixîne pêş. Medenî Ferho bîryara xwe daye ku bi riya edebiyatê hinek axayên eşîra Hevêrkan rûsipî bike û hinekan jî rûreş bike... Min bi rastî baş tîm nekir gelo çima nivîskar dîroka heremê dixwaze li gora dilê xwe bi riya edebiyatê bîne zimên? Gelek riyên din hebûn... Di vê tevgerêdanê de, wî jî weke gelek nivîskaran karîbû pesinnameyek ji Mala Batê û Haco re binivîsanda. Wilo ew ê çêtir bûya. Wê gavê ew bi qîma xwe dima. Kesî wê gavê gazin zêde jê nedikirin...

Lê wexta formê pesindanê bibe weke şiklekî edebî, wê gavê rastî û realîteya civatê pêwîst e were nivîsandin. Ma ne divê nivîskar girêdayî pîvanên dirokî û civatî bimîne? Daneyên ku di edebiyatê de tîne ziman divê rast bin, divê li gora realîta civatê bin, divê li gora rastiya xwezayê bin, divê kesên ku di tekstên edebî de cihê xwe girtibin, bi kesên dîrokî û civakî re nekevin nakokiyên bingehîn. Ango Haco yê ku di romanê de heye, nikare ji Hacoyê ku di dîrokî de heye were qetandin û bêhempa were pesinandin. Haco çî be divê ew wilo

MARÊ DI TUR DE



were vegûhaztin. Yan na wê gavê li şûna edebiyateke zanyarî, rastî û mantiqî tenê edebiyateke propagandîst pêk tê. Ev rastî jî bo hemû bûyer û kesên dîrokî divê wilo were fahmkirin. Wexta ku di edebiyatê de propaganda kete şûna realîta civatî û dîrokî, nivîskar bi vê yekê dixwazin gelek caran ne

zîrekbuna xwe ya edebî bi vê riyê binixûmînin. Marks û Engels jî bo edebiyata propagandîst wilo digotin. Qelsiya edebî û nekirkêriya şexsî bi riya propaganda û pesindanê dihate veşartin.

Medenî Ferho azad e ku pesinnameyekê ji malbata axayên hevêrkiyan re binivîsîne, ew mafê wî ye. Min qet alaqadar nake. Lê pesinname û roman nikarin weke hevdu werin nixandin. Ji aliyekî de Mîrza Medenî Ferho bi riya edebiyatê nalet li civat û dîroka kurdan tîne, ji aliyekî de jî heta ku hêza wî heye, heta ku zimanê wî digere, pesnê Elîkê Batê û Mala Haco dide. Li devreke romanê (r.18) jî bo Elîkê Batê wilo tê gotin: "Elîkê Batê ku quloçên wî ji binya Sêrtê digîhane binya Mêrdînê". Di vir de nerastî û mibalexe heye... Hemû kes dizanin ku di civata eşîrî de her axa axayê eşîra xwe bû. Elîkê Batê jî wilo bû. Heta di rastiye de Elîk ne tacîdarê eşîra xwe jî bû. Elîkê Batê di nava axayên hevêrkiyan de mîrxas bû û dostê

dostên xwe bû. Ev rast e û tiştêkî bêşik e. Lê belê Elîkê Batê ne hûtê heft serî bû. Ma ne ji ber vê yekê wî û mirovê xwe bi hevdu re berberî dikirin? Ma ne berberiya mala Çelebî, Serhên, Haco û Batê li ser vê yekê bû? Ma gelo Elîkê Batê û Mala Haco ne ji vê civatê û dîrokê hatibûn? Ew jî ji nava gelê kurd derketibûn... Ev civat û dîroka ku di romanê de naletkiriye, di rastiya xwe de kesên weke Elîkê Batê û Haco jî derdixistin meydanê. Ma ne wilo ye? Lê belê Mirza Medenî Ferho di eynî pelên romanê de ku tê de pesnê Elîkê Batê û Haco dide, dikare hevokên wilo jî binivîsîne "kurmê xiyaretê bi mirovê kurd re heye", "Kurd xayînê nîşê xwe ye, r. 72." Medenî Ferho wexta ku baş germ dibe jî, bi kesên romanê dide gotin ku; "Kurd ji berbetanê ûrê (zikê) xwe kew xayîn kirine, dişibihînin kurdan, r. 72." Ango kurdan bi xayintiya xwe, kew jî kirine weke xwe lo! Ma gelo nivîskar Medenî Ferho bûye Charles Darwînê nûhatî? Mirov dibêje ma gelo wijdanê nivîskar bi kuderê de bazdaye? Heger bi rastî li cîhanê tenê kewên kurdan xayîn bûna, mirov dikaribû vê ramana bêmane bigirta ber çavan û li ser hinekî hûr bibûya. Lê belê kewên cîranan jî weke kewên kurdan e hevalo. Heger mantiqê Mirza Medenî Ferho rast be, wê gavê hemû teyrik û tilûr, dar û ber, heywan û teba, newal û çiyayên Kurdistanê jî, divabû weke kurdan xayîn bûna! Medenî Ferho pîrsa xayîntiyê ji pîrsa çîneyetî

û psîkolojiya kesayetiye gelekî dûr dixîne û dike weke pîrseke etnîkî. Xayîntiyê dike weke sixletêkî kurdan ya etnîkî. Ma ev ne neheqî ye? Xayîntiyê weke rewşeke sosyal û siyasî nanîrxîne nivîskar. Bi zanyarî naxwaze nêzîkî gotina xayîntiyê bibe. Nivîskar di romana xwe de bûye weke psîkologekî amator û ket û ber li ser sixletên kurdan tiştên ji rastiye dûr dinivîsîne. Dû re xayîntî li gora Medenî Ferho çiyê û ne çiyê? Ev yek jî bi rastî ne baş diyar e. Heger xayîntî hevalbendiya an jî nêzîkbûna dewleta dagirkeran be, wê gavê xayîntî dibe helwestek siyasî û ne sixleteke etnîkî. Ango mirov dikare bibêje; "Kurdên xayîn" lê belê mirov nikare bibêje "Kurd xayîn" in.

Li aliyekî Medenî Ferho dest diavêje mijareke dîrokî û dîroka heremê li gora dilê xwe bi rêz dike, li aliyê din jî mesajên siyasî dixwaze bide hinek deveran. Him dixwaze qala civat û eşîrên kurdan bike, li aliyê din jî naxwaze ku ji ber vê yekê hinek deverên siyasî ji xwe aciz jî bike. Li gora dilê wan lêdixîne û dinivîsîne. Bi berçavk û gotinên wan dîrok û civata xwe dinîrxîne, lê li aliyê din jî jibîr nake ku pesnê axayên Hevêrkiyan bide. De îcar were ji nav meselê derkeve! Ji aliyekî de Medenî Ferho dixwaze zimanekî epîk ava bike, ji aliyê din de jî bûyera Cimo, Haco û Elîkê Batê bi hevdu re pîne dike. Nivîskar di nava bûyer û helwestên cihê cihê de diçe û tê... Bê biryar e. Armanca wî, ji gelek

aliyan de ne zelal e. Kî bixwaze dikare li gora daxwazî û dilbijandinên xwe perçakî ji vê romanê ji xwe re bibe. Xwe pê şa bike û nivîskarê romanê bi vê yeke jî xelatar bike. Mirov dibêje qey nivîskar wilo dixwaze. Lê bi rastî û bi kurtî mirov dikare bibêje ku mesaja vê romanê baş ne diyar e. Roman dixwaze çi ji xwendevanên xwe re bibêje? Ev yek baş ne xuyaye. Ango kodika vala li ya tijî dikeve, lê belê ji vê yekê jî tişteki xuya-yî, bi ber û zelal dernakeve pêş.

Li aliyê din li ser dîroka herêmê û eşîran hinek daneyên şaş di romanê de têne raxistin. Weke mînak: wexta qala mîrxasiya Elîkê Batê tê kirin hinek agahdariyên şaş tên bikaranîn. Em niha li wan şaşiyên binêrin; "Sal 1919... Piştî şerê paytexta Omeriyan, Çalê, şerê Tînatê, ku Elîk ber bi çiyayê Tora Hevêriyan vekîşiya, r.19" Berî hemû tiştî ez dikarim bi hêsanî bibêjim ku di vî heymê de şer li ser Çalê çênebûye. Şer tenê li Tînatê hatiye lidarxistin. Çaliyan jî di nava şerê Tînatê de cihê xwe girtibûn. Bi raybetî jî ev şer ne şerê Elîkê Batê bû. Heger Medenî Ferho li hejmarên rojname Welat yê kevin baş meyze bike, ewê bibîne ku layê Elîkê Batê Usif, di hevpeyîneke xwe de dibêje; "Bavê min çû hewara Omeriyan" Min berê jî li ser vê yeke nivîsandibû; Şerê Tînatê di nava beşekî Omeriyan û leşkerê dewleta Osmaniyan de derbas dibû. Elîkê Batê û Mala Osman ku axayên eşîra Omeriyan bûn, bi hevdû re bend çêkiribûn. Ji

Mala Osmanê Omerî di vî şerî de Ûsivê Osman hebû, Evdîlkerîmê Osman hebû, Brahîmê Osman hebû, Izedînê Osman hîna naşî bû, Hesenê Osmanê biçûk hebû... Li aliyê din bi sedan bavi-kên Omeriyan di vî şerî de cihê xwe girtibûn. Mala Osmanê Omerî û Mala Batê li herêma Mêrdînê benda wan yek bû. Kî ji wan diket zehmetiyan, ên din diçûn hewara wan. Rêzana eşîrî wilo hatibû ava kirin. Encamê vî şerî weke ku min got, ne tevgera Elîkê Batê bi xwe bû. Divê mirov vê rastiye baş dubare bike. Ez baş dizanim ku Brahîmê Osman komek leşkerên Osmaniyan li ba gundê Sada kuştibûn... Encama şerê Tînatê ev bûyer bû. Wexta ku şer di navbêna Mala Osman û leşkerên Osmaniyan de germ bû, Elîk bi xwe li Tîrbesipiyê li ba Mala Haco bû. Brahîmê Osman di nava birayên xwe de birayê helî biçûk bû û ji ber vê yekê jî çû hewar bir ji Elîkê Batê re. Elîkê Batê jî di hewara Mala Osmanê Omerî de hat... Tewfoye lawê Brahîmê Osman ev bûyer ji min re bi dûr û dirêjî got... Bavê wî jî, ji wî re qal kiribû. Li gora çavkaniyên min, li derdora sed peyayî bi Elîkê Batê re hebûn. Şemûnê Hennê Heydo jî bi Elîk re bû. (Nivîskar qala vî ciwamêrî nake) Kesên ku beşdarî vî şerî bûbûn ji min re gotin; "me panzdeh roja şer bi leşkerê dewletê û hevalbendên wan î herêmi re kir û paş re jî me bi hevdû re biryar da ku em ji ber leşkerên dewletê rabin." Ango rastî ne weke ku

Medenî Ferho dinivîsîne.

Şaşiya didûyan di romanê de ev e; di şerê Tinatê de hevalbendên dewletê Izedînê Temo Gewrê bi xwe bû û hinek jî ji Omeriyên ku pismamên Mala Osman bûn. Eşîrên ku hevalbendên dewletê bûn û eşîrên ku li dijî dewletê bûn, heta hera malbat û bendên eşîrî jî rêzana xwe li gora vê yekê danîbûn. Bi kurtî mirov dikare bibêje ku Izedînê Temo Gewrê hevalbendê dewletê bû. Li Tinatê jî wî wilo tevger dikir. Medenî Ferho dibêje ku piştî serhildana dawî ya Elîkê Batê ku ev ji şerê Tinatê bû, weke ku min berê jî gotibû, "bi desteka Omeriyan, Izedînê Temo Gewrê (ku axayê eşîra Hebizbiniyan e û ji Malbata Ehmed Axa ye Ş.C), serkêşê eşîra koçeka Mala Hemo û hinek Dekşûriyan, Elîkê şikest, kete çiyayê dora Saliha, r. 19" Yan di vir de tiştekî şaş bi hevdû ve hatiye girêdan an jî agahdariyên ku di vir de hene hemû jî şaş in. Medenî Ferho çavkaniyên xwe ji kuderê girtine? Berî hemû tiştî Dekşûrî neketine şerê Tinatê, Izedîne Temo Gewrê ne hevalê Elîkê Batê bû, lê belê hevalê dewletê bû, ji xwe heçî Mala Hemo bûn ne di hesaban jî de bûn. Dû re Mala Hemo ne serkêşê eşîra koçekan e. Mala Hemo li herêma Mêrdînê tenê malbatek in, herdem hevalê dewletê bûn, lê Mala Hemo bi vateya sosyal û sosyolojîk tu cara nebûne eşîr. Eşîra Mala Hemo tune bû. Medenî Ferho bi zanistî hinek tiştan şaş dinivîsîne; Elîkê Batê ne bi desteka (alî-

kariya) Omeriyan şer dikir, weke ku Medenî Ferho di romana xwe de nivîsandîye, lê belê Elîkê Batê bi xwe destek (alîkarî) dida Omeriyên ku li Tinatê di nava şer de bûn. Elîk hatibû hewara Omeriyan. Bi kurtasî; mast ji dew çêdibû hevalo, lê belê dew ji mast çêdibû... Rastî wilo bû. Ango divê mirov rastiyê binivîsîne. Lê wilo xuya dike ku Mîrza Medenî Ferho dixwaze erebê bide pêşiya hespê... Dîsa wilo xuya dike ku Medenî Ferho dixwaze sola mêrxasîsan berepaş têxe lingên wana. Ji ked, berxwedan û mêrxasiya mirovên Omerî dixwaze ji axayên xwe re hinek parê derxîne. Ma ev ne neheqîye lo? Nivîskar Medenî Ferho bi riya edebiyatê bûyerên dîrokî ku xwediyên gelek çavkaniyên herêmî ne, serobino dike, ango dîroka herêmê nerast dinivîsîne. Ji bo ku pesnê Elîkê Batê bi neheqî bide bûyerên li herema Mêrdînê şaş vedigûhêze nava pelên romana xwe. Ez dikarim bi hêsanî bibêjim ku hewcedariya Elîkê Batê bi van dîtinên Medenî Ferho qet tune. Kirinên Elîkê Batê têra wî dîkin. Navê Elîkê Batê têra wî dike. Lê wilo xuya dike ku Medenî Ferho hinekî hewcedarê navê Elîkê Batê û Haco ye. Ji ber wilo jî bêhempa pesnê wan dide. Ji ber wilo jî xwe li ber baranê vala şil dike...

Şaşiya sisiyan jî ji yê berî xwe gelekî xerabtir e. Nivîskar wilo dibêje "Dused sal!.. Du sed sal in ku Malbata Osman û dewleta tirk li hevdû dixin. Êdî ez,

mirovêkî biyanî bûm, ez bi xwe nema-
 bûm ji Malbata Osman, ez kurê dewle-
 tê bûm. Malbata Osman pîkol dikir û
 coxrafya xwe, heta tu bêje bes fereh ki-
 ribûn. Her roja diçû bêhtirin sehwa
 wan çêdibû. Osmaniyan ji Malbata Os-
 man dipelikandin, ev heft-heşt bav bûn
 ku hemberî Osmaniyan şer dikirin.
 Nîş li pey nîşê din hemberî Osmani-
 yan û hemberî Komara Tirkiyê şerê
 xwe domandin. Yek dihate kuştin yê
 din dest pê dikir. Ew dihate kuştin yê
 din...Heya îro wilo didome.r.23.” He-
 ger xwendevanên romanê wan rêzên
 hanê careke din bi aramî bixwînin, ewê
 li vir baş xuya bike ku, Malbata Osman
 ku axayê eşîra Hevêrkan bûn, bi hawe-
 yekî hişmendî, bi bahwerî, tevî kal, jin
 û zarokên xwe, ew dused salên ku di
 nava şerekî siyasî û weletperwerî de ne!
 Nivîskar baş dizane ku ev tiştên ku di-
 bêje ne rast in, bingeh ji wan re tune, ev
 pesindanên bêhempa, tije şelaftî û miba-
 lexe ne. Gelek kesan ji Malbata Osma-
 nê hevêrkî qet li ber xwe nedane, hine-
 kan hevaltî bi dewletê re kirine, tenê hi-
 nekên ji wana ku bixîret bûn, li ber xwe
 dane... Dû re Malbata Osman kengî
 serhildanê netewî û siyasî li dar xistine?
 Gelo nivîskar dikare li vir hinek mîna-
 kan bide? Na mînak di vî warî de tune-
 ne. Dû re nivîskar dîsa dibêje; ”Malbata
 Osman pîkol dikir û coxrafya xwe, heta
 tu bêje bes fereh kiribûn”. Bi rastî mi-
 rov dixwaze zanibe ka Malbata Osman
 ji nava eşîra Hervêrkan û pêde coxrafya

xwe li kuderê fireh kiribûn? Heta di na-
 va eşîra xwe de jî, desthilatdarî bi tima-
 mî ne di destên wan de bû. Ma ne bi
 hevdû re berberî dikirin? Ji bo mînak;
 wan kîjan herêm û eşîrên derdorê kiri-
 bûn bin destê xwe? Navê wan herêm û
 eşîran çi bû gelo? Lê dîsa mînak tune
 ne.

Li aliyê din dewleta Osmanî tucara ji
 Malbateke tenê nadipelikandin. Dewle-
 ta Osmanî ji gelê kurd dipelikand, ji
 mîrekên kurdan dipelikandin, ne ji
 malbatekê an jî ji eşîreke biçûk. Dû re
 Malbata Osman ku tenê hinek ji axa-
 yên Hevêrka bûn, li himberî dewletê
 tucara nebûbûn kospeke wilo mezin
 weke ku nivîskar dixwaze bîne zimên.
 Yên ku herêma Mêrdînê baş nas nekin,
 wê bibêjin qey Malbata Osman mîre-
 kên herêmê bûn. Mala Osmanê Hevêr-
 kî ne Malabata Bedirxaniyan an jî Mal-
 bata Barzaniyan bûn. Hemû kes diza-
 nin ku mîrekên welêt Mala Bedirxani-
 yan bûn. Rêzanên eşîrî jî li herêma me,
 li gora vê rastiye hatibû damezrandin...

Gelek tiştên din ku ji rastiya dîroka
 me dûr in, di vê romanê de hatine nivî-
 sandin. Ez naxwazim li vir yek bi yek li
 ser şaşiyên nivîskar bisekinim; lê yek ji
 wan heye ku min gelekî ne rehet dike,
 ew jî ev e; Malbata Osman ev dused sal
 in û heta îro jî li ber xwe didin nivîskar
 dibêje. Li vir ez naxwazim navan bidim,
 malê kê çî ye baş xuya dike, lê li herêma
 Mêrdînê mirovên welatperwer dizanin
 ku ev yeka hanê ne rast e. Ji Malbata

Osmanê Hevêrkî korucu (pîber) derketine, nivîskar dikarîbû ew pirsê hanê ji Mizîzexiyên pîrs kiriba! Di nava wan de hevalbendên dewleta tirk derketine, kesên ku di nava partiyên dagirkeran de cihê xwe girtine derketine. Kesên ku nedihîştin û hîna jî nahêlin welatperwerên kurd bikevin nava Tora Hevêrkan derketine, ewên ku hîna jî nahêlin li Midyadê HADEP were damezrandin hene, angê hene û hene birako... Lê li aliyên din jî kesên bixîret û binamûs jî hene. Ev jî gelekî eşkere ye... Lê bi rastî hîna jî min motifên nivîskar di vê mijarê de baş fêhm nekirine. Nivîskar bi dûv çî de ye? Armanca nivîskar bi wan dîtînanan çî ye? Ez hîna jî nizanîm...

Em ê niha di vê mijarê de dîtînan xwe komî ser hevdu bikin: Edebiyat tu-caran nabe bibe tevgerîdaneke ku nivîskar tê de cirîdan biavêjin û rastiya civatê û dîrokê xwe serobîno bikin. Divê nivîskarên me bi formên edebiyatê ku cihê cihê ne, karibin dîrok û rastiya welatê xwe, li ser hîmê wê yê rast, bi zîmanekî edebî, bi bûyerên balkêş, bi tîpên realist vegûhêzin nava avaniya edebiyata welêt. Wexta dîroka welat, herêm, çîn, eşîr, gel bi riya edebiyatê ji rastî û zanyariya xwe dûr bikevin, wê gavê mal-kambaxiyêke pir mezin wê derkeve pêşîya gelê kurd. Kalîta edebiyata me, wê gavê ew ê bikeve, ew ê edebiyata me bala xwendevanên kurd nekişîne û edebiyat di kultura me de bi vî haweyî nabe xwediyê cîhekî birûmet. Ji ber wilo jî

heqê nivîskarekî qet tune ye ku miramên xwe yê şexsî bi riya edebiyatê bixwaze belav bike. Edebiyat berfê hemû tiştî malê hemû civatê ye. Ji ber ku edebiyat saziyêke civatî û zanyarî ye. Em ji dîrokan û sosyologên xwe çî bixwazin, kêma an zêde em divê eynî tiştan ji edebiyatvanên xwe jî bixwazin. Ji ber ku edebiyat karekî pir girîng e û heja ye ku em li ser gotûbêjan bikin. Ji ber ku edebiyat divê bahweriyêke bi rêk û pêk bide xwendevanên xwe. Ji ber ku edebiyat divê xwe ji berberiya rojane hinekî dûr bixîne û bibe malê hemû kesan. Xwe bi civata xwe bide pejirandan. Hemû kesên ku sixletê miroviyê pêre hebin, bikaribin parçeyekî ji xwe û civata xwe di vê edebiyatê de bibînin. Angê ev edebiyat pêşî bi riya zîmanê xwe bixwaze bibe netewî û dû re jî bixwaze bibe navneteweyî. Xwendevan bikaribe bi hêsanî mirovên rast, mirovên bi ruh û bi goşt bi riya vê edebiyatê nas bikin. Mirovên ku pîrhêl bin, bi hemû bilindayî û nizmiya xwe karibin di vê edebiyata han de werin raxistin, werin analîzkirin, karakterên mirovên cihê cihê û psikolojiya kesayatiyê divê bi haweyekî ku bahweriya xwendevanan pê were, bê hûnandin. Edebiyat û rastiya mirovan divê li hevdu bikin. Angê rastiya civatê, dîrokê û rastiya mirovan bi haweyekî realistî karibe bikeve nava avaniya teks-tên edebî û bi hêsanî bibe parçeyek ji kultura civatê. □

"HELBESTEKE MELAYÊ CIZÎRÎ"

ya ku ne şîira Melayê Cizîrî ye

ROJEN BARNAS

Di hejmara 37 a Nûdemê de bi sernivîsa jorîn nivîsarek Zeynelabidîn Zinar weşiya. Seydayê hêja û nivîskarê dilsoz ê kurdperwer şîirekê ku wek a Melayê Cizîrî be bi me dide nasîn, pê dixwaze sihêtiya me xwendevanan bike ka gelo em şîira Cizîrî û ya camêreki dinê ji hevûdu dinasin an ne?

Ji ber talûkeya ku hin kes ewê siberoj bi vê yarîkirîna seyda dernexin û bera jî ewê vê şîirê wek ya Melayê Cizîrî binasin, min hewce dît ku bi vê nivîsê wan lê hişyar kim bê ka çima ew "helbest" ne şîira Melayê Cizîrî ye:

1. Naznavên (leqeb/îmza) ku Melayê Cizîrî di şîirên xwe de bi kar tîne di destpêkê de Nişanî û di pey de jî Mela ye. Di tu şîira xwe de Melayê Cizîrî mexles an naznavên mîna Şêxê Cizîrî, Cizîrî an weki dinê bi kar neaniye. Di edebiyata klasîk de bikaranîna naznavê xwe wek mor û îmza ye û bikaranîna wî çibigire ne wacib e, lê ferzuleyn e.

2. Zimanê vê "helbestê" û yê şîira Melayê Cizîrî ji hevûdu bi temamî cihê ne. Zimanê vê şîirê yê piştî 1900î bi hezrek mezin jî piştî 1960î ye. Dîroknîs, ehnî, fener, brûwê ne bêjeyên ji ferheng an qamûsa Melayê Cizîrî ne.

3. Melayê Cizîrî bi "serê Meryem û Îsa" sond nexwariye û naxwe jî. Ji bona şaireki klasîk ê di meritebe û felsefa wî de de Îsa sembolê bi saxî çûyîna esman, Mesîh sembolê miriyan vejandinê ye, mezherê nefesa Xwedê ye. Meryem nimaya bedewî û paqîjiya xwedayî ye. Mela bi wan re hevrêti dîke. Mela ku bike sond dixwe, sond naxwîne.

4. Melayê Cizîrî nabêje "Dil aşiqê te ye ez subhî ezel da". Ez subhî ezel beyaneke bi farisî ye û di paşiyê de paşdaçeka de an daya kurmançî nayê. Herwekî vê dîsa Mela nabêje "Şahaperî". An dibêje "Şaha! perî" (Ey Şah tu/çû/hîç perî) an jî "Şah û perî". Şairê ku ev helbest nivîsandîye bi farisî baş nizanîbiye.

5. Yûsif di edebiyata klasîk de bi bêjeyên wek Yaqûb, Kenan, Zuleyxa, Misir re tê bikaranîn. Bêjeya "Selwa" hem bi navê Yûsif re ji xwe qet nayê û hem jî wek navê kesekê di edebiyata klasîk de derbas nabe. Selwî (the cypress-tree) ku bi farisî û tirkî wek "serv/servî" tê gotin, darek e ku li goristanan, li park û baxçeyan ji bona xemlê tê danînê. Wek spîndarê bilind û narîn e, mîna kajê (çam) pelderziyê pehn e, renga wê keskê tarî ye. Li goristana Ruhayê li hin park û baxçeyên Diyarbekirê û bêguman li gelek deverên dinê jî hene. Di edebiyata klasîk de nimaya (mez-mûn/sembola) bejna yarê a lihevhatî ye: Zirav, dirêj, narîn; ne ji navê berjêr kurt û jor bilind, ne ji navê berjêr bilind û jor kurt. Hevedudaniyên wê yên mîna bi rengdêrên azad, bilind, xiram, sehî, rewan, naz, siyah, simînber, kohî, cengelî, çemen re tên. Gotina "selwa" bi serê xwe di edebiyata klasîk de tune û bi munasebeta Yûsif jî an Yûsif bi munasebeta wê nayê bikaranîn. Mela jî ev nekiriye.

6. Di edebiyata klasîk de şerbeta lêvan, lêvên şekerbarîn an lêvên şekerrêj hene. Ji vana jî mebest zarşîrînî ye yanî sohbet û axaftina şîrîn ên li gora dilê evîndar ango şair e. "Şeraba piduwê te" yanî gilêza dev e ku di vê helbestê de heye ji zewq û zerafeta şîra Melayê Cizîrî bi sedsalan dûr e.

7. Min dîwanên Mela yên bi navên "çapa Îstenbolê", "çapa Misrê", "çapa Petersbûrgê" bihîstine lê bi navê "çapa Cizîrê" ne bihîstiye. Ev "çapa Cizîrê" li ku peyda dibe û li kîjan çapxana Cizîrê çap biye? Û ev helbestku ya Mela bûya çima di wan nusxeyan de tune?


8. Di edebiyatên mîletên dinê de jî hin kes rabûne tişt nivîsîne û ji bona polikên xwe bi derûdora xwe mîna zêr bidin hezkirin û ecibandin navê ustadekî navdar lêkirine.

Melayê Cizîrî zêringer e, her zêr û zêrê 24 eyar biriye. Ev şîr jî bi çavdîrî wek zêr zer e û difûre nav dilê meriv, lêbelê ne zêr e, birinc e.

Ev ne ya Mela ya.

Nota Nûdemê: Rojen Barnas "şîr" nivîsandibû lê me guhert û bi awayê "şîr" weşand. Bi hêviya ku wê maqûl bête dîtin.

Em di 25saliya wefata rewşenbîrê kurd Edîp Karahan de wî bi hurmet bi bîr tînin:



Wehîd Aba, Evdîrehman Acar, Selîm Acar, Kemal Adar, Nezîr Akad, Nîhat Akar, Necmedîn Akin, Silêman Akkoyûn, Emer Aksu, Ata Ala, Eyup Alacabek, Rohat Alakom, Adil Alish, Ezîz Alish, İsmail Alish, Kutbedîn Alish, Silêman Alish, Henefî Amaç, Faruk Aras, Naîle Aras, Husametîrîn Aslan, Rûşen Aslan, Huseyîn Avcî, Sidîq Avcî, Bahadîn Ayaz,

Bayram Ayaz, Hadî Aydın, İsmâil Aydın, Mumtaz Aydın, Osman Aydın, Mustafa Aydoğan, Seid Aydoğmuş, Osman Aytar, Necatî Baba, Kurdo Baksî, Lutfi Baksî, Şukran Baksî, Yılmaz Balkaç, Seyfedîn Balta, Emîn Baltaş, Cewdet Baran, Seyit Baran, Rojen Barnas, Ramazan Baştaş, Cemal Batûn, Zekî Bayrak, İrfan Baysal, Ehmed Begik, İsmâil Beşikçi, Dara Bilek, Ehmed Boga, Mehmet Bozan, Sidiq Bozarslan, Şermîn Bozarslan, Selchedîn Bûlût, Elî Bûran, Sebîha Bûran, Kemal Burkay, Helim Can, Firat Cewerî, Mûrad Ciwan, Weysî Çalişir, Firat Çayircioğlu, Zekerîya Çelik, Emer Çetîn, Elî Çiftçi, Mihdi Çilgin, Nafi Çilgin, Nesih Çilgin, Osman Çinar, Nedim Dagdeviren, Evdilqadir Damar, Remoyê Darî, Evdilhekîm Daş, Hesên Daş, Mihemed Dehsiwar, İkrâm Delen, Salih Demîr, Silêman Demîr, Sofî Demîr, Cemil Demircan, Reşadê Dêrikî, Mehmet Dilan, Felat Dilgeş, Şêxmûs Dîp, Mustafa Dora, Xelil Duhokî, Abid Dundar, Seyran Dûran, Şukrî Dûrsûn, Mehmet Ece, Serdar Ekingen, Ehmed Ekmekeç, Feyaz Ekmen, Nihat Elî, M. Elî Kût, M. Elî Yıldırım, M. Emîn Eren, Cemil Eren, Ehmed Eren, Kasim Ergun, Elî Ertaş, Hesên Ertaş, Celal Esen, Elî Esen, Bawer Eser, Bûbê Eser, Mele Evdirehman, Ehmed Ferîd, Huseyin Geçit, Bûrhan Geçit, N. Geleri, Şêxmûs Gelerî, Nûrî Gokalp, İbrahîm Guçlu, Yekût Gulbaran, Emîne Gulerce, Remezan Gulerce, Necdet Gundem, Evdirehmanê Gundikî, Ayhan Gungor, Abid Gurses, Kerim Gurturk, Vedat Guzel, Heqî İrmak, Seyidxan İmrak, Keya İzol, Ridwan Kaçmaz, Atila Kalkan, Mustafa Kalpak, Mezher Kaplan, Suphî Karaalt, Koroglu Karaaslan, Yaqub Karademîr, Enwer Karahan, Hecî Kardoxî, Ferhad Kaya, Remzî Kerim, Eren Keskin, Mustafa Kiliç, Hemid Kiliçaslan, Seydo Kîno, Mahmûd Kiper, Sîraceddin Kirici, Muhsin Kizilkaya, Metin Kumruaslan, Erdal Kurt, Mahmûd Lewendî, Malmîsanij, Mamoste, Xetîp Mercan, Hesênê Metê, Mahmûd Metîn, Mahmut Metiner, Selim Mûrad, Emîn Narozî, Firat Nemrûd, Kendal Nezan, Xalis Nezan, Serbest Nisêbînî, M. Nûr.Aşan, Fexrî Olçer, Şeffiq Oncu, Remezan Oruç, Mamoste Osman, Ozçelik, Ednan Ozbîngol, Fadil Ozçelik, Cemal Ozçelik, Mustafa Ozçelik, Osman Ozçelik, Haluk Ozturk, Firat Ozyildiz, Çeko Pekgul, Loqman Polat, Laleş Qaso, Remezan Qehremaner, Hemdilah Qotreş, Hemreş Reşo, Elî Riza Vural, Serdar Roşan, Lezgîn Salih, Mihemed Sanri, Nûredîn Saraç, Mûrad Satıcı, Cemal Saygılı, Hisên Serhad, Turan Seyfioglu, Bahadîn Seyidvan, Nûrî Solmaz, Zekî Sonmez, Zinar Soran, Gani Sungur, Enwer Suretli, Feysel Şaliş, Nezir Şemikanli, İzedîn Şevgin, Kemal Şimexî, Mele Tahir.Ergun, Necatî Tank, Mehmet Tanrikulu, Vildan Tanrikulu, Mehmet Tanriverdi, İmam Taşçier, Ehmed Toprak, Ekrem Toprak, Lamîa Torunlu, Recep Tugrul, Mîthat Tuncay, Evdilah Tuncel, Şêxmûs Turşak, Şakir Tûtal, Fexredîn Tutuncu, Evdilselam Ugurlu, Evdirehman Ugurlu, Mehmet Uzun, Paşa Uzun, Mehmet Vural, Zinarê Xamo, Elî Yalim, Xetîp Yapiştiran, Behlul Yavuz, Mehmet Yıldırım, Hecî Yigit, Adil Yıldırım, Beşir Yılmaz, Rifat Yuksekkaya, Baran Yuksel, Mehdi Zana, Ehmed Zekî Okçuoglu, Arif Zêrevan, Reşo Zilan, Zeynelabidîn Zinar, Ehmed Zîrek.

